

WEZÎRÊ EŞO

SİMOYÊ ŞEMO
JÎYAN Û KAR

WEZÎRÊ EŞO

SİMOYÊ ŞEMO

JÎYAN Û KAR

Bo 85 Salîya
Simoyê. Şemo

WEŞANXANA
YEKTIYA NIVISKARÊN ERMENISTANE

YEREVAN 2013

ՀՏԴ 891.5-94 Աշո
ԳՄԴ 84 Քրդ - 4
Ա 656

Հրատարակվել է պետական պատվերով

ԱՇՈ ՎԱԶԻՐԵ
Ա 656 Սմոյե Շամո. կյանքը և գործունեությունը/ Վազիրե Աշո. - Եր.: ՀԳՄ հրատ., 2013. - 152 էջ:

Nivîskar û wêjezan Wezîrê Eşo vê pirtûka xweda jînenîgarî, kar û barê hogirê xwe – şayîrê kurd Simoyê Şemo yê berhemdarîyê radixe ber çevan, analîzkirina berhemên wî bi cî tîne.

Beşa pirtûkê ya duyemînda novêl, serhatîyên bûyerî (dokûmêntar) hatine bi cîkirinê, yên ku nivîskar ser bûyerên dora xwe û Simoyê gorbuhuşt çêbûyî, ser pêwendî û girêdanên xwe û wî sêwirandine.

ISBN 978-9939-58-178-1

© ՀԳՄհրատ., 2013
© Աշո Վ., 2013

PEŞPEYÎV

Heval û hogirên min gelek hebûne, yên ji zarotîyê û xortanîyê destpêkirî hetanî temenê, weke dibêjin, navîn û kalbûnê: yên ermenî, di nava kîjanada ez mame, min bi wanra xwendîye, hatime perwerdekirinê, lê bi giranî yên ji miletê min-kurd. Lê di nava wan hemûyanda yên here nêzîk, em dikarin bêjin, yên here helal, ku min û wan dilê xwe bi temamî li ber hev vekirine, şuriya me li hev haqasî buhurîye, me haqasî îtbar bi hev anîye, ku tu tiştekî surî di navbera meda nemaye, me bi temamî pişta xwe li hev girê daye, dudu bûne. Yek ji wana hogirê min yê zarotîyê Stalîkê Ûzo Cafarov bû, ku bû firokevanê teyarê, firokên herbê (leşkerîyê) yê yekemîn nava kurdên Sovyêtstanêda: welatevînekî bi şewat, lê sed mixabin, destê min û wî ji destpêka salên 70-î ji hevdu bû: hetanî-hetayê ji ber şehîdbûna wî ya ji nişkêva û tesedûfî û ji zeman zûtir.

Hogirê min yê duyemîn, yê weke min got, herî nêzîk, doxtir û şayîrê kurd yê bi nav û deng Simoyê Şemo bû. Her çiqasî jî hogirtîya min û wî angor derengtir çê bû, gava temenê me ji yê xortanîyê jî derbaztir bibû, lê min tirê min ew ji dema zarotîyê nas kirîye. Ez û Simo bawer bikî eynî zemanîda, eynî bajarî-paytextê Ermenîstanê-Yêrêvanêda zanîngehên xwendina bilindda salên 50-î fêr bûne: ez li zanîngeha Yêrêvanê ya dewletêda wek xwendkarê beşa wê ya dîrokê, lê Simo- înstîtûta eynî bajarî ya doxtiryêda. Her çiqasî jî ew zanîngeh haqasî nêzîkî hev bûn, ku hewşa wan yek bû, lê hogirtîya min û wî ya nêzîk derengtir çê bû, gava di dawîya salên 50-îda em herdu jî eynî navça Ermenîstanêda ya Axbaranê û gundên kurdan yên cînarda ketin ser kar: ew bû serok-berpirsîyarê nexweşxana gundê Elegezê (berê-Camûşvana mezin), ku weke beşeke navça Axbaranê, ya bi navê Elegezêye navendî dihate dîtinê, ku hema-hema nîvê gundên navçê di vê beşêda bûn, lê ez-serokê dibistana gundê Pampa kurda bûm (niha Sîpan, ku tevî Elegezê niha dikeve nava sînorê herêma Aragasotnê).

Hogirtîya min û Simo ya nêzîk li vira bi giranî ji ber wê yekê çê

bû, çimkî hetanî warekî, sînorekî destê me herduyan jî ji ber dûrketina ji Yêrêvanê ji navend, rêxistin y dezgehên çanda kurdî yên li wir, ji hogirên xwendkar û ronakbîrên kurd, dîsa yên li wir bibû, hatibû qutkirinê, ber wê yekê jî her yekî ji me li wir hetanî warekî xwe bi tenê dît û ji bona guhêrandina vê rewşêye berbi başîyê, ji bona tenênemayînê, me xwe nêzîkî hev kir: weke du mirovên xerîbîyêda her çiqasî jî ez hatibûm warê zarotîya xwe, lê Simo jî-navçeke kurdî ya ji mirovên ji xûn û qinêta xwe. A li vê tangê gotine: „Bizinek ji boy bizina baştire, ne ku kerî pez„. Belê, bilî vê yekê ez hatibûm navça xwe, gundê xwe, li kîderê zarotîya min buhurî bû, hatibûm xanîyê mala bavê xwe, lê Simoyê Şemo ji navça Hoktêmbêryanê, ku dûrî ya me bû, dikaribû xwe li vir hetanî warekî xerîb bidîta. Ji ber vê yekê jî weke mirovê ji navça Axbaranê min ji bona xwe weke berpirsîyarî hesiband li Simoyê li vir „xerîb„ xwedî derkevim, her çiqasî jî min zûtirekê tecrûbe kir, ku Simo weke mirovê civakî, civakhiz û gelêrî jî hewcê min nine, haqasî jî xwe bi tenê nabîne, haqasî jî, wek dibêjin, xerîbîya nake,çiqasî jî ez tecrûbe bikim û gelek hogir û nas peyda kirine di nava rewşenbîrên navçêda, ku bi piranîya xwe mamosta û karmendên dewletê bûn. Lê dîsa jî min berpirsîyarîya xwe bi cî danî û ji bona dîtina wî ez çend roja carekê diçûm Elegezê, li nexweşxana wî û me bi hevra zemanekî xweş derbaz dikir: bi kêfkirin û laqirdîyan. Simo jî carna, gava xwe bi tenê didît, bêhna wî teng dibû û ji ber kovana dîtina min ji Elegezê hêl dibû dihate mala me (Pampa kurda). Lê weke min piştra zelaltir tecrûbe kir, sebebê bingehîn yê bi hevra nêzîkbûna min û wî û di nava zemanekî kinda çêbûna hogirtîke nêzîk ew bû, ku xeysetê min û wî hev digirtin, nêzîkî hev bûn, dîtinên min û wî ser civakê, mirovan û bi giştî cîhanê hema weke hev bûn. Û eva yeka bû hîmê berdewambûna hogirtîya me ya nêzîk nava zemanekî dirêjda û her bi tenê ji ber mecbûryetê, dijî daxweza min û wî, destê me piştra ji hev bû.

Li vê tangê ez dixwezim derheqa rastîyekê, îzbatîke mûhîmda bêjim. Berîya min hogirê Simo yê herî nêzîk doxtir û nivîskarê kurd

yê bi nav û deng, doktorê zanînên doxtirîyê, pirofêsor Sihîdê Îbo bû. Ew herdu hema ji eynî navçê bûn ya deşta Araratê (Yêrêvanê) û hogirtîya wan ji zarotîyêda, li zozanên çîyayê Elegezê çê bûbû, gava malbetên herduyan mehên baharê û havînê hetanî payîza derengî konên xwe li wir vedigirtin. Vê hogirtîya wan ya nêzîk, ya ji zarotîyê, nava temamîya jîyana wanda berdewam kir. Û çêbûna hogirtîya min û Simo ya nêzîk qet zerre-misqalekê jî ya wî û Sehîd nivîşkan, kêm nekir, nemaze şûna hogirtîya wan negirt. Hela bi serda jî hogirtîya min û Simo ya nêzîk bû sebebê çêbûna hogirtîke xweş navbera min û Sihîdda jî. Piştî Elegezê, gava ez jî û hinekî derengtir Simo jî bi malbetên xweva li Yêrêvanê bi cî bûn, li kîderê Sihîd jî dima, min û Simo gelek cara hev digirt û em bi tevayî diçûn nexweşxana Sihîd, dîtina wî. Ew bi dîtina me û bi hogirtîya me pir kêfxweş dibû û me hersêka zemanekî xweş bi hevra derbaz dikir. Ez bal wan dibûm şede û agahdarê bîranînên wan yên zarotîyê û xortanîyê û nemaze henek û laqirdîyên wan. Li min xweş dihat, gava wana tinazên xwe, xweşîyên xwe li hev dikirin, diketin kirê hev: bi mantalîte, naverok û awayê xwerû kurdîtîyê. Ne axir herdu jî bi temanê xwe ji min mezintir bûn û henek û laqirdîyên mirovên ji min mezintir bêtir li min xweş dihatin.

Simo sala 1928-a hatîye dinyayê, lê Sihîd- sala 1924-a.

Jîyan çiqasî xweşe, haqasî jî dijware, haqasî jî girane. Ew rasthatinên me, ew şabûn û kêfxweşbûna me ya bi tevayî niha jî bona min bûne xewneke xweş, xewneke usa, ku gava ez ji xewê hişyar dibim, weke Simoyê bigota, cîyê xwe navînim di vê cîhana mezine berfireda. Herdu hogirên min jî ji zûva xatirê xwe ji min û ji vê cîhanê xwestine: heta-hetayê, weke dibêjin, hetanî roja qîyametê: berê Sihîd, piştra Simo. Lê Xwedê ji minra keremeke usa kirîye, ku ez ji ber undakirina wan danavî nabim û hetanî niha jî xwe li ser pîyan digrim: boyî xatirê wan jî her carekê gava ez weke hogir berpirsîyarîya xwe hindava herdu gorbuhuştan bi cî tînim, kevirê ser dilê min yê weke beraşê aşan siviktir dibe. Ez mexsedeke jîyana xwe jî di nava bi cîanîna vê berpirsîyarîyêda dibînim. Gava

ez gotar, nivîs, bîranîneke xwe ser wan bi cî tînim û didim weşandinê, rehetî û aramî tê ser dil û însafa min û ez jîyana xwe ya piştî wanara qet jî weke sûcekî nabînim. Her çiqasî jî derdê undakirina hogirên nêzîk girane, nemaze bona yên weke min yên xudanê temanê mezin, gava hêvîya bi destxistina hevalên nû îdî pir kêm dimîne, lê carna ez wan xem û derdan ji xwe didim revandinê bona ku bijîm û bi wê yekê bikaribim berpirsîyarya xwe himberî hogirên xwe yên undakirîda jî bi cî bînim: bi nasandina gelê kurd bi kar û bar, berhemên wan welatevînan, bi raxistina keda wan li ber çevên xwendevanên kurd û bi hesabê dawî parastina nav û karê wan bi awakî zêndî nava gelê meda. Ez carna dilê xweda wa difikirim: „Ez zêndî mame, lê hogirên min, yên nêzîke helale amin û bi taybetî Simoyê Şemo, felekê birin û ew bin ax û berên sarda dirizin û ber ku deng ji wana dernakeve lê ew hetanî warekî tên ji bîrkirinê, nemaze, gava berhemên wan bi giranî, piranîya xweva bi sebebê ji zûva weşandina wan û çapbûna bi tîpên kîrîlîk (rûsî) nebûne hebûna nifşên xwendevanên kurd yên îro, nemaze li Kurdistanê û beşên dîyaspora kurdî yên dervayî Sovêtistana berê. Û heger ez weke hogir wan gorbuhuştan xwedî dernekevim û derheqa jîyan, kar û bar, berhemên wanda xwendevanên kurd agahdar nekim an jî em dikarin wa jî bêjin, ji nûva zêndî nekim, usane, ez hogirê wan yê şîrhelal, amin nînim, heger nebêjim, hetanî warekî jî bêbext û nemerdim. Lê ya here mûhîm, zêndîmayîna min ya nemaze piştî mirina wan bi temamî û tam nayê afûkirinê. Ez li vê tangê dixwezim gotineke gelê me bînim ber çeva: „Kes ji çevên bin axê şerm nake„. Her çiqasî jî eva gotina ketîye nava gel û ber wê yekê jî ya gel tê hesibandinê, lê ew her bi tenê hetanî warekî ya raste. Ev gotin, weke ez haj xwe û karaktêrê xwe heme, qet jî bona min û kesên weke min, ku gelekin, nehatîye gotinê. Weke ez haj xwe û reng û rûyê xwe yê moralîyê heme, qet jî ne ji wan mirovan, ne ji wan kesame, ku ji çevên bin axê şerm nake. Dîtina min ewe, ku her kesek yê ku bi rastî mirove û hêjayî wî navê bilinde, gotî bêtir ji çevên bin axê şerm, fedî bike, ber ku xudanê wan çevan bêçar, bê hêz û bê

îmkanin û ewên zêndî gotî şûna wan jî li wana xwedî derkevin. A eve eyînî moral û mirovatî. Yên ku li hogirên xwe yên gorbuhuştî, li kar û bar, li berhemên wan, bi giştî li navê wan xwedî dernekevin ew mirovê bê moralin, mirovên bê şerefin. Û heger ez li wan hogirên xwe xwedî dernekevim- nikarim rehet bijîm. Xwedîderketina li hogirên gorbuhuşt, li vê tangê li Simoyê Şemo berîya hemûşkî ji bona min bi xwe xêre, ji bona min başe.Gava ez ya herî kêm gotarekê derheqa mamosta, hevkar û hogirê xwe yê gorbuhuştda bi cî tînim û diweşînim- bi awakî herî qenc û herî baş li xwe dihesim, wek mirovê ku deynê ruh û ruhyeta xwe dabe, wek mirovê, ku berpirsyarîya xwe ya acil û pêwîst bi cî anîbe, wek mirovê, ku xwe minetkarê wan heval û hogiran bibîne, yên ku zêndîtîya xweda lezeteke xweş dane wî.Lê Simo jî bi heyîna xwe, bi hogirtîya xwe, jîyana min dixemiland, ez kêfxweş û serbilind dikirim. Çawa dibe, ku ez wî hogirî ji bîr bikim, berpirsîyarîya xwe ya ji bona min ya pîroz himberî wî bi cî neynim. Heger bi cî neynim, usane ez bêbext û xayînim, usane, destûra min tune ez bi serbilindî bijîm. A bi vî awayî, ez bi xwedîderketina li Simoyê gorbuhuşt, li vê tangê bi awakî konkrêt xwedîderketina li mîrata wî ya berhemdarîyê, bi hêjatî nirxandina kar û barê wî yê qenc yê miletevîntîyê bi rastî li xwe û morala xwe xwedî derdikevim, ber ku ez bi vê kirina xwe ya qenc dihesim, lê Simo- na. Ber wê yekê jî ez nikarim, naxwezim, mineta xwe bixim ser wî hogirê xwe yê gorbuhuşt, çimkî bilî têgihîştin, femkirina wê yekê, ku ez weke minetkarê wî vê yekê dikim, her usa jî zanim û bawerim, ku ew bi vî karê min nahese. Lê minê çiqasî bixwesta, ku ew bi vî kar û barê min bihesîya, rasttir, ev kar û barê min, ku ji bona zêndîhîştina navê wî tê bi cîanînê, ruhê wîva eyan bibûya. Û ne ku ji bona ew bibûya minetkarê min, lê seva xatirê wê yekê, ku gava li vî karê min bihese rehettir mezelê xweda „razê„.

Ev daxwaz, ev mexseda min ya ji bona bi cîanîna berpirsîyarîya min himberî hogirê min yê ezîz ya sûbyêktîve, lê ev karê min, ku ser jînenîgarî û berhemên Simoyê Şemo, nirxandina wan tê bi

cîanînê, bi obyêktîvî xizmeta edebîyet û çanda kurdî, pêşketina wan dike û ez nikarim vê yekê nedim ber hesêb.

Bilî vî hemûşkî, gava ez jîyan, kar û barê Simoyê Şemo yê piraktîk û berhemdarîyê lê dikolim û radixim ber çevan- xweberî xwe daxwaz û meremekî dinê jî radibe ber min. Ez dixwezim bi mîsala jîyan kar û barê Simo, bi berhemên wî welatparêzê bi şewat jî nifşên gelê me yên îroyîn û dûyerojê bên terbiyetkirinê û ew jî gorî hereket û zanînên xwe weke Simoyê Şemo bikevin xizmeta gel û welatê xwe: çi di warê edebyet û çandêda û çi jî di warê avakirina welêtda. Cotkar, rêncber û karkirên basît jî dikarin navekî qenc dû xwe bihêlin: her yek weke zanîn û hereketê xwe.

CÎYÊ SİMOYÊ ŞEMO Dİ NAVA EDEBYETA KURDÎ YA Lİ ERMENÎSTANÊ

Berîya em ser jînenîgarîya Simoyê Şemo û piştra nirxandina kar û bare wî bi giştî û poêzîya wî bi taybetî rawestin me dixwest cîyê wî û hogirên wî yen temen û pênûsê di nava dîroka edebyeta kurdîda ya li Ermenîstanê kivş bikira, ber ku ew yek pêwîste ji bona bi heralî û rast nirxandina keda wî şayîrê me ya berhemdarîyê. Heger em dixwezin vê yekê zelaltir kivş bikin- pêwîst dibînin wê rewşa edebyeta kurdî li Ermenîstanê qet nebe bi kurtayî raxin ber çevan ya ku zemanê ji dayîkbûna Simo û nemaze yê hilgirtina pênûsa şayîrtîyê ji yalê wîda çê bibû. Em çima konkrêt besa edebyeta kurdî ya li Ermenîstanê dikin, gava bi rastî Simo helbestvanê kurde bi goveka temamîya Kurdistanê û gelê kurd? Ji ber wê yekê, ku ew nava goveka edebyeta kurdîda ya li Ermenîstanê, nava atmosfêra, ku wê edebyetê çê kiribû wek şayîr çê bû bi giranî ser bingeha tradîsîyon, û xusûsyetên wê edebyetê. Lê ew edebyet jî hetanî zemanê kamilbûna Simo weke helbestvan ji ya kurdî bi giştî ya li Kurdistanê destpêka sedsalên navînda bingehgirtî qutbûyî bû ji ber sebebê qutbûna civaka kurdên Sovyêtîstanê û bi taybetî ya kurdên

Ermenîstanê bi sînorên dewletê yên bi dîwarên (diriyên) hesinî ji Kurdistanê.

Bilî vê yekê faktoreke din jî rola xwe ya neqenc lîst di ware çêbûna girêdanan navbera edebyeta kurdî li Ermenîstanê û edebyeta kurdî li Kurdistanêda, ber ku heger berhemên şayîrên kurd yên Kurdistanê biketana ber destê xwendevan û ronakbîrên kurd yên li Ermenîstanê jî, lê ji ber wê yekê, ku ewana bi giranî bi tîpên erebî hatibûn çapkirinê, xwendin û têgihîştina naveroka wan ne mûmkûn bû, çimkî tîpên erebî ji bona ronakbîrên kurd yên li Ermenîstanê xerîb û nenas bûn. Vê faktorê, weke me got, her çiqasî jî roleke nêgativ, ne qenc ji bona çêbûn û pêşketina edebyeta kurdî li Ermenîstanê leyîst, lê ew bi awakî êndîrêkt dive bingeha pesinandina edebyeta kurdî li Ermenîstanê û xizmetkarên wê. Gotina me tê wê watê, ku edebyeta kurdî li Ermenîstanê her çiqasî jî hetanî zemanekî nebû berdewama tradîsyonên edebyeta kurdî li Kurdistanê yên dewlemend, lê dîsa jî ew bi giranî bi awakî serbest gihîşte destanînên baş di ware çêkirina berhemên edebyeta bedewî yên bi nirxda. Û gorî vê nêrînê jî em gotî berhemên Simoyê Şemo û hogirên wî yên pênûsê binirxînin. Ewana û berya wan- bingehdarên edebyeta kurdî li Ermenîstanê bi giranî bi awakî serbixwe edebyeteke kûr ya di ser asta hûnera bedenî ya anegor bilind çê kirin û raberî gelê xwe kirin.

Hilbet sebebekî dinê jî yê çêbûna edebyeteke kurdî ya bi vî awayî li Ermenîstanê heye, ku em pêwîst dibînin bi sivikayî ser şirovekirina wî rawestin.

Bingeha edebyeta kurdî li Ermenîstanê ji destpêka salên 30-î yên sedsala 20-î hate danînê, gava dewleta Yekîtîya Sovyêtîyê, rêvebirîya wê gorî polîtîka Lênînîyê ya miletîyê, her çiqasî jî zemanekî kivşda eynî rêvebirî bi serokatîya Stalîn bi motiva polîtîkî yên bi bingeha xweva sert çawa li kurdên welatê xwe, her usa jî yên li Kurdistanê hate xezebê, lê îmkanên qenc çê kirin ji bona pêşvabirina edebyet û çanda êtnosên welêt yên kêmjimar (mînorîtê), perwerdekirina wan, ku ji hinek miletên alîyê çandêda pêşketî şûnda

mabûn û bi cîanîna wê polîtîkayê berên here qenc û baş dan, nava kurdên Ermenîstanêda jî em dikarin bi temamîya xweva binav bikin wek şorişa çanda kurdî.

Netîceke bi cîanîna wê polîtîkayê jî bingehgirtina edebyeta kurdî ya hetanî warekî xwe serî xwe, serbixwe bû li wê komara Yekîtîya Sovêtîyê.

Em „hetanî warekî„ dibêjin, ber ku şûna edebyeta kurdî ya sedsalên navîn û yên nû ji ber sebebê li jorê kivşkirî edebyetên gelên Yekîtîya Sovyêtyê yên dinê tesîra xwe ser ya kurdî çêkirin, nemaze ya ermenîya, ber ku xwendin û têgihiştina berhemên wê edebyetê ji bona şayîr û pirozayîsên kurd yên ku perwerda xwe bi giranî bi zimanê ermenî dest anîbûn, hêsantir bû. Bingehdarên edebyeta kurdî li Ermenîstanê û gelek dûhatîyên wan jî valaya di warê edebyeta kurdîda çêbûyî, ku me li jorê besa wê yekê kir, bi berhemên zargotina kurdî jî dadigirtin, pir caran bi veçêkirina wan berheman ji yalê xweda.

Mixabin, weke me li jorê kivş kir, vê şorişa edebyet û çanda kurdî zemanekî dirêj berdewam nekir, ber ku dawîya salên 30-î rêjîma Stalîn bi çend êtnosên Yekîtîya Sovyêtîyê yên dinêra bi kurdên welatê xwe jî hate xezebê, bi sirgûnkirina beşeke kurdên Pişkavkazîyayê berbi Asîya Navîn û bi girtina dezgeh û rêxistinên edebyet û çanda kurdî. Pêşketina edebyeta kurdî li Ermenîstanê hate rawestandinê. Her bi tenê piştî mirina Stalîn di sala 1953-da rêke berfireh ji nûva li ber pêşketina edebyet û çanda kurdî hate vekirinê, ku em vê yekê dikarin bi nav bikin weke Ronêsansa çanda kurdî, ku ya li Avropa Rojavayê dixe bîra me. Ji sala 1955-da dest bi nûva weşandina rojnema kurdî ya „Rya teze„ , pirtûkên kurdî yên perwerdekirinê, yên edebyeta bedew û bi naveroka polîtîkî û zanyarî bû. Sêksîyona nivîskarên kurda li rex Yekîtîya Nivîskarên Ermenîstanê bi rêk û pêktir karê xwe meşand, Înstîtûta Rohilatzanîyê ya Akadêmîya Ermenîstanê ya zanyarîyêda beşa kurdzanîyê hate vekirinê. A di vî zemanîda li rex koma bingehdarên edebyeta kurdî li Ermenîstanê Erebê Şemo, Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê

Gênco, Casimê Celîl, Wezîrê Nadirî, Ahmedê Mîrazî, Etarê Şero nifşeke pirozayîs û helbestvanên kurd ya nû peyda bû, ku em dikarin wek nifşa duyemîn bi nav bikin. Bi sebebên cihê-cihê û nemaze bi saya hebûna bingeheke edebyeta kurdî ya ku li Ermenîstanê salên 30-î hatibû dadanê, evê nifşa nû bi xwera edebyeteke kurdî ya bi hûnera bedewî û zimanê kurdî yê xwerûtir û tam û temamtir anî. Û ji ber ku qehremanê vê pirtûka me Simoyê Şemo yê helbestvane emê navê çend şayîrên kurda yên ji nifşa wî yên here bi kemal (talant) hildin, yên ku bûn xeleqa wê zincîrê ya navîn ya ku nifşa yekemîn û duyemîn bi hev ra girêdan, gîhandin hev, heger em bi awakî dinê jî bêjin, yên ku bûn berhemdarên nifşa duyemîn yên here pêşin: Qaçaxê Mirad, Mîkayêlê Reşîd, Sihîdê Îbo, Fêrîkê Ûsiv, Şikoyê Hesen, Eskerê Boyîk, Karlênê Çaçanî, Şemsî (Egîtê Şemsî), Rizalîyê Reşîd, Çerkezê Reş... û di nava sergovendîyên vê govenda kurdîda qehremanê vê kitêba me Simoyê Şemo.Lê ya here mûhîm ji bona bi giştî, bi temamî nirxandina poêzîya Simoyê Şemo em kivşkirina wê yekê dihesibînin, ku di nava van şayîran û bi temamî hemû şayîrên kurdanda yên sedsala 20-emîn li Ermenîstanê, heger em dikarin bi vî awayî bêjin, ew bi destxeta xwe cuda dibe, bi awa, bi stîla xwe ya xisûsî, bi wê yekê, ku gava xeteke helbesta wî, hetanî sernavê helbesteke wî jî dixûnî, hilbet, gotina min derheqa zane, pisporên helbesta kurdîdane, dest xweda pê dihesî, ku xudanê wan xênji Simo helbestvanekî dinê nîne. Em dikarin li ser vêda vê gotinê jî bînin: Simoyê Şemo awa, cure, stîl, destxeta xwe di nava ne ku bi tenê poêzîya kurdî ya Ermenîstanêda, lê di nava temamîya helbestvanîya kurdîda anî hole, ku em dikarin bi nav bikin wek awa, stîla Simo. Her çiqasî jî, weke haya min baş jê heye, Simo ne ku bi tenê hemû berhemên şayîrên kurd, lê gelekên yên bîyanîyan jî û bi taybetî yên ermenîyan jî xwendibûn û dixwendin, lê ew tu cara haqasî neket bin tesîra berhemên wan, ku bi çevlêdan yanê jî bi hemdî xwe awa û stîla nivîsandina xwe unda bike, bi pejirandina ya helbestvanekî dine, her çiqasî jî ew helbestvanekî mezinbe. Eva tê wê menê, ku Simo bi xwendina helbestên xelqê her her bi tenê

zanînên xwe di ware poêzîyayêda dewlemend dikirin, lê nivîsandina helbestên xwe gorî wan deng û awazan bi cî danî, yên ku ji kûraya dilê wî, hest û hisên wî bi xwe dihatin, diketin guhên wî û ji wir ewî dixistin nava pênûsa xwe.

JÎNENÎGARÎ, KAR Û BAR

Olka kurdan ya here giran, here jimarmezin li Ermenîstanê li deşta Araratê, yanê jî wek rûniştevanên kurd yên basît bi xwe digotin li deşta Rewanê (eva navekî paytextê Komara Ermenîstanê ya Sovyêtîyê yê kevnar bû), her çiqasî jî li vira gundên xwerû kurdî gorî navçên dervayî sînorên vê deştê û nemaze yên navçên Elegezê (Axbaranê) û Telînê bi jimara xwe pir kêmtir bûn. Bi temamî, tomerî hevgirtina kurdên virara digotin Êl, ber ku ew bi giranî ji êla Ûsiv Begê yanê jî Hesinîya pêk dihat. Beşeke rûniştevanên vê Êlê jî ji Êla Zuqurîya yanê jî ya bi navekî dine, ya Cangîr Axa pêk dihat. Ev hemû kurdên êzdî bûn. Lê bi jimareke ne pir ji ya kurdên êzdî li vira kurdên musulman jî diman. Ew jî bi piranîya xweva weke kurdên vira yên êzdî nava bîyanîyada, gundên bîyanîyanda diman: kurdên êzdî bi giranî di gundên ermenîyanda, lê kurdên musilman-yên azêrîyada.

Bavê pêrsonaj, qehremanê vê pirtûka me Elîyê Şemo merîkî navdar û nandar bû, him nava eşîra xwe ya Şerqîyada û him jî di nava Êlêda bi temamî. Û heger Şerqîya weke qebîl û berekên dine ji axatîyê û begtîyê hiz bikirana ew navê bêfitîya bihata ser Elîyê Şemo jî. Lê bê wî navî jî mirovên Êlê nave Elîyê Şemo bi awa û awazekî usa hildidan, danîn ser zarê xwe eyînî weke navê axa yanê jî begekî eslî hildin. Carana, gava dixwestin pesnê merîkî bi hêjatî bidin, ewî bi hêjatî bidin naskirinê, bes bû bigotana: „Mêrekî eynî hunkûfê yekî weke Elîyê Şemoye„.

Şayîrê kurda yê bi nav û deng Simo lawê vî ciwamêr û xweşmêrîye û nav û paşnavê wî yê bi awayê kurdî jî Simoyê Elîyê Şemoye.

Elîyê Şemo 92-salîya xweda

Simo 18-ê gulanê sala 1928-a li gundê nawça Hoktêmbêryanê, berîya wê ya Serderavê, piştra ya Armavîrê- Kelederxê (niha Şênavan), weke me li jorê gotîye, malbeteke eşîra şerqîya ya kurdên êzdîda hatiye dinyayê.

Vê malbetê tevî piranî, giranîya malbetên kurdên deşta Araratê yên dinê jîyana nîvkoçerîyê berdewam dikir. Gundên wan, xanîyên wan hebûn, lê gava weke kurdên me dibêjin, erdê gul vedida, bahar dihat dest bi hilgêra malbetan bi kon (piştra her usa jî bi çadir-xêbet) û kerên pezê xweva diçûn berbi çîyayên Elegezê, Axmaxanê û Mîsxanê, li berpalên kîjanan wana konên xwe vedigirtin, çadir-xêbetên xwe datanîn û li wir, li zozanên bilind diman hetanî payîza

derengî- dagêrê. Simo jî weke lawekî ji lawên wan malbetan beşeke jîyana xwe, nemaze ya zarotîyê û xortanîyê nava zomên kurmancîyêda buhurand, li wira berxvantî kir, lê terka xwendina xwe ya dibistana gundda neda, ber ku ew yek daxwaza bavê wî ya Elîyê Şemo yê dûrdîtî û aqilbend bû.

Weke Simo di bîranîneke xwe da kivş dike, ku bi sernavê „Ez çawa bûme doxtir„ pirtûka wî ya bi sernavê „Baxçê payîzê„-da çap bûye (Yêrêvan, 2008) piştî temamkirina dibistanê jî ew terka berxvantîyê û zozanê çîyayê bilind nade. Xîyal, mexseda wî ew bûye, ku bibe doxtir. Û ev merem-mexseda wî piştî bûyereke bi tesedûfî çêbûyî tê sêrî. Awa, gava rojekê Simo ber berxê xwe bûye, avtomobîlek tê zozana wane berpala çîyê. Nav rêwyên wê da bûye her usa jî serokê xwendinxana Yêrêvanê ya doxtirîyê Xaçîk Hovhanîsyan. Ev Xaçîk bi destî kurdekî, ku navê wî Ahmed bûye dema qira (gênosîda) ermenîya ji kuştinê tê xilazkirinê û piştra dikeve sêwîxana Gumirîyê. Gava Xaçîk pê dihese, ku Simo koma 10-a xilaz kirîye û dixweze xwendina xwe berdewam bike, pêşnîyar dike ku ew here cem wî ji bona bi cîanîna mexseda xwe. Bi wî awayî Simo dive xwendkarê xwendinxana doxtirîyê. Piştra bi alîkarîya Hecîyê Cindî, ku hevalê Xaçîk Hovhanîsyan yê sêwîxanê bûye, Sihîdê Îbo jî dibe xwendkarê wê xwendinxanê.

„Bi wî awayî, Simo bîranînên xweda dinivîse:-Min û Sihîd tevayî xwend. Me xwendingeh bi dîploma (şedetnema temamkirinê – W.E.) dereca pêşin (ya sor) xilaz kir û em bê întam ketine Ûnîvêrsîtêta Yêrêvanêye doxtirîyê…„.

Piştî temamkirina xwendinxana doxtirîyê, ku alîkarên doxtirê eslî bi navê „fêldşêr„ amede dikir, sala 1951-ê Simo bi zemanekî ne dirêj wek alîkarê doxtir li navça Ermenîstanê ya Telînê kar dike û xizmeta rûniştevanên wê yên kurd jî dike, ber ku li wir bêtirî 15 gundên kurdan yên mezin û biçûk jî hebûn. Lê bi destanîna pêşê doxtirê eslî tabetîyê nade wî û ew careke din vedigere Yêrêvanê, vê carê dibe xwendkarê Înstîtûta wê ya doxtirîyê. Sala 1957-a ew dawîyê li xwendina Înstîtûtê tîne û dîploma doxtirê eslî, temam bi

dest dixe. Vê carê wî kivş dikin weke serok-berpirsîyarê nexweşxana gundekî kurda yê Elegezê li navça Axbaranê. Li vir jî bilî rûniştevanên ermenî (yên çend gundên ermenîya yên dora Elegezê- W. E.) Simo xizmeta rûniştevanên kurd jî dike, ber ku dora Elegezê 11 gundên kurdan jî hebûn. Weke doxtirê zane û êgin ew pir karên hêja bi cî tîne ji bona parastina saxî, tundurustîya rûniştevanan û ji ber wê yekê jî nava wanda rûmet, sîyaneteke bilind qazanc dike.

Sala 1966-a Simoyê Şemo tê Yêrêvanê, li vira polîklînîk û nexweşxanên cuda-cudada kar dike û bi taybetî, bi dema here dirêj li polîknîka xwandkara ya navendîda wek serokê beşa rêngênolojîyayê. Li vira jî girêdanên wî bi rûniştevanên bajêr û navçên Ermenîstanê yên nêzîk û dûr yên kurd nayên birîn. Nexweşên kurd ji hemû navçên Ermenîstanê xwe li wî digirin, ber ku wî îdî deng dabû ne ku bi tenê wek doxtirekî zane û êntûzîyast, lê bi serda jî yê dilsoz û xemkêş. Hemîn kurdîtîya wî jî di vî warîda roleke kivş leyîstîye. Li vira, Yêrêvanê Simo ne ku bi tenê xwe, lê doxtirên ermenî yên hogirên xwe jî dixe xizmeta nexweşên ji miletê xwe: gorî pêşe, spesîyalîstîya wana.

Simoyê Şemo hetanî temenê kaltîyê jî xizmeta rûniştevanên Ermenîstanê yên ermenî, kurd û ji miletên dinê kir: bê danîna varvêşîyê navbera wanda.

Ji ber sebebê rijîyana xûnê ser mejûyê wî, Simoyê Şemo, piştî zemanekî kin li Yêrêvanê, 30-ê mijdara sala 2000-ê wefat kir. Ew goristaneke navça wî ya Armavîrê binax kirin li tenîşta mezelên dê û bav, xûşk û bira, mirovên ji malbet û qewimiyeta wî yên dinê.

* * *

Helbestên Simoyê Şemo yên yekemîn li ser rûpêlên rojnema Înstîtûta doxtirîyê ya pirtîrajê, pirjimarê hê di destpêka salên 50-îda bi zimanê ermenî tên weşandinê, ber ku wî weke ronakbîrên kurd yên dinê perwerda xwe bi zimanê ermenî bi cî anî bû û her çiqasî

jî kurdîya bi zar, axaftin baş zanibû, lê ji wîra, xilazkirîyê dibistana ermenîra zehmet bû helbestan bi nivîskî, bi kurdî li hev bîne.

Guhêrandineke mezin, bingehîn nava jîyana Simo û hogirên wî yên kurd yên pênûsê, jîyana wan ya berhemdaryêda çê bû, gava sala 1955-a li Yêrêvanê, piştî rawestandina ji sala 1938-a ji nûva hate weşandinê rojnema kurdî ya Rya teze. Ji ber çêbûna vê îmkanê û firsendê ew dest bi nvîsandina helbestan bi zimanê kurdî dike û wana di rojnema kurdîda dide weşandinê. Piştî zemanekî ne dirêj helbestên wî vê care bi wergera ji kurdî ya ser ermenî ser rûpêlên rojneme û kovarên ermenî jî tên çapkirinê, bi taybetî yên kovarên „Pyonêr„ û „Sovêtakan grox„ (Nivîskarê Sovêtîyê).

Simoyê Şemo bi rêdaksîyona weşanên kurdî yên Radîyoya Ermenîstanêra, ku ji Yêrêvanê sala 1955-da dihatin bi cî anînê, bi dayîmî hate girêdanê. Bi serî radîyoyê ne ku bi tenê kurdên Ermenîstanê û komarên Yekîtîya Sovyêtîyê yên dinê, lê her wa yên herçar beş, perçen Kurdistanê jî bi dilxaşî dibûn guhdarên helbestên Simo û hogirên wî yên pênûsê.

Piştî vê yekê Simo weke şayîr haqasî deng dide û helbestên wî haqasî tên pejirandinê, ku wana îdî antolojîyayên (berevokên) berhemên nivîskarên kurdda jî didin çapkirinê yên bi van sernavan: „Nivîskarêd kurdêd Sovyêtîyê„ (Yêrêvan, sala 1957-a) „Efirandinêd nivîskarêd kurdêd Ermenîstanêye Sovyêtîyê„ (Yêrêvan, sala 1961-ê). Piştra berhemên Simo piranîya jimarên wê berevokê, wê antolojîya berhemên nivîskarên kurdda tên çapkirinê ya ku bi sernavê „Bahara teze„ û piştra „Bahar„ ji destpêka salên 1980-î hetanî nîveka salên 90-î bi sîstêmatîkî, salê bi carekê li Yêrêvanê dihat weşandinê.

Bûyareke kivş û bi pêra jî ya şabûn û serbilindîyê nava jîyana şayîrda hesibî çapbûna berhemên wî bi pirtûkeke cuda, ya xwerû ya wî ya yekemîn. Sala 1961-ê li Yêrêvanê berevoka helbestên Simo bi sernavê xweşik ya „Nûr„ hate weşandinê. Xwendevanên kurd ew pirtûka Simoyê Şemo bi dilxweşî pejirandin, nemaze yên ciwan, ber ku şayîr ji dilê wanra diaxive. Ji vê pirtûka yekemîn kivş bû, ku

xudanê wê şayîrê Lîrîkîye yê hest hesên pîroz û nazike, aşiq û maşoqê evîndarîyêye, evîndarê xwezayê û keça kurde çevbeleke nazike nazdare. Lê ya here mûhîm, poêzîya wî tezetîkê bi xwera tîne, tezetîya naveroka helbestan û nexş û awaz, cûrê nivîsandina wan, gava ew weke hinekan helbestên şayîrên bîyanî û kurd kopî nake. Bê ku navê xudan li serfêz yanê jî binatara helbestan bixûnin xwendevan ji awayê nivîsandina helbestan û naveroka wan jî texmîn, tecrûbe dikin, ku ew yên Simoyê Şemone. Şayîr bi xwera, heger em wa jî dikarin bêjin, destxeteke nû anî, destxeteke usa, ku ya tu kesî din dubare nake yanê jî ya tu kesî din nayne bîra mirov. Ewa îdî nîşana esil şayîrtîyê bû.

Motîvên evîndarîyê di berevokên şayîr yên dinêda jî sertacî dikirin, cîkî herî mezin û giring distendin. Lê eva gotina me qet jî nayê wê watê, ku Simoyê Şemo her bi tenê evîna dil kiribû hedefa poêzîya xwe. Weke emê piştra bivînin, bi kamilbûna helbestvantîyê û mezinbûna temenra, bi tevayî pircûretî û dewlemendî diket nava poêzîya wî, goveka babet, têmayên, ku helbestên wîda dihatin eşkerekirinê, berfirehtir dibû.

Sala 1967-a pirtûka helbestên Simoyê Şemo ya duyemîn bi sernavê „Xetêd hubê„ li Yêrêvanê hate weşandinê. Bi helbestên vê berevokêda Simo xwendevanên xwe bi xwera dîsa dibirin zozanên çîyayên Elegezê û Mîsxanê yên bilind, nava zome û rêzên konên kurmancîyê, ber kanî û cewên avên sare zelal, nava gul û gîhên bînxweşe hezar rengî û awazî û di goveka wanda bal keçên kurdan yên weke karxezalan, ku bi wergirtin, bi xemila xwe tê qeyî bêjî xwezayêra ketine hucetê, bi tebiyetêra, wek gelê me dibêje, şerin.

Pirtûka Simoyê Şemo ya bi sernavê „Hikyata derheqa balçêmkêda„ dîsa li Yêrêvanê sala 1971-ê ronayî dît, piştra pirtûkên şayîrê xudanê pênûsa adan, bi xêr û bereket ji hev neqetîyan, dû hev ketin sire, rêz bûn yên bi van sernavan: „Ez û Êl„ (Yêrêvan sala 1974-a), „Gula gêlî„ (Yêrêvan, sala 1979-a), „Rênga dila„ (Yêrêvan, sala 1983-a).

Bi mûnesebeta 60-salîya ji dayîkbûna şayîrê hizkirî berevokeke

kurdlib.online

berhemên wî ya pirrûpelê bi sernavê „Dilê bengî„ dîsa li paytextê Ermenîstanê sala 1989-a hate weşandinê. Sernavê pirtûkê bi xwe û yên beşên wê naveroka helbestên di wanda, babetên wan helbestan radixin ber çevan, eyan dikin. Awa sernavên wan beşan: „Weten xweşe„, „Dil kal nabe„, „Tebyet„, „Heve laqirdî„. Weke ji sernav bi xwe jî kivş dibe, ku di vê beşa dawîda helestên şayîr yên hûmorîyê-satîrîyê, yên rexnegirîyê hatibûn bi cîkirinê. Berhemên vê beşa pirtûkê nîşan didan, ku vî temenê angor mezinda û bi zemanekî kivş pştra jî Simoyê Şemo hesîna şabûnê, henek-laqirdîyan û bi giştî hûmorê unda nekiribû.

„Dil kal nabe„. Belkî ev gotin li gelek mirovan tê, bona beşeke mirovan rast tê ser zar, lê ji bona helbestvanekî weke Simoyê Şemo rastîke temamtir û tamtire, rêalîtêyeke ber çevane. Şedetîya kalnebûna dilê Simo li ber çevane, hema-hema piranîya helbestên vê berevokêne û bi temamî peydabûna berevokeke wa bi xweye: weke me got, temenê 60-salîyêda. Em çima ser temenê Simo mexsûs radiwestin? Awa ji ber çi. Weke jîyan û karkirina berhemdarîyê, efirandinê ya şayîrên temamîya cîhanê nîşan dide, eşkere dike piranîya şayîrên temenê 40 û nemaze 50 salîyêda, em îdî hewce nabînin derheqa temenê ji wî temenî mezintirda bêjin, „stewir„, „çik„ dibin: weke çêlek û mî heyamê payîzê. Belê, vî temenîda tûrê wan ji helbest û destanan vala dibe, ber ku bi giranî helbest netîce, berê ruhê ciwanane, berê dilê bengî, evîndar. Helbest netîca xem û xîyalên dilê bengîne, ku em dikarin bişibînin ava sîtileke mezin ya çarçemilê, ku ser agir-alava gur dikele û fûr dide û av ji kevîyên wêra dirije ser erdê. Lê temenê mezinda ne ew agir-alava gur dimîne, ne jî, îdî femdarîye, ava sîtilêda dikele û dikele. Ber vê yekê jî şayîrên cîhanê yên here mezin jî temenê mezinda dest ji sêwirandina helbestan kişandine û dest bi nivîsandina berhemên dûznivîsarê, pirozayê û bîranînên xwe kirine.

Lê Simo, her çiqasî jî eva yeka weke paradoks kivş bibe, piştî temanebûna 60-salîyê jî terka helbestvanîyê neda, weke berê helbestên evîndarîyê, bengîbûna ser keça kurd û xwezaya zozanên

çîyayên bilind sêwirandin, lê vê care bi awayê bîranîna rojên bengîbûna xwe ya temenê ciwanyê. Îzbatîke vê yekê ya here geş hesibî weşandina pirtûka wî, rasttir, berevoka helbestên wî ya sala 1995-a li Yêrêvanê bi sernavê xweşikî „Zozan„. Ev navê zozan ber dilê şayîrda navekî ezîz û şîrin bû, wî navî zarotî û xortanîya wî ya buhurî temenê mezinda dixist bîra wî, zarotî û xortanîya hêçxem (bê xem) di nava dor û berên xwerû kurdî û kurdîtîyêda, ber ku her bi tenê malbetên kurd li wan zozanan dihêwirîn.

Her çiqasî temenê Simo mezin dibû hisret, kovana wan zozanan jî dilê wîda zêde dibû. Û ji ber ku vî temenê mezinda û gîrobûna kar û barê doxtirîyêva çûyîna wî ya li zozanan dijwar dibû ew vê care bi xîyalên xweva diçû nava zomên kurmancî, ku li pala çiyayên bilind nava xwezaya (tebiyeta) hikyatî ya xweşikda çê dibûn, hev digirtin û xemila here xweşik keçên kurd bi cil û berên xwe yên di rengê kulîlk, sosinên çîyê didan xwezayê.

Simo bi helbestên vê pirtûka xwe jî îzbat kir, ku ew ne ku bi tenê weke helbestvan kal nabe, lê bi serda jî weke evîndar: yê cîhanê, welat û xwezayê, yê keça kurde wek horî-milyaket. Bi vê fikrê pir balkêşin ev helbestên wî yên vê berevokêda: „Gelo hebûya„, „Ser du kanîyên Elegezê„, „ Min vî dilî„, „Baxçê min„, „Pesnê yarê„. Ew yek jî pir balkêş û têrêsante, ku heger xwendevan bi tenê sernavên helbestên Simo bixûne îdî tecrûbe dike, kanê naveroka wan çiye, çawane, helbestvan di wanda çi dixweze bêje. Bi vê fikirê em dikarin bêjin, ku sernavê her helbesteke Simo wek helbesteke temame. Xwendevan bi wan sernavan hema bêjî temamîya naveroka helbestan dihese. Eva jî kemal, şureteke esil helbestvane.

Û ne ku bi tenê hisret, kovana zozanan, ku ji zarotîyêda nava hiş û sewda, dil û ruhiyeta wîda bi cî bibû, ew bi xîyalî dibir zozanan, li cîhana xwerû kurdî jî. Simo gundekî deşta Ararateda dima, ku piranîya rûniştevanên wî ermenî bûn. Dibistana wir jî ya ermenî bû. Lê rûniştevanên zozanan hemû kurd bûn, ber ku kurd bi tenê li wir dihêwirîn. Û ji ber vê yekê bû jî, ku wan zozanan weke meqletûzê şayîrê miletevîn berbi xwe dibirin, dikişandin. Heyîna jîyana nîv-

koçerîyê, mayîna kurdan li zozanan di nav hevda nedihîşt, ku kurd zû bi zû asîmîle bibin, nemaze zarokên wan. Zozan û zomên çîyayên bilind çevê kurdan û nemaze helbestvanê welatevînda weke Kurdistaneke biçûk dihatin dîtinê.

Pirtûka Simoyê Şemo ya bi sernavê „Zozan„ zêndîtîya wîda çap bû.Hetanî dawîhatina jîyana wî ya payîza sala 2000-êda û piştra jî hetanî sala 2008-a deng ji Simo çê nebû. Ez dibêjim: „Deng ji Simo çê nebû„ li ber hesêb girtina kivşbûna pirtûkeke wî ya nû bi zemanekî angor dirêj. Evê yekê xemgînîya min ya ji ber mirina hogirê ezîz bêtir kir. Lê, awa, sala 2008-a min dîyarîke giranbaha ji lawê Simo yê li Yêrêvanê- Rizgan stend: pirtûkeke hogirê xwe ya nû çapbûyî ya ku ez her wa benda wê bûm. Min ev pirtûka hogirê xwe wek nîşana berdewambûna jîyana wî, her çiqasî jî eva yeka weke paradoks kivş bibe, piştî mirina fîzîkî qebûl kir. Ez bi wê yekê jî kêfxweş bûm, ku ew pirtûka bi sernavê „Baxçê payîzê„ bi tîpên latînî hatibû weşandinê, ku ewê dike mal û milkê xwendevanên kurdên dervayî Sovyêtîstana berê jî: Li Kurdistana welatê şayîr û beşên dîyaspora kurdî yên dinê.

Ez vê yekê mexsûs kivş dikim, ber ku berîya çapbûna vê pirtûkê, heger em weşanên kurdî yên bi radîyoya Yêrêvanê negrin ber hesêb, berhemên şayîrekî weke Simoyê Şemo yê xudanê kemala helbestvanîyê ya mezin hema-hema nebibûn mal û milkê xwendevanên kurd li dervayî Sovyêtîstana berê, çimkî ew hemûşk bi tîpên kîrîlîk(rûsî) hatibûn çapkirinê û xwendina wan pir zehmet bû ji bona wan xwendevanên kurd. Bilî wê, pirtûkên Simo û hogirên wî bawer bikî nedigihîştin ber destê xwendevanên dervayî Sovyêtîstanê. Her bi tenê helbesteke şayîrekî weke Simo ya bi sernavê „Sal çûn„ di „Berevoka helbestvanên kurd„-da bi tîpên latînî hatibû bi cîkirinê, ya ku bi amedekirina Balî Xan û Rohat weşanên Komkarê di sala 1982-da li Firankfûrta Almanîyayê kiribû milkê xwendevanên kurde dervayî Sovyêtîstanê.

Hest û hisa şabûnê ji ber wê yekê jî bal min çê bû, ku ev berevoka helbestên Simo bona çapkirinê bi destî lawê wî, Rizgan û ede-

byetzanê kurd yê xudanê kemala mezin û bi nav û deng Çerkezê Reş hatibû amedekirinê. Bi serda jî Çerkezê Reş ji bona wê pirtûkê pêşgotineke bi kurtebirî, lê bi pir bi nirx nivîsandibû, di kîjanêda bi awakî kûr û pirgoşe, bi awakî tomerî temamîya poyêzîya Simoyê Şemo analîz kiribû û bi hêjatî dabû nirxandinê. Lê sed mixabin Çerkezê Reş weke Simo ev pirtûk weşandî nedît, destpêka eyînî sala 2008-da ewî jî xatirê xwe ji me û vê cihanê xwest.

Ez bi wê yekê gelekî kêfxweş bûm, ku ev pirtûka bavê xwe lawekî Simo-nuxurîyê wî Rizgan ji bona çapkirinê amede kirîye: bi hilbijartin û careke din weşandina gelek helbestên Simo yên berîya hingê çapbûyî û ji nava arşîva bavê dîtin û hilbijartina helbestên wî yên zemanê jîyana xwe ya dawîda nivîsandî ji bona çapkirina wan di vê berevokêda cara yekemîn.

Di nava rewşa îroyîn ya gelê kurdda bi temamî û tomerî û ya kurdên Sovyêtîstana berêda bi taybetî, gava rêxistin û dezgehên dewletê ji bona xwedîderketina keda nivîskar û zanîyarên kurd hela hê çê nebûne, bi serda jî yên heyî, nemaze yên li Sovyêtîstana berê û bi tayetî li Ermenîstanê xirab bûne, ji hev berdane- xwedîderketina şexsên cuda-cuda li keda nivîskar û zanîyarên kurd, nemaze yên gorbuhuşt daxwaza jîyanê ya acile, karekî pir pêwîst û aktûale(acilê). Ez ji vê tangê kar û bare Rizganê Simo dinirxînim yê di warê xwedîderketina li keda (mîrata) bavê xwe yê hêja. Bi vê yekê Rizgan ne ku bi tenê bi kêrî bîranîna bavê xwe, bi kêrî karê zêndîhîştina wî tê, lê ya here mûhîm, xizmeta edebîyet û çanda kurdî dike, ber ku keda bavê wî xezna edebîyeta kurdî dewlemendtir dike. Lê ez weke hogirê Simo yê nêzîk qet jî ne wê bendê, ne wê bawerîyê bûm, ku Rizganê lawê wî yê ku pêşê xweva doxtire û hetanî van dawîya jî dûrî kar û barê di meydana edebîyet û çanda kurdîda rawestîya bû, wê vî karê mûhîm û ne haqas hêsa bi cî bîne. Lawên wara gelê me dibêje lawên şîrhelal. Ji ber vî karê qenc ez mûhîm dibînim di vê pirtûka xweda wê agahdarîya ser jîyan, kar û barê Rizganê Simo (nav û paşnavê wî yê ofîsîyal, dokûmananda bi vî awaye: Rizgan Simoyî Şamoyan) temamî bînim navê, ya ku

weke ji awa û awaz, ji stîla nivîsandina wê kivş dibe û ser qalik, rûyê vê pirtûkê yê dawî hatîye çapkirinê, bi destî rêdaktorê wê Çerkezê Reşî gorbuhuşt hatîye nivîsandinê. Ew bi tenê agahdarîke basît nine, lê bi pêra jî nirxandina kar û barê Rizgan di warê çapkirina berhemên bavêda. Awa ew agahdarî û nirxandin:

Rizganê Simo

,, Nuxurîyê Simoyê Şemo Rizgan, sala 1953-a, li gundê Şênavanê (marza Armavîrê) hatîye dinyayê. Sala 1979-a înstîtûta Yêrêvanêye doxtirîyê demam kirîye. Peyî demamkirina întêrnatûrayêra, heta sala 1984-a wek doxtir li marza Armavîrê gundê Zartonkêda (Qamûşlû) xebitîye. Sala 1985-ada wek dersbêj (lêktor) Ûnîvêrsîtêta Yêrêvanêye dewletêda kar dike.

Sala 1997-2005-a usa jî cîgirê dêkanê fakûltêta doxtirîyê bûye.

Berendemê (kandîdat) zanînên doxtirîyê (bi pîvanên Rojavayê: doktor) Rizganê Simo xudanê wek 25 gotarên zanyarî û 4 kitêbên dersaye, bavê sê kuraye.

Rizgan, çawa ewledê Simoyê Şemoyî şîrhelal timê bi xemxurî berbirî mîrata bavê xweye wêjeyî (edebîyet) bûye. Aha peyî wefatbûna bavêra wî arşîv û destnivîsar hildane destê xwe. Ev berevok Rizgan bi xwe hazir kirîye û daye weşandinê. Karekî bi rûmet û layîqî pesnandinê û şêkirdarîyê hatîye kirinê, kîjan kemala edebyetî- dîrokî dest tine,,.

Lê bi şabûn, kêfxweşbûna ji ber cîhatina vî kar û barê qenc û pêwîstra bi tevayî ez xemgîn bûm, ku Simo ev pirtûka xwe ya pirrûpelê, bi berge, qalikê xweşik, ku li ser wî fotoyê wî hatibû bi cîkirinê û bi tîpên latînî, ku nemaze vî zemanê meda ji bona weşandina pirtûkên kurdî gelekî girînge, nedît. Lê gava ez di nava naveroka wêda kûr bûm, nemaze min helbestên hogirê xwe yên ku wî salên jîyana xwe yên dawî nivîsîbûn xwendin xemgînîya min zêdetir bû. Min bi wan helbestan hogirê xwe yê pir salan nas nekir: Simoyê berê, Simoyê dilşa, bi kêf, xweşbîn-optîmîst, bengî, evîndarê jîyanê, xwezayê û keça kurd, pesindar-dengbêjê jîyana kurdên Ermenîstanê ya xweş. Rasttir, min hogirê xwe yê pir salan ji nûva, temamtir û baştir nas kir. Simo, weke ji helbestên wî yên salên jîyana wî yên dawîda nivîsandî kivş dibû, şikestibû, morala wî xirab bibû hetanî wî warî, ku ew mêrê mêrxas, mêrê xurt û xweyê cesaret û îrada xurt û mezin bi çapeke texmînkirinê, kivş hêvîbir û neçar, feqîr û tengezar bibû. Ser sebebên vê şikestina xweşmêrekî weke Simo, ser naveroka helbestên wî yên hevîbirîyê û xemgînîyê emê piştra bi giranî rawestin, gava gotina me bê ser babet, naveroka poyêzîya wî û nemaze ser naverok û babeta beşeke berhemên wî, ku, weke me îdî gotîye, salên jîyana wî yên dawîda hatine sêwirandinê û di vê pirtûka wîda hatine bi cî kirinê.

NİRXANDİNA POYÊZÎYA SİMOYÊ ŞEMO

Çawa ez dixwazim poyêzîya helbestvanekî weke Simoyê Şemo binirxînim- berîya hemûşkî ev gotina helbestvanê alman yê mezin Volfgang Giyotê dikeve bîra min: „Heger tu dixwezî ji helbestvan û berhemên wî rind fem bikî- gotî wî welatî bibînî û nas bikî, yê ku ew lê maye,,. Lê gava gotin tê ser Simo em gotî wî „welatî,, bi govkeka tengtir bibînin, bêtir bi fikra êtnogirafîk, lê ne ya sînorê welatekî xwerû yê wî. Gotina me ser wê yekêye, ku helbestvanê kurd welatê bav û kala, welatê xwe yê eslî- Kurdistanêda nedima, lê li welatekî xerîb dima, her çiqasî jî rûniştevanên wî welatê- ermenî kevnarda cînar û dostên bav û kalên wî bûn. Her çiqasî jî ermenî ji nijadekî dinê bûn bi zimanekî bi temamî ji yê miletê Simo cuda diaxivîn, û ya here sereke, piranîya rûniştevanên wî welatî (Ermenîstana Sovyêtîyê) ya absolûte bûn, li kîderê Simo jî dima û li dawîyê, helbestvanê kurd dibistana ermenî, piştra înstîtûta ermenî demam kir, lê xwerû kurd ma: him bi zimanê xwe û him jî bi fikrandin, karaktêr û hetanî ruhiyet, hest û hisên xwe jî. Sebebê vê yekê yê bingehîn ew bû, ku Simo zarotî û xortanîya xwe di nava civaka xwerû kurdîda derbaz kir: Li zozanên çîyayên Ermenîstanê yên bilind, heger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, rûniştevanên kîjana bawer bikî bi tenê kurd bûn. Gotina me derheqa berpalên çîyayên bilind dane, li ku derê çêkirin, avakirina gundan û bajaran ji ber qewl û şertên hewa bilind, sert û sar ne mûmkûn bû. Her bi tenê mehên baharan û havîna li wir jîyana normal dibû, lê ew jî bin konên kurmancîyê, çadir-xêbetanda.

Belê, Simo çevên xwe li vê cîhana ronik, weke dibêjin, vekirin-venekirin çîyayên bilind, ezmanê serfêza wî yên hêşîn û zomên kurdên nîvkoçer dîtin, yên ku ji ber vê jîyana li zozanan ya bi awakî kompakt (ser hev) kurdîtîya xwe ya berîya bi hezaran salan diparastin. Awa, ji ber vê yekê bû, ku lawekî wan kurdan- Simo ne ku bi tenê temamîya jîyana xweda xwerû kurd ma, lê ew kurdîtîya xwe, rasttir, bîr û bawer, raman û xîyalên xwe yên xwerû kurdîtîyê

xistin nava poyêzîya xwe. A ji ber van sebeban piranîya helbestên Simoyê Şemoda sirûşt (xwezayî, tebîyet) amedeye, ber ku ew xwezayî di hiş û sewda, mejûyê wîda, nava hest û hisên wîda gelekî kûr dexme, mor bibû. A ji ber vê yekê jî em helbestên Simoda yên ku ewî pêşkêşî xwezayê kirine, ne ku bi tenê wê xwezayê bi awakî kopîyakirî dibînin, weke xwezaya bê jîyan, bê ruh, lê wek ya, heger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, zêndî, giyanber, bi hest û his...

A di vî warîda rola xwe ya serekîn ne ku bi tenê şam û şuret, kemala wî ya helbestvanîyê dilîze, lê bêtir hest û hisên Simo, ruhîyeta wî ya nazik. Bê van hest û hisên nazik helbestvan nikare giyanê ber xwezayêda bîne û ewê weke tiştekî zêndî raxe ber çevan. Bi vî awayî, em dikarin bê şubhe bêjin, ku heyîna du faktora here giring pêwîste, ku mirov bibe eyînî helbestvan: ya yekemîn, kemal, şureta helbestvantîyê ya xwezayî ya ku bi wîra hatîye vê cîhanê û giyan, hest û hisên nazik. Piştî vê dikarin bêjin, ku her mirovek yê ku pirîhindikî mejûyê wî heye û xudanê hest û hisane anegorî wê jî xwezayê dibîne, lê ne her kese ku dikare wê dîtina xwe bi peyîvan, bi hevokan (cumlan) bi awakî usa bêje, ku xwendevanên wî jî wê xwezayê bi awakî zêndî, weke tiştekî giyan (ruh) li ber bibîne. Her bi tenê helbestvanên weke Simo bi kemal û xudanê hest û hisên nazik dikarin li ber xwendevanên xwe giyanê ber xwezayêda bînin, ewê bi wanra bidin axavtinê.

Me li jorê gotina Giyotê anî navê. Piştî van gotinên xwe em dikarin hêja bêjin, ku Simo cîkî boş û betal, badilhewa xwezayî nekirîye têma, babeta helbestên xwe ya serekîn. Simo di vî warîda jî eyînî mirov û eyînî helbestvane. Ew derheqa wan tiştanda dinivîse, çi ku bîra wîda, giyan, hest û hisên wîda kûr rûniştîye.

Simo evîndarê keça kurdane û bi pêra jî yê xwezayê, sirûştêye. Hilbet, xwezayî xweberî xwe tiştê hizkirinêye: bi pirrengîbûn, pirawazbûna xwe ya xweşik, lê çimkî Simo, weke jî helbestên wî yên evîndarîyê kivş dibe, ser keça kurd hema di nava wê xwezayêda bengî bûye û wê evîndarîyê zemanekî dirêj berdewam kirîye, loma evîna xwezayê jî dilê wîda pir şîrin û ezîze, nemaze, gava wergirtina

keça kurd reng û awazê sirûştê dane: weke bahara zozanên bilind kesk, sor û zer dike.

Carna Simo bi sivikayî behsa xwezayê û çîyayê Elegezê dike û piştra bi giranî ser xwaşikbûna wergirtin, cil û berg, xemla keç û bûkên kurdan yên weke kivş dibe, li berpala wî çîyayî radiweste.

Em boyî çi vê babeta poyêzîya Simo, vê têma berhemên wî datînin berîya babet, hemû têmayên poyêzîya helbestvan yên dine? Ji ber wê yekê, ku poyêzîya evîndarîyê di nava hemû babetên efirandinên Simo yên dinêda takêşiyê dike, em dikarin bêminet û bê şubhe bêjin, yê here serekîne. Bi jmarên xwe jî helbestên evîndarîyê nava helbestên wî yên dinêda yê here gelek, yê here pirjimarin. Min mexsûs jimartina helbestên şayîr gorî babetan di pirtûka wî ya „Dilê bengî„ di bi cî anî û awa gihîştim çi neticê. Jimara hemû helbestên vê berevokê ji 230-î derbaztir dibe, ji kîjanan payê pirê- 155 helbest yên evîndarîyêne. Vî warîda belkî kêm helbestvanên me hebin, yanê jî tune bin, ku piyê xwe bi Simora bavêjin. Em fakt û îzbatîke êndîrêkt yeke dinê ser vê yekê bînin navê. Simo badilhewa, bi tesedûfî sernavê „Dilê bengî„ danenîye ser vê pirtûka xwe. Bi rastî jî berhemên wê berevokê netica dilê bengîne. Gava em peyîva „evîndar„ û „evîndarî tînin ser zarê xwe yanê jî dibihên- bê hemdî xwe, berîya hemûşkî evîndarîya cinsî, zelaltir, ya ser qismî jin fem dikin, hilbet li ber hesêb girtina helbestên mêrekî, li vira- Simo. Lê gava gotin tê ser poyêzîya Simo ya evîndarîyê ez bi tenê evîndarîya cinsî nagrim ber hesêb, ya mêr û jina, keç û xorta. Simo wek helbestvan ne ku bi tenê evîndarê keça kurde, lê yê xwezayê, sirûştêye jî, ku bawera dilê wîda wek keça kurd sembola xweşikbûnêye. Ew xwezayî dilê Simoda ezîz û giranbahaye, ber ku ew hertim keça hizkirî di nava wê xwezayêda, bi taybetî nava zozanên çiyayên bilindda dibîne, li kîderê kurd bi zemanekî salewaxtê yê dirêj dihêwirin. Em her usa jî dikarin kivş bikin, ku Simoyê helbestvan, Simoyê xweyê hest û hisên nazik her usa bengîyê hemû tiştên xweşike, wan tiştan yên ku lezetê didin mirovan. Bi vê fikrê em dikarin Simo bi nav bikin wek bengîyê poyêzîyayê jî, çimkî ew bi

rastî jî wê poyêzîyayê hiz dike û heger usa nebûya ewî temamîya jîyana xwe ya femdarî pêşkêşî bi cîanîna berhemên wê poyêzîyayê nedikir. Evîndarîya hindava keça kurd, xwezayê û jîyana kurdan û qûrîna berxvan, golikvan, şivan û gavanan, şinge-şinga helebîyan(pezdoşan) û bêrîvanane li zozanên bilind. Hema evan yekan jî bûne stîmûl, defdankirên bi cîhatina karê Simo yê efirandinê weke şayîr. Lê helbestvan jî ji bin deyînê wan tiştan derdikeve bi mesrefkirina şureta pênûsa xwe ya berhemdarîyê ji bona nitirandin, neqişandin, xemilandina wan ya bêtir li ber çevan, ji bona pesinandina wan ne ku bi tenê bi hiş û sewdê xwe, kemala xwe ya helbestvanîyê, lê ya here mûhîm, hest û hisên xwe bi kar tîne, mesref dike.

Bawer bikî hemû helbestên Simo yên evîndarîyêda xwezayî amedeye. Em dikarin bê şubhe bêjin, ku bi vê govekê em pesinandina xwezayê bawer bikî bal tu helbestvanekî kurd yê dine nabînin (gotina me derheqa wan helbestvanadane yên ku li Sovyêtîstanê mane û efirandine). Lê ne axir hinek ji wan helbestvanan jî weke Simo û bera hinekî jî ji wî kêmtir zozanên çîyayên bilind, zome û konên kurmancîyêda mane, gerîyane û bi zemanekî ne kin. Usane, eva ne ku bi tenê ji wê yekê tê, ku Simo piranîya zemanê zarotî û xortanîya xwe li zozanan, zoman, nava xwezayêda bi cîanîye, lê bi serda jî bi awakî kûr dilê wî yê, heger em dikarin wa jî bêjin, yê helbestvanîyê, hest û hisên wî yên nazik, tenikda sirûştî cî stendîye. Heger em bi awakî dinê bêjin, xwezayî bi nexş û nîgarê xweva bêtir û kûrtir di nava hest û hisên nazikda cî distîne, mor dibe. Hemû kes nînin, yên helbestvan jî û yên ne helbestvan jî, ku dikarin weke Simo xwezayê bibînin. Belê, ne ku bi tenê xwezayê mêze bikin, lê binihêrin, her bi tenê bi çevên xwe li wê mêzekin, temaşe bikin, lê, weke aqilbendekî gotiyê, ewê bibînin. Weke dîsa min li cîkî xwendîye, nêrîn tişteke, lê dîtin tiştekî dinêye.Çawa em diêjin „dîtin„ ne ku bi tenê dîtina xwerû bi çevan digirin ber hesêb, lê her usa jî ya bi mejû, bi fikran, bi hestan. A ji ber vê yekêye, ku xwezayê bi awakî zêndî dîharbûna xwe nava poyêzîya Simoda

dîtiye, rasttir, xwezaya ku Simo helbestên xweda radixe ber çevan, distirê weke ruhberan, giyanberan zêndîye. Dema xwendevan helbestên Simo tîne ber çeva, xwendevan ne ku bi tenê reng û rûyê xwezayê dibîne, lê deng û hisê wê jî dibhê, dengê qirçîn û gimîna ewrên nîsanê yên reşe tarî bi birqvedana birûskê, dengê xuşşîn, lemelem û xule-xula avên cew û kanîyan û hetanî xişşîn û wîşşîna gul û gîha jî ya li ber bê.

Em hetanî vê tangê bi awakî tomerî, giştî ser poyêzîya Simo, naverok û babetên wê rawestîyan. Lê em virhada gotinên xwe ser analîzkirin, komêntarkirina helbestên şayîr bi meselên ji wan helbestan yên konkrêt temam bikin.

Piştî vê pêşgotina bin sernavê „Nirxandina poyêzîya Simoyê Şemo„ emê bi awakî konkrêt wê poyêzîyayê binirxînin gorî babetên wê poyêzîyayê û piştra hêja bi mîsalên konkrêt, bi analîzkirina helbestan gorî wan babetan. Ber vê yekê jî me berîya hemûşkî berhemên, Simoyê Şemo civandine ser hev gorî babetan, gorî têmatîka wan. Weke me li jorê îdî kivş kirîye, di nava poyêzîya Simoyê Şemoda ya evîndarîyê takêşîyê dike, ber wê yekê jî emê berîya hemûşka ser wê poyêzîya şayîr, analîzkirina wê rawestin û piştra hêja derbazî analîzkirina berhemên şayîr yên bi babet, têmayên dinê bin.

ANALÎZKİRİNA POYÊZÎYA SİMOYÊ ŞEMO YA EVÎNDARÎYÊ

Her çiqas jî Simo evîndarê xwezaya zozanên bilinde, xweşikbûna evîna dilê xwe (keça kurdan) jî dişibîne ya xwezayê, lê dîsa jî evîndarîya ser keça kurdan di nava poyêzîya wîda sertacîyê dike. Û ber vê yekê jî her çiqasî jî qusûr û kêmasî di nava xweşikbûna xwezayêda tunene, lê dîsa ji Simo xweşikbûna wê xwezayê dişibîne ya bûkeke rûbixêlî:

Elegezê, devê gêlî,
Xemil nola bûka xêlî,
Şû û zelal kanîke sar,
Bi saz û naz jorda tê xwar.

Şayîrê evîndar di çarîneke dinêda vê gotina xwe eşkeretir û zelaltir dike:

Çiqa bigrîm, dilê min dîsa dikene,
Gul û sosin temam kenê min-te ne,
Dinê zane, alem zane, bêyî hubê
Çîya û banî, zeng û zihar valane.

A bi vî awayî, Simo xwezayê bi çevên evîndarekî dibîne, evîna dilê xwe jî (keça kurdan) di nava xwezayêda dibîne. Her çiqasî jî Simo li vira evîndarîya cinsî ya ser keça kurdan jî ya ser xwezayê cuda dike, lê bi rastî ew evîndarê herduyane jî. Û carna xwendevan û belkî şayîr bi xwe jî bi dijwarî wan herdu evînên dila ji hev cuda kirîbin û ewên yekemîn (xwendevan) niha jî.

Evîna dilê Simo, weke me li jorê jî kivş kirîye, keça kurde. Şayîr bawer bikî hemû helbestên xwe yên evîndarîyêda vê yekê eşkere dike: carna bi awakî dîrekt, bi awakî eşkere, carna jî bi awakî êndîrêkt. Simo evîna dilê xwe bi cil û berg, bi xemila kurmancîyê dibîne û radixe ber çevan:

Elegezê xwe kir kirasê kubar,
Tê wergirtîye hezar awaz, kofîya xar,
Şer û şirik ser gerdenê jorda tên,
Wê bedewîyê, teyax nakim ezî bê çar.

Her çiqasî jî Simo beş, zemanê jîyana xwe yê dirêjtir û mezintir li gundan û nemaze li bajêr buhurand, lê tesîra dîtina xwezayê jî zarotîyêda ser dilê wî, ser hest û hisên wî bêtire.

Piştî zemanekî dirêj jî gava ew ji dîtina zozanên bilind hate qutkirinê, dîsa ji evîna dilê xwe nava xwezaya wan zozananda dibîne: ew bi fîzîkî, bi qirafet, li laşê xwe li bajêre, lê bi mitale, bi xîyalên xwe li zozanane:

Were, Esmer were,
Were, xemila zozana,
Were, xwera bîne
Bîna gul û rihana.

Ev xeteke vê çarîna Simo ya „Were, xemila zozana„ çi bêjî hêjatire, weke nimûna fikirandina şayîrtîyê ya eyînî û bilind. Her çiqasî jî zozan, xwezayî xweşikin û bi xweşikbûnê tu tişt û tu kes ser xwera nedîtine, le Simoyê evîndarê xweşikbûna keça kurdan wê dişibîne xemila wan zozanan. Rasttir Simo dixweze bêje, ku keça kurd xemilê dide zozanan.

Piştî qutbûna ji zozanan şûna dîtina wan gîyanê (ruhê) Simoda cî digire. Awa ew bi hizreteke çiqas mezin û kûr wan zozanan û evîna dilê xwe ji dûr va dibîne:

Kona danîye li zozana,
Hêşî dane hêşîya hev,
Şinge-şinga bêrîvana
Diçine bêrîyê dev bi ken.

Simo bi helbestên xwe yên evîndarîyê bêtir îzbat dike, ku eyînî şayîre, ber ku ji bona şayîrê eslî herî ezîz û pîroz evîna dil û evîndarî dihesibe. Ew weke gelek mirovên dine yên dilkevirî dû qazanckirina nav û dengê bilind, lê arzan, dû bi destxistina post (qulix), rutbê bilind û weke gelê me dibêje, hebûna dinyalikê ne ketîye. Rasttir, bilî evînê ji bona wî cîhan û jîyan, lezeteke dinê tune. Awa di nava vê helbesta wîda bi çi awayî temamîya motîva poyêzîya wî, temamîya mexseda jîyana wî dîhar dibe:

Gulek hate baxçê min,
Dilek hate baxçê min,
Bi milê naz- baharê,
Bahar hate baxçê min.

Baxçê minda gul vebû,
Baxçê minda dil vebû,
Ji bîna naz baharê,
Baxçe tije bilbil bûn.

Dil dilşa bû gulêra,
Bahar şa bû gulêra,
Ger gul, bahar bal min bin.
Malê dinê çî min ra?

Em weke îzbata bilindayî, temambûn û xasbûna hûnera poyêzîya Simo ya evîndarîyê nemaze di warê çêkirina dîdem, wêneyanda dikarin vê yekê jî kivş bikin: kê zozanên çîyayê Elegezê, zome û reşkonên kurmancîyê yên li berpalên wî çîyayî û bi temamî xwezaya wî çîyayî bi mêrg û çîmanên dora kanîyên avên sar û rexê cewkên bi xule-xula bi şev û bi roj nedîtine û hizret, kovana dîtina wandane, lê ji ber sebebên cuda-cuda nikarin hilkişin berpalên wî çîyayî bera helbestên Simoyê Şemo bixûnin.

Gava Celadet Bedirxanê mezin û hogirên wî li Sûrîyayê û Lîbananê destpêka salên 30-î yên sedsala 20-î çend jimarên rojnema kurdî ya „Rya teze„ û çend pirtûkên kurdî, ku li Yêrêvanê hatibûn weşandinê distînin, ku ronakbirên kurde li Ermenîstanê Hecîyê Cindî û Cerdoyê Gênco ji wanra bi rê kiribûn, ew kovara xwe ya „Hawar„-da bi vê mûnesebetê bi dilxweşîke mezin dinivîse:

„Ji rûpêlên wan (yên rojnema û pirtûkan- W.E.) yên teze û têr bîhna kulîlkên çîyayê Elegezê, bayê zozanên Serhedan dihat„. Xweş nivîsîye! Eynî tiştî em ji bona helbest, ji bona pirtûkên Simoyê Şemo dikarin bêjin.

kurdlib.online

Me li jorê derheqa hûnera Simo ya bilind, ya wêneçêkirinê, dîdemçêkirinêda kivş kir û niha jî derheqa wê yekêda got, ku bi helbestên xwe bilî li ber çevan raxistina xwezaya zozanan Simo bîn û boxza wan zozanên çîyayên bilindda xweş ber pozê (bêvlên) xwendewanên xwe dixe. Lê niha ser van gotinanda em dikarin vana jî bînin, vana jî zêde bikin: Simo bi helbestên xwe yên evîndarîyê tehsîra mezin ser hestên xwendevanan jî çê dike, ew bi çêkirina wêne, dîdemên xweşike bedew ne ku bi tenê tehsîra ser hestên xwe yên nazik, lê her wa, bi bawerîya min ya temam, ser xwendevanên xwejî çê dike. Kes nikare nekeve bin tehsîra van çarînan û ew jî weke xudanê wan- Simo xwe, evînên dilê xwe- keçên kurd û xwezayê nebîne. Awa ew çarîn, ku ji nimûnên poyêzîya kurdî bi temamî yên here xweş û başin: li vira xwendevan xwe şûna helbestvanda dibîne, rasttir, pir mereq dike, ku xwe di şûna wîda bibîne:

Ez hiz dikim çîyayên bilind,
Ku lêv raxin eşqêra,
Min veşêrin gîhên bilind,
Bilîze sur tûncikê ra.
Ez hiz dikim barana nûr,
Nerm bibare, ewr bê deng,
Tev jî pêra, ji min ne dûr,
Keskesora hezar reng.

Ez hiz dikim yar rex min be,
Av niqitke gulîya ra,
Ber baranê hê şîrin be,
Ramûsanê me hev ra.

Simo aşiq û maşoqê xwezayê, sirûşte, nexşên wêye û wan nexşa di pirosêsa çêbûna wanda dibîne, rasttir, guhêrandina nexşên xwezayê wek guhêrandina tiştekî zêndî, tiştekî giyanber (ruhber) dibîne. Ewî helbesta xwe ya bi sernavê „Bîna zevîyê başqeye„

temam pêşkêşî zevîya simildayî kirîye, lê dîsa jî evîna dilê xwe ya cinsî ji bîr nekirîye û wê yekê çarîneke wê helbestêda eşkere dike, ku wê helbestê careke din dixe bîra me ya ku me berîya vê analîz kir, tê qey bêjî ev çarina vê helbesta dawî ya helbesta berîya vêye. Simo hesten xwera amin dimîne, gava vê helbestê da jî herdu evînên dilê xwe- xwezayê û keça kurd bi hevra dibîne, gava gotina xwe tîne ser zevîya simildayî:

Hela binhêre çi reng xwe dike,
Wexta sibêra baran lê dike,
Ça qîza kezî rewşa dilara,
Av diniqite serê gulîyara.

Li vir jî Simo hostê çêkirina dîdeman, nexşa, sifeta ne. Ew simlên zevîyê, ku ber baranê û giranîya xwe kêr bûne, serberjêr bûne dişibîne gulîyên yarê, ku gava baran lê dike- serê wanra av diniqite. Belê, Simo bi çêkirina dîdem, sifet, wêneyên xweşikbûna xwezayê û keça kurd zelaltir, natûrêltir radixe ber çevan. Eve hunera eyînî şayîrtîyê.

Simoyê Şemo gelek helbestanda sifet, wêneyên xezayê yên xweşik çê dike, lê ew sifet, ew wêneyê ku ew çê dike weke yên ser caw yanê jî kaxez, ku wênekêşên ne temam û nemaze bê hest û his dineqişînin, bê ruh, bê giyan nînin, ew xweyîgîhanin, xweyî hest û hisin, tê qeyî bêjî ew weke mirov difikirin û xwendevan bê hemdî xwe hal, rewşa wanra digirîn, weke vê helbestê, ku bi sernavê „Sifetê çiyê„ hatîye efrandinê:

Ewr lev ketin,
Bê deng û his,
Çîyê bengzê xwe
guhêrî,
Tevê jor da
Bi tirse-tirs,
Dew û dozê nihêrî.

Golê gir kir
Pêlêd hûrik,
Mesî niq bû
Bin avê,
Mêrgê li hev xist
Bisk û şirik,
Bê fiq danî
Ser lêvê.

Berx û berxvan
Tevî hev bûn,
Mil kutane
Milê hev,
Çawa karwan
Emir hatin-çûn,
Nola sîyara
Tên peyî hev.

Hat derbaz bû
Ba û baran,
Tenê wir ma
Cîhê şil,
Ji hev qetîyan
Berx û berxvan
Cewê kire
Bịlebil.

Simo di vê helbesta xwe ya jêrinda bêtir weke wênekêşekî, dîdemçêkirekî kivş dibe û me xwendevanên xwe dike heyrana wê helbestê. Ji ber xweşikbûna wê helbestê bi temamî û sifet, wêneyên di wêda çêkirî emê ewê weke nimûş, mîsaleke wêneçêkirinê ya here baş bi giranî, bi piranîya xweva li vira bînin navê:

Qiravîya hûr nola morîyê qeytanî,
Nûr û zelal, rijîyaye ser şînkayê,
Zeraya xwe nola zêrê helyayî,
Tevê daye, lê xwe hela dernayê.

Çivîka çûk qişte-qişte ser kevir,
Hişyar dike dor-berê xwe, bûye dengbêj,
Lê gêlîda qûrîn, qûjîn, nola şêr,
Çemê dicû bi kêv çemekî pirbêj.

Hêdî-hêdî tevê selam da dinê,
Qeyî bê zenda zêrike zer dest pê kir-
Ewan morîyê rijîyayî ser şînkayê,
Beşera xweş hûrik-hûrik berev kir.

Em dikarin bêjin, Simoyê Şemo ne ku bi tenê kurdî baş zane, lê hergav bi kurdî difikire û carna, heger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, bi kurdîya xwerû, gelêrî. Awa du çarînên, ku wî pêşkêşî evîna bê bersiv kirîye. Wan dixûnî û tê qeyî bêjî ew ji nimûnên zargotina (folklore) kurdîne, ku bi kurdîya xwerû, bi kurdîya natûrel, gelêrî hatine efrandinê. Lê nivîsandina bi kurdîke wa xwerû, wa xweş, wa gelêrî qet jî karekî hêsa nine, weke hinek dikarin tecrûbe bikin. Bona nivîsandina bi kurdîya bi vî awayî şayîr gotî ne ku bi tenê kurdîya xwerû, kurdîya gelêrî baş zanibe, lê bi pêra jî hosta, pispor li hevdanîn û li hevanîna peyîva hevokên (cumlên) gelêrî, heger wekî mayîn bêjin, yê zargotinîyêbe. Ez vê yekê dibêjim, ber ku gelek caran dema xwendina berhemên pirosayîs yanê jî helbestvanê kurd, yên ku weke Simo carna bi zimanê gelêrî yê basît dinivîsin, hinek xwendevanan hew tirê, ku ew jî dikarin bi wî awayî binivîsin, çimkî dijwarîya bi cîanîna nivîsara usa texmîn nakin. Û gava, weke dibêjin, xwe bi nivîsandina bi ziman, bi awayê gelêrî dicêribînin hêja dibînin, ku nivîsandina bi wî awayî qet jî hêsa nîne, bi ser da jî pir dijware. Ewa ew çarînên Simo, ku me besa wan kir:

Zerî meşyane avê,
Ez çi bêjim dê-bavê?
Kerba dilê min davê,
Minra „belê„ kes navê.

Domama min çev reşe,
Rîya kanîyê hûr dimeşe
Ax, çev dît, dil dimaşe,
Dilik bûye belg-diweşe.

Awa nimûnek din ya ji poyêzîya evîndarîyê, ku têda Simo bi hûnera helbestvanîyê ya bilind hêz, zoraya evînê ya mezin radixe ber çevan, rasttir, wê yekê, ku hesta evîndarîyê ser hemû hestanra ne:

Ez û tu va rîya koçera biçûna,
Gul û gupik li rex meda vebûna,
Laqirdîyada, bi vîtîna çivîka
Nerm hatina berbangê em şa bûna.

Hêvirza çem dûrva li me peyda bûya,
Sura mêrgê berbangêra me ta bûya,
Unda bûna nav hubêda ez û tu,
Me bîrkira, çika herdu diçin ku.

Di vê helbesta Simoda tiştekî surî, çêkirî tune, ew derheqa wê rêwîtîya xwe û evîna dilê xwe bi wî awayî dinivîse, ku tu şubhê himberî rastbûn, rêalbûna wê rewîtîyêda namîne, ber ku hemû gotin di şûna xwe dane, ber ku ew jî bîr nake guhêrandina reng û rûyê xwezayê jî nava heyam, nava zemanê roj û şevêda raxe ber çevan. Helbestvan bi xiyalîbe jî, lê wê rêwîtîyê dijî weke tiştekî bi rastî bi cîhatî. Ew wê rêwîtîya bi tevî evîna dilê xwe ya bi x îyalî dijî: hetanî kûraya dil û hestên xwe û ji ber wê yekê jî ew bîr nake, ku berbanga sibê nemaze li zozanan mehên havînê yên here germ jî sura sar tê

û ber wê yekê jî ew dinivîse: „...Sura mêrgê berbangêra me tabiya„.

A ji ber vê hunera bilind û rastgotina helbestvan, rasttir, ji ber wê yekê, ku Simo derheqa tiştên pirîzma giyan û hesten xwera derbazkirîra dinivîse, xwendevan ji gotin, dîtin û tecrûbekirinên wî bawer dikin û, ya here muhîm, bi giranî ji ber vê yekê jî poyêzîya wî hiz dikin. Ne axir helbestvan bi hûnera xwe ya helbestvanîyê ya bilind, bi wê yekê, ku helbestên xwe gorî hest û hisên xwe dinivîsene ku bi tenê bawerîya xwendevanan hindava gotinên xweda çê dike, lê bi serda jî wan xwendevanan dixe şûna xwe û ew weke wî dikewgirin, weke wî şa dibin, weke wî lezetê ji evîna dilê xwe dibînin. A ji ber vê yekê jî ew ji Simoyê Şemo yê helbestvan û ji poyêzîya wî ya evîndarîyê hiz dikin.

Weke şayîrê xudanê hûnera helbestvanîyê ya bilind û gorî wê jî tecrûbekirinên bi cî û war, gorî evê jî dîharkirinên nû nava hûnera helbestvanîyêda jî Simo jî yalê xwendevananda wek şayîr tê hizkirinê. Çiqasî bi cî û war ew derheqa tehsîra evîndarîyêda ser hiş û sewda, hest û hisên mirovan dinivîse. Vî warîda ew şayîrekî kurd yê îstîsnaye.

Awa dîtin, dîharkirineke nû nava helbestvanîya kurdîda û belkî nava temamîya helbestvanîya cîhanêda, ku Simoyê Şemo di wê helbesta xwe ya jorinda eyan kirîye, raxistîye ber çevan. Şayîr xwezîya xwe bi wê yekê tîne, ku ew û evîna dilê xwe rojekê bi tevayî bibûna rêwîyê serê çîya koçera û dema bi cîanîna wê rêwîtîya xîyalî:

Unda bûna nav hubêda ez û tu,
Me bîrkira, çika herdu diçin ku.

Belê, dîharkirineke pir xweş û baş, dîharkirineke pir balkêş nava hunera helbestvanîyêda. Eva jî sebebekî wê yekêye, ku Simo ji alîyê xwendevanada haqasî hatîye û tê hizkirinê.

Simoyê Şemoyî helbestvan, weke ji heyîna barxaneke poyêzîya

wî ya evîndarîyê kivş dibe, evîndare û weke ji gelek helbestên wî kivş dibe, evîndarîya wî bê bersiv maye, yanê: destê wî negihîştîye evîna dilê wî, rasttir, îmkan çê nebûne yanê jî keçikê bi xwe nehîştîye, ku ew bi wê şa bibe, ji wê hiz bike, heger em bi cûrê gelêrî bêjin, keçika evîna dilê wî xwe nedaye destê wî. Û ji ber vê yekê jî evîndarê dilşewatî dilbirîn bi xîyalî bi evîna dilê xwe şa dibe, demên hizkirinê yên xweş bi wêra çê dike û derbaz dike: dîsa bi xîyalî. Ew bi kovan, bi hizreta kûr dike gazî.

Bera bibime gul û gîha,
Li ber pê te ez şîn bim,
Bera bibime kanîya li çîya,
Li ser lêvê te tî bim.

Bera bibime sura nazik,
Gulîyê tera ez tabim,
Bi wan biskê te tiberik,
Serê lêva ez şa bim.

Bera bibime sîngê zinêr,
Germa nîvro tu bêyî ber,
Bişkoka te wir biqete,
Ez ramûsim sîngê te.

Lê bi vê helbestê jî dilê Simo rehet nabe. Ew helbesteke dinêda ya bi sernavê „Gelo hebûya„ xewnerojeke xweş dibîne, gava ji wîra li hev tê evîna dilê xwe bîne konê mala bavê xwe.

Gelo hebûya,
Ewir bela bûya,
Çîya xwekira
Sor û mor,
Keleş gewram

kurdlib.online

Mala bavê
Biçûya berbi
Kanîya jor.

Ezê pêxas,
Piştevala
Biçûma berbi
Bextê xwe.
Bi lavaya,
Can-heyrana,
Minê banîya
Konê xwe.

Û ber pê wê,
Çawa qurban
Minê danîya
Berxa kur,
Dibe qurban
Qebûl bibûya,
Vêsîya kûra
Huba gur.

Simo em – xwendevan bi xwera bi kêfxweşî û eşq birin zozanên çîyayên, bilind. Lê weke dawîya her tiştî heye dawîya mayîna li zozanan jî . Vê carê bi dilekî şikestî, bi xemgînî Simo ji zozanan hate xwarê û em jî bi xwera anîn, ber ku ewî helbest pêşkêşî dagêra xwe ya ji zozanan jî kirîye. Di wanda şayîr bi kovan, bi hizret zozana bîr tine:

Xwezila niha çîyê bûma,
Li rex kanîya zinêrda,
Qasekê rex razama,
Min bidîta xewnêda:

Êla meye pir giran,
Konê meye kurmancî,
Hêsî dane hêşiya hev,
Li zozanêd bilindcî.

Di nava cêrga helbestên Simoda, ku pêşkêşî xwezayê kirine, pir balkêşe helbesta bi sernavê „Gazîya kanîya çîyê„. Di wêda şayîr ne ku bi tenê giyan (ruh) ber xwezaya bê giyada, li vira ber kanîyêda tîne, lê bi serda ji ewê weke mirov dide fikirandinê, kêlimandin- axavtinê. Simo li vira awayê, hûnera alêgorîyayê bi kar tîne: ew kanîyê dixe şûna xwe yanê jî em dikarin her usa jî bêjin, xwe dixe şûna kanîyê.Çi jî hebe, ew bi „zar-zimanê„ kanîyê hest û hisên xwe dîhar dike, hest û hisên ku ji ber rewşa kanîyê, rasttir, ya xwe ya moralî ya giran, ya êş û jana ji ber tenêmayînê çê bûne.

Weke bi lojîkî kivş dibe (bin helbestêda zemanê nivîsandina wê nehatîye eyankirinê) ev helbest Simo salên jîyana xwe yên dawî efirandîye, gava îdî ji ber temenê mezin hew karibûye here zozanên bilind. Lê ew bi xiyalî xwe dibe wira ji ber hizret, kovana zozanên bilind û rûniştevanên wan û şûna kanîyê xwe li wir (zozanan) datîne, şûna kanîya bi tenê mayî, ber ku wî zemanîda îdî zozanvanên kurd pir kêm, diçûn zozanan û ji ber wê yekê dilê helbestvan kûr dijene, dêşe, ji ber valamayîna zozanan, vê helbestêda, weke me got, tenêmayîna kanîya li çîyê. Weke dîsa me got, Simo zar-ziman ber kanîya çîyêda tîne ya ku bi ax û kovaneke kûr dike hewar û gazî:

Kanên, kanên, kuda çûn
Ew hêwirze, ew ringîn?
Nola xewnê derbaz bûn
Bahara geş û havîn.

Tenê mame zozana,
Sexîr, wehîd û gune,

Bi kakîna berxvana,
Pirsîyarkî jî- kes tune.

Huba xweye ker, bê surr,
Domam nayê- dil vêxe,
Bisk û gulîyê lal û durr,
Kes ser mida danaxe.

Çîya û gelî ça neyar,
Min dinhêrin hêrs û rik,
Îdî nabime çawa şedê
Şevê huba tuberk.

Gava van çarînên helbesta Simo dixûnî ji bona tenêmayîna kanîya bê giyan haqasî xemgîn dibî, ku weke dibêjin, gunê kafira li mirov tê. A eve hêza hûnera helbestvanîyê, bedewnivîsarê ya bilind, ya hêza hûnera bilind nava wê yekê dane (li vira di vê helbesta Simoda), ku xwendevan demekê jî bîr dike, ku kanî bê giyane û nikare bikeve rewşa moralîyê ya giran.

Îzbateke wê yeke, ku Simo xwe û rewşa xwe ya moralî danîye şûna kanîyê û rewşa wê jîyana Simo bi xweye nava salên jîyana wî yên dawîda, derheqa kîjanêda me îdî xwendevanên xwera gotîye.

Simo bengî û sewdaserê zozanên bilinde, ber ku, weke me li cîkî jî kivş kir, li wan zozanan ewî evîna dilê xwe ya dinê- keça kurd dîtiye û hebandîye. Piştî, ku Simo ji ber temenê mezin hew dikare here zozanên bilind ew bi ax û kovaneke kûr derheqa wan evînên dilê xweda dinivîse, ku ji ber sebebê nebaşbûna tundurustîyê ew unda kirine. Û ev undakirin çiqasî giran ser giyan, hest û hisên helbestvan rûdinên. Her bi tenê helbestvanekî weke Simo dikare bi hûnera xwe temamîya wê giranîyê li xwendevanên xwe jî bide hisandinê û wana jî weke xwe kerbûyî, danavî bike. Awa çarîneke helbesta şayîr ya bi sernavê „Ser kanîyê„:

Dilê me li wir man,
Gulê me li wir man,
Lê ew hub, ew ricaf,
Gelo ka, li ku man?

Simoyê Şemo helbestên xweda bi peyîvên vik û vala nagirî, lê wan helbestên bi hest û hisên helal û zelal, bi hizret û kovan dagirtî me- xwendevanên xwe tîne halê girî, belkî bê deng, lê dide giryandinê. Gotî dilê mirov kevir be, ku ji ber xwendina vê helbesta li xwarê çêkirî ji êş û jana berxweketinê, xemgînîyê tîş-tîşî nebe, neperise. Her çiqasî jî Simo heyfa xwe bona rojên xweşe buhurî yên ku wî dîtine, tîne, lê ew dilê wan xwendevanên xwe jî dêşîne yên ku ew jîyan nedîtine...

Zarotîya min û teva
Deraz bû van mêrg, wara,
Emirê me bû xewnek çû,
Nola gula bahara.

Barê sala pişta me
Em tev fesal diçin ker,
Bangîn dikin Xwedê xwe
Rîya me bike rast û ger.

Çimkî rîya kesir em
Naqedînin, nikarin,
Sal me barin, ne ku em
Kal û pîrê bêçarin.

POYÊZÎYA SİMOYÊ ŞEMO YA WELATEVÎNTÎYÊ

Berîya em konkrêt kese (dîrekt) ser analîzkirina poyêzîya Simoyê Şemo ya welatevîntîyê rawestin- pêwîst dibînin zelalîkê bixin nava wê yekê, kanê gava gotin tê ser vê babeta poyêzîya kurdên Sovyêtîstana berê bi giştî û hilbet, li vê tangê poyêzîya Simoyê Şemo ya eyînî babetê bi taybetî em gotî çi faktorê bigrin ber hesêb, ber ku heger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, taybetmendî, xisûsîyateke vê poyêzîya kurdî ya welatevîntîyê hebûye hetanî zemanekî kivş. Û ji ber vê yekê jî, bê zelalkirina wê tayîbetmendîyê, wê xisûsîyetê em nikarin bi temamî, tam ji naveroka wê poyêzîyayê fem bikin.

Gava em berhemên helbestvan û pirosayîsên kurd dixûnin, yên ku li Sovyêtîstana berê (hilbet, gava em dibêjin Sovyêtîstan bona edebîyeta kurdî bi sebebên femdarî Ermenîstanê digrin ber hesêb) zemanê desthilat, rêvebirîya Stalînda hatine efirandinê- dibînin, ku di wanda qet carekê jî navê Kurdistanê bi giştî, bi temamî û wek welatê wan nivîskarên kurd derbaz nabe, nayê kivşkirinê. Em îdî derheqa wê yekêda nabêjin û Kurdistan qet berhemeke wanda nebûye, heger em dikarin bi vî awayî bêjin, çevkanîya poyêzîya welatevîntîyê. Sebebê vê yekê yê bingehîn ew motîvên polîtîkî bûn, yên ku dewleta Sovyêtîyê di wî zemanê kivşkirîda himberî kurdan û Kurdistanê dimeşandin. Welatê kurdên Sovyêtstanê (Ermenîstan jî bi pêra) yê eslî, yê bav û kalan, yê dîrokî dervayî sînorên wê Sovyêtstanê bû bi navê Kurdistana êtnîkî, ber ku her çiqasî jî bi dehan mîlîyonan kurd kevnarda li ser axa xwe bi awakî kompakt, ser hev diman, lê bi sebebên cuda-cuda hela hê dewleteke xwe ya serbixwe seranserî Kurdistanê çê nekiribûn. Lê dewleta Sovyêtîyê hêna Stalînda bi motîvên polîtîkî anîna ser zar yanê jî nivîsandina navê vê Kurdistana êtnîkî ji dabû qedexekirinê, ku bi giranî Tirkîya cînar aciz neke, ji xwe nede xeyîdandinê ya ku piranîya erdê Kurdistanê dagir kiribû, bi serda jî heyîna gelê kurd û Kurdistan înkar dikir. Bi serda jî hêna Stalînda wezîrê Sovyêtistanê yê karên derva

Molotov zemanê Şerê Cîhanî yê yekemînda dîsa bi motîvên polîtîkî tevgera kurdî ya Azadîxwezîyê bi nav kir weke ya fêodalî (dêrêbêyîtiyê) û ajanî (yanê: ajanê dewletên Rojavayê yên mezin, ku Sovyêtistanê weke dijminên xwe didît). A di nava van qewl û şertanda qet ne mûmkûn bû, ku helbestvanên kurd yên Sovyêtistanê ne ku bi tenê Kurdistan bihesibandana welatê xwe, lê bi serda jî pesnê wê û gelê kurd, nemaze Tevgera Azadîxwezîya kurd bidana, ew biparastana, ku li wir (Kurdistanê) dihat bi cîanînê. Dewleta Sovyêtîyê zemanê kivşkirîda himberî gelê kurd û Kurdistanê motîveke polîtîkî ya dine jî bi kar tanî, ew yek, ku Kurdistan welatê ne ji sîstêma sosîalîstîyê bû, yanê ne dost û yekdesta Yekîtîya Sovyêtîyê bû bi sîstêma xwe ya polîtîkî.

Piştî haqasî her bi tenê dima, ku kurdên Sovyêtistanê (Ermenîstan jî pê ra) yên ku weke hindikaya êtnîkî li vî welatî diman bi tenê wê Sovyêtstanê bi giştî û komarên wî welatî yên dine, li kîderê ew diman, wek welatê xwe bibînin, wek welatekî usa yê ku, gorî îdîolojîya komûnîstîyê, bextewarî, xwaşbextî gel û welatên xwera anîye û di nava wanda kurdên xwera jî. Û ji ber vê yekê jî heqê helbestvanên kurdên Ermenîstanê hebû her bi tenê Sovyêtstanê û Ermenîstanê jî bi pêra weke welatê xwe bibînin û pesnê wan bidin.

Hilbet, hetanî warekî weke rûniştevanên Sovyêtistanê bi temamî û yê Ermenîstanê bi taybetî heqê kurdên wir yê moralî hebû van welatan jî weke yê xwe bibînin û nemaze ji bona çêkirina qewl û şertên qenc yen pêşxistina edebîyet û çanda kurdî pesnê wan jî bidin, lê welatê eslî bona van kurdan Kurdistan bû, ber ku qalinaya gelê kurd jî, erdê wî jî li wir bû.

Nêrînên çewit û zîyandar ser gelê kurd û Kurdistanê li Sovyêtistanê hatin rakirinê piştî mirina Stalîn û nemaze piştî bi cîhatina mîsîyona Barzanîyê Nemir û serhildana wî ya nava kurdên Ermenîstanê sala 1956-a. Barzanîyê Nemir gihîşt wê destkevtinê, gava hêna serokê Sovyêtistanê yê nû Nîkîta Xrûşovda wê dewletê bi awakî eşkere, destûr da, ku kurdên Sovyêtîyê Kurdistanê weke welatê xwe yê bav û kalan, yê dîrokî û xwe jî weke beşeke gelê

Kurdistanê yê kurd bibînin û bi serda jî bi parastina mafê gelê xwe û Tevgera Azadîxwezîya wî xwe bihesibînin. Bese em ji bona îzbatkirina vê gotina xwe nota û beyannemên hukumeta Sovyêtîyê bîr bînin, bi kîjanan ewê hukumatê destpêka salên 60-î yên sedsala 20-î, gava rêjîma Îraqê li kurdan hate xezebê têkoşîna kurdên Kurdistana Başûr dijî zor û zulma wê rêjîmê parast û bi serda jî destûr û rê da kurdên Ermenîstanê, ku ew bi medîyayê (pirêsayê) wê têkoşîna xûşk û birên xwe ne ku bi tenê li wê beşa Kurdistanê, lê li tevaya welatê kurdan biparêzin. Eva eşkere dihat wê watê, ku kurdên Sovyêtistanê destûr stendin xwe weke beşeke gelê kurd yê pirmîlîyonê bibînin û Kurdistanê jî- weke welatê xwe naskin. Eva guhêrandineke bingehîn, pozîtîv û nebînayî bû nava sîyasetîya Yekîtîya Sovyêtîyê ya zemandirêjda, ku ewê himberî gelê kurd û Kurdistanê, Tevgera Azadîxwezîya kurd dimeşand. Evê guhêrandinê destûr û rê da şayîrên kurde li Sovyêtistanê jî yên weke Simoyê Şemo, ku ewana helbestên bi hizkirin û kovaneke bê hed û hesab dagirtî ji bo welat û gelê xwe bisêwirînin û bidin weşandinê.

Me li jorê kivş kir, ku heqê şayîrên kurd yên weke Simoyê Şemo yen li Sovyêtistanê, li Ermenîstanê hetanî warekî jî hebû vana bihesibînin wek welatê xwe, ber ku çevên xwe li vê cîhanê vekiribûnvenekiribûn ev welat dîtibûn û di nava wanda beşeke gelê xwe yê kurd, ku li hinek nawçên Komara Ermenîstanê kompakt (ser hev) di gundên xwerû kurdîda jî diman. Hemîn li zozanên vê komarê yên çîyayên bilind bawerkî hemûşk kurd bûn bi kon, çadir-xêbet, bi zomên xwe. Bi serda jî nava zemanekî kivşda, nemaze gava destê Simoyê Şemo qelema şayîrtîyê girt, li Ermenîstanê hilperîna çanda kurdîye mezin çê bû: bi saya alîkarîya dewleta Sovyêtîyê, piştgirîya ermenîyê dilsoz, nemaze ronakbîrên Ermenîya, ku ji wana gelek bi xwe jî ketin xizmeta edebîyet û çanda kurdî. A ji ber van sebeban qet jî tiştekî xerîb û metelmayînê nîne, ku Simoyê Şemo û hogirên wî yên kurd helbest avîtin ser welatê Sovyêtîyê, ser Ermenîstanê û ew weke welatê xwe dîtin. Şayîrê kurd- Simo helbesteke xweş avîtîye ser Ermenîstanê û hema di destpêka wêda wa gotîye:

Wetenê min, tu ewqas çûk,
Tu ewqas çûk, ewqas mezin,
Tu dureke weke neynûk,
Şax û şuret te dibezin.

Vê helbestêda weke hemû şayîrê Sovyêtstanê yên dinê Simoyê Şemo şûna peyîva kurdî ya „Welat„ ya bi tirkî- „weten„ bi kar tîne, ber ku me piranîya ronakbîrên kurd yên Ermenîstanê zimanê tirkî nizanibû û me hew tirê „weten„ peyîva kurdîye:

Ka şayîrê zemanê xwaş,
Tera layîq gula rokê,
Binitirîne awazê naz,
Hezar nexşî bejna teke.

Weke Simo ronakbirên kurd yên dinê jî, ku li Ermenîstanê diman ew dihesibandin welatê xwe yê duyemîn. Lê çiqasî jî hebe, bawera dilê her welatevînekîda tu welatekî dinê tayê welatê eslî dernakeve. Her çiqasî jî Simoyê Şemo welatê bav û kalan nedîtibû, lê ew bi hestên xwe yên lawê helal, yên nazik, bi giyanê xwe yê kurdîtîyê ew didît û bi wê yekê dihesîya:

Avê çema tên û diçin,
Çî minrane beyta wan,
Hezar, hezar cinet hebin,
Minra nabin Kurdistan.

Lê ev Kurdistan jî dûrî şayîre û bi serda jî ne azade. Bindestîya welêt û gel taybetîyê nadin welatevînê bi şewat. Lê şûna li ber vê bindestîyê feqîr û êxsîr, belengaz û stûxwarbe Simoyê Şemo bi hêvîya serkevtina têkoşîna gelê xwe digîre:

Çil mîlîyonin em,
Lê tirîlyonin em,
Em nayêne rayê,
Çîya, çîyayê me ne,
Çem, çemê me ne,
Heta hetayê.

Balkêşe, ku Simoyê Şemo welatê xwe yê eslî, yê dîrokî, yê bav û kalan bi nav dike wek evîneke dilê xwe û sernavê helbesteke xwe ya ji poyêzîya xwe ya welatevîntîyê hema bi wî awayî jî bi nav kirîye:

„Evîna dilê min„.

Dilê helbestvanê welatevîn ji ber wê yekê dêşe, ew ji ber wê yekê dikewgire ku dijminên dagirkir welatê wî navbera hevda parparî kirine.

Hezar parî,
Hezar warî,
Bê starî
Kurdistan,
Ker dinalî,
Ker dikalî
Dilê xweda
Bê guman.

(Ev peyîva dawî ya „guman„ kurdên Sovyêtistanê, belkî beşeke yên Serhedê jî şûna peyîva „hêwî„ bi kar tînin. Nava helbestên xweda ewê peyîvê Simoyê Şemo jî bi vî rengî kar tîne).

Li ber vê rewşa welatê xwe ya giran û dijwar Simoyê xweşbîn û optîmîst qet jî hêvîbir nabe. Welatevîn nava vê tarîstana giranra, ku li ser welatê wî rawestîyaye û çok daye, ew siba welatê xwe ya ronik, geş û xweş dibîne. Berdewama vê helbesta xweda ew bi bawerî dibêje:

Lê rojê bê,
Li rû dinê,
Tê gul vedî
Ça cinet,
Çawa dilek
Tê bibî yek,
Bijî bê xem,
Bê minet.

Belê, himberî çêbûna Kurdistaneke azad û serbixwe nava pêşerojêda tu şik û şubhe dilê helbestvanê welatevînda tune, her bi tenê ew ji tiştekî xofê dikişîne û ditirse, kîjanê di nava helbesteke xweda eşkere dike:

Lê tirs ewe,
Minra sawe
Wê rojê ez
Nebînim.
Ezî kalim,
Va şêst salim,
Ez xwe pêra
Nagihînim.

Sed heyf, ku ev tecrûbekirina Simo weke ya pêxemberekî bi cî hat: Simo ne ku bi tenê Kurdistaneke yekgirtî, azad û serbixwe nedît, weke ew yek her wa di xîyala wîda bû, lê ev Herêma Kurdistanê ya fêdêral jî, ku piştî mirina wî li ser beşeke axa Kurdistana Başûr weke hema-hema dewletekê çê bûye.

Poyêzîya Simoyê Şemo ya welatevîntîyê ji ber jîyana gelê helbestvan, rewşa wî gelî û Kurdistanê ya rêal çê bûye, bingeha wê poyêzîyayê jîyan û bûyerên rêal û konkrêtin. Û gorî wê jî Simo konkrêt difikire, rasttir dibe em bêjin, ew helbestên xwe yen welatevînîyêda ser pirs û pirsgirêkên jîyana gel û welatê xwe yên konkrêt

radiweste yên ku heger jîyana xwe zemanekî dirêj berdewam bikin wê bibin sebebê çêbûna rewşeke giran. A ji wan pirsgirêkan yek jî ya asîmîlebûn, bişavtîna gele. Weke helbestvan, ronakbirekî dûrebîn Simoyê Şemo asîmîlebûna gel weke tehlîkeke mezin, giran, biqezîya dibîne. Asîmîlebûn (helandin) îro çi li Kurdistanê bi xwe û çi li beşên dîyaspora kurdî weke bizûzê ketîye nava gelê me û ne ku bi tenê goşt, lê hestûyê wî jî dirizîne, dixwe. Lê heger li Kurdistanê bi xwe asîmîlekirina, ku dagirkir dibistananda bi cî tînin, haqasî bi tehlîke nine, çimkî (bo wê yekê) li wira bi mîlîyonan kurd kompakt dimînin, lê li beşên dîyaspora kurdî yên cuda-cuda û nava wê jimarêda yên li Yekîtîya Sovyêtîyê, her çiqasî jî li wir bi giranî asîmîlekirina bi destî zorê bawer bikî tune, lê ji ber kêmjimarîya olkên kurdan yên weke oazîsan bela-belayî asîmîlebûn xwe berî xwe jî dimeşe û nava zemanekî ne pir dirêjda dikare bigihîne encamên here xirab û giran. A ji ber vê yekêye, ku Simoyê xemkêşê parastina milet di helbesta xweda ya bi sernavê „Werin em nekin„ bangî miletîyên xwe dike û bi heyîdade wanra dibêje:

Werin, em nekin,
Em şêlû nekin
Kanîyê Enzelî.
Malê xwe bidin,
Serê xwe bidin,
Lê zimanê xwe,
Erf-Edetê xwe
Em tucar nedin.

Belê, Simo van atrîbûtan, ku milet bi wana hev digire, ji wana pêk tê bona heyîn û berdewambûna milet haqas mûhîm dibîne, ku bi cûrê gelêrî bang dike- serê xwe bidin oxira parastina wan, ku li hesabê dawî parastina milete.

Simoyê Şemo welatevîntîyê weke berpirsîyarîke xwe ya konkrêt dibîne. Hê di sala 1961-ê da ewî helbesteke xwe ya welatevînîyê ya

xweş û naverokdagirtî berevoka efirandinên xwe ya yekemînda, ku bi sernavê „Nûr„ li Yêrêvanê hate weşandinê, bi cî kiribû. Sernavê wê helbestê şayîr danîbû „Gelê minra„. A di vê helbestêda helbestvanê ku nû diket govenda helbestvana ya îdî giran xizmetkirina hindava gelê xweda wek nîşan û naveroka temamîya jîyana xwe ya efirandinê didît. Û ya here mûhîm, ya ku hemûşka bêtir rûmetê ji bona şayîrê gorbuhuşt qazanc dike ewe, ku ew hetanî dawîya wê jîyana xwe wê helbest û pirînsîpa xwera, vê lêyîtmotîveke temamîya poyêzîya xwera tu demekê û tu zere û misqalekê xiyanet nekir, rasttir, hetanî wê dawîyê ji xizmeta gel derneket. Şedetî û îzbatî vê yekêne ku bi tenê helbestên Simo yên welatevîntîyêne, lê temamîya kar û barê wî bû weke ronakbîrekî kurd, weke doxtirekî kurd yê bi nav û deng û weke rûniştevanekî Ermenîstanê yê kurd yê basît jî.

OPTÎMÎZM Û PÊSÎMÎZM NAVA POYÊZÎYA SİMOYÊ ŞEMO DA.

SEBEBÊN ÇÊBÛNA WAN

Weke me beş û paragirafên vê pirtûka xwe yên cuda-cudada kivş kirîye, Simoyê Şemo weke mirov xweşbîn, optîmîst bû û evê karaktêrê dîharbûna xwe çiqas bêjî di nava poyêzîya wîda dîtîye. Ber vê yekê jî em dikarin bêjin, ku Simo weke helbestvan jî optîmîste. Û ew xweşbîntî, optîmîstî nava temamîya poyêzîya wîda sertacîyê dike, hetanî ya evîndarîyê û welatparêzîyêda jî, ku bal beşeke helbestvanên kurd wek not, awazên hêvîbirîyê pêsîmîstîyê jî dîharbûna xwe dibînin ji ber heyîna evîna bê bersiv û qedera gelê wan ya dîrokî û hemdem ya pir gran. Lê hetanî helbestên Simo yên poyêzîya welatevîntîyêda jî tu nota, awazên hêvîbirîyê, pêsîmîstîyê nabînî, gava nava vê qederêda sebebê çêbûna hêvîbirîyê çiqas bêjî hene.

Emê destpêkê vê beşa pirtûka xweda ser poyêzîya Simo ya xweşbînîyê bi xisûsî, bi taybetî rawestin, ber ku, bawer bikî, temamîya poyêzîya wî ya xweşbînîyê, optîmîstîyêye û em ji ber wê yekê dibêjin mexsûs, bi taybetî, ber ku zemanê jîyana wî yê dawîda helbestên bi awaz û naveroka hêvîbirîyê, pêsîmîstîyê jî bal wî peyîda bûn û ji bona rast û heralî nirxandina wan emê li vira helbestên bi awaz û notên bi temamî, xwerû optîmîstî analîz bikin û sebebên wê optîmîzma şayîr bigiştî û kurtayî eşkere bikin. Emê vî hemûşkî bi cî bînin bi berhevdanîna van herdu awaz, meqamên poyêzîya wî, ber ku ev berhevdanînê zelaltir eşkere bike sebebê çêbûna poyêzîya şayîr ya bi awazên pêsîmîstîyê, çimkî ew yek, weke emê bibînin, mûhîme ji ber kûr-kûr dîtin û bi her alî nirxandina karaktêrê Simo yê mirovatîyê, mirovhizîyê yê hêja û bilind, yê layîqî pesinandin û rûmetgirtinê. Belê, bê bi cîanîna vê yekê nirxandina poyêzîya wî, karaktêrê wî bi temamî, wê nivîşkanbe. Min ku weke 40 salan hogirtîke xweş û nêzîk bi Simora kir, ez jî hetanî zemanekî kivş yê nêzîkî wefatkirina wî baş û bi temamî haj karaktêrê wî nîbûm. Belkî nivîskarê rûs yê mezin L. Tolstoyî badilhewa negotîye, ku bona mirovekî,karaktêrê wî bi temamî nas bikî tu gotî weke nîv sedsalî bi wîra hogirtîya nêzîk bikî.

Me li jorê got, ku optimism nava poyêzîya Simoda sertacîyê dike. Eva gotina me bi awakî êndîrêkt tê wê watê jî, ku di nava poyêzîya wîda notên pêsîmîstîyê jî bi xwe didin hesandinê, ber ku Simoyê xudanê hesten nazik, yê eyînî helbestvan nikaribû her wa, bi dayîmî nava poyêzîya xweda jî optimist bima, ber ku sebebên çêbûna awazên pêsîmîstîyê di nava poyêzîya wîda çiqas bêjî hebûn. Lê sebebên çêbûna notên optîmîstîyê nava poyêzîya wîda bêtir bûn hetanî zemanekî kivş. Piştî wî zemanî ne ku bi tenê şûna optîmîzmê nava poyêzîya Simoda pêsîmîzmê sertacî, takêşî kir, lê bi serda jî ew alîyê moralîda bi carekêra şikest. Û ber ku wê pêsîmîzmê û şikestina moralî dîharbûna xwe di nava poyêzîya Simoda jî bi awakî kivş dîtin, em nikarin rex vê faktorê, vê îzbatîyêra bêdeng bibuhurin û bi giranî sebebên çêbûna pêsîmîzmê nava poyêzîya helbestvanda ranexin ber çevan û nenirxînin, heger em dixwezin temamîya poyêzîya wî binirxînin.

Me got, ku awazên xweşbînîyê, optîmîzmê nava temamîya poyêzîya Simora derbaz dibin, yanê: di wê poyêzîyayêda sertacîyê dikin. Me rûpêlên lêkolîna xwe yên buhurîda, her çiqasî goveka vê pirtûka me ya weke hemû pirtûkên dine sînorkirî îmkan da, besa wan helbestên Simo kirin. Lê niha emê besa wan helbesta bikin, di kîjananda mexsûs û konkrêt Simo hinek sebebên optîmîzma nava poyêzîya xweda eşkere dike, bi serda jî helbestên optîmîstîyê, şabûnê bi nav dike weke kilam, stran û xwe jî weke dengbêj, stranbêj: Ewî helbesteke xwe hema bi wê wateyê bi nav kirîye: „De ware nestirê„:

Guhê minda beyta kanîyê,
Dilê minda eşqa bilbil,
Elegezê şa û şênîyê,-
Were nestirê kilama dil.
Herçar yalî ken û şabûn,
Ringe-ringa def û saze,
Gul û gupik tev bengî bûn,-
Çawa nestrêm?-Ne miraze!

Helbesteke xwe ya dinêda Simo bangî mirovan û evîna dilê xwe dike û dibêjêda:

Were em şa bin,
Yek me dilê xwe
Ber yekî veke,
Were em şa bin,
Ken ku tunebe,
Girîyê dinyayê
Temam xirabke.

Were em şa bin,
Bi ken emê

kurdub.online

Mirinê altkin,
Û toximê şayê,
Bi ken-dengê xwe,
Şîrine ciwanê
Dinê belakin.

Di vê helbestêda Simoyê hûmanîst (mirovhiz) jî goveka întêrês, daxwezên şexsî derdikeve û xemgînîya xwe ji bona qedera cîhanê, mirovayê dîhar dike. Ew ken û şabûnê mûhîm dihesibîne ne ku bi tenê bona xwe û evîna dilê xwe, lê her wa ji bona mirovayê û cîhanê. Simoyê mirovhiz şabûna xwe di nava şabûna mirovayê, cîhanêda dibîne. Ji bona şîn û girî cîhanê xirab nekin, ji bona mirin li cîhanê bi ser nekeve helbestvan bang dike şabin, bikenin û tovê şayê (bal şayîr: toxim) bi ken û dengê xwe cîhanê belakin (bireşînin).

Awa helbesteke Simoyê Şemo ya dinê ya bi sernavê „Hêsaye dilê min„. Di wêda ew dibêje:

Hêsaye dilê min,
Hêsaye û şa,
Vê dinya aza,
Vê dinya rengîn.
Dike bifire
Mil dide çawa
Keweke gozel
Li mêrga bengî.

Em vê tangê nemaze ji bona xwendevanên dervayî sînorê Sovyêtstana berê parantêzan (hevokan) vekin. Gotina Simo di vê helbestêda tê ser Yekîtîya Sovyêtîyê, Ermenîstana Sovyêtîyê, li kî derê ew bi xwe jî bi bêşikî gelê xwera dimîne. Bi rastî jî bona wî û hemû kurdên Sovyêtstana berê zemanê nivîsandina vê helbestêda dinyake aza, dinyake zengîn hebû û ber wê yekê jî dilê helbestvan

hêsa (rehet) û şaye. Ew wê cîhanê bi çevê kurdî dibîne yê wan kurdan yên ku li Sovyêtistanê edebyet û çanda wan her wa pêş diket.

Ew dilxweşî, ev şabûna şayîr ya di vê helbestêda û yên dine yên weke wê dîharkirî ji kîderê, ji çi tê? Em dikarin gotina xwe ya li jor berfirehtir bikin û bê şuhbe bêjin, ku optîmîzma Simoyê Şemo bi giranî ji sê faktora dihat:

- Rewşa civaka kurdî ya li Sovyêtistanê, li Ermenîstanê ya sosîyal-aborî, mafdarî û polîtîkî ya gorî rewşa kurdên dervayî Sovyêtistanê pir xweş.
- Rewşa çanda kurdî ya li eyînî welatî ya gelekî kivş.
- Ji karaktêra Simo ya şexsî.

Hinekên dîlêtant û nezan û kêmzanên di ware dîroka Yekîtîya Sovyêtîyê û komarên wê, nemaze ya Ermenîstanêda piştî hilweşîna Yekîtîya Sovyêtîyê û têkçûna sîstêma Sosîyalîstîyê hemû warên jîyana wî welatî reş dikin yanê jî reş dibînin. Lê bi rastî haqasî jî usa nîne. Heger em rêprêsîya, girtin û hebskirin, sirgûnkirin û kuştina mirovan ser esasê sinifîyê, ku dewrana Stalînda dihat bi cîanînê û ku bona hemû gelên Yekîtîya Sovyêtîyê ew yek polîtîkake giştî, tomerî bû, sirgûnkirina kurdan û çend gelên weke wan kêmjimar dîsa li eyînî welatî bi motivên polîtîkî alîkî dayînin, zemanê eyînî Stalînîda her usa ji şoriş, hilperîna çanda kurdî hate bi cîanînê, lê zemanê piştî wê şorişê, gava zor û zulm li kurdan hat kirinê, weke me got, ser esasê sinifîyê û motîve polîtîkî, lê îdî piştî mirina Stalîn Ronesansa (ji nû va zayîn, xuliqandina) çanda kurdî hate bi cîanînê. Eva rêalîtîye û her bi tenê mirovên kor dikarin wê yekê nebînin, ku di cîhanê temamîda û li Kurdistanê bi xwe şoriş û ronesansa çanda kurdî çarêka ya Sovyêtistanê jî nehatine bi cîanînê û ne jî ew yek mûmkîn bûye.

Simoyê Şemo zemanê vê Ronesans, vê jî nûva hilperîna çanda kurdîda ket meydana efirandinê wek helbestvan û wek esil kurd û weke welatevînê kurd nikaribû ev pêşketina gelê xwe nemaze li Ermenîstanê nedîta, pê serbilind û şa nebûya û ew hest û hisên xwe nava poyêzîya xweda dîhar nekira. Simo kî alî diçû- tiştên şabûnê didîtin: heger neçûya rêdaksîyona rojnema kurdî ya „Rya Teze„ û berê xwe bida rêdaksîyona weşanên kurdî ya Radîyoya Ermenîstanê, heger neçûya eva dawî, wê biçûya Mala nivîskaran, li kî derê nava goveka Yekîtîya Nivîskarên Ermenîstanêda sêksîyona (beşa) nivîskarên kurd kar dikir, heger neçûya wira dikaribû biçûya Neşireta bi nave „Nivîskarê sovyêtîyê„, di kîjanêda berpirsîyarê weşandina pirtûkên kurdî jî li tenişta kolêgayên xwe yên ermenî rûdinişt, heger neçûya wir jî belkî biçûya çapxana Yêrêvanê ya jimara yekê, ku pir salan pirtûkên kurdî çê dikirin, diweşandin. Lê carna jî bona dîtina zanîyarên kurd berê xwe dida Înstîtûta Rojhilatzanîyê ya Akadêmîya Ermenîstanê ya zanîyarîyê, di nava sîstêma kîjanêda beşa kurdzanîyê karê xwe dimeşand. Gelek cara piştî temamkirina kar û barê xwe yê rojê jî ew dikaribû aciz nebûya û bi tenê nema. Ew dikaribû biçûya cîyê enenekirin, analîzkirina pirtûkên kurdî, li kîderê destûra weşandina pirtûkên helbestan û pirosayîsên kurd didan. Lê çiqas êvarîyên kurda yên balkêş li paytextê Ermenîstanê li derên cuda-cuda dihatin organîzekirinê: şevên cejna kurda ya netewî- Newroz, şevên rojbûyîna nivîskar û zanîyarên kurd yên bi temanê angor mezin û bi nav û deng. Di van şevanda Simo gundîyên xwe jî û rûniştevanên gundên kurda yên dinê jî dikaribû bidîtana, ku bi şabûn rîya dûr didane ber xwe bona beşdarbûna nava van şevên bi heytehol, bi def û zurna, bi stran reqasên kurdî. Belê kuda jî biçûya. Belê, kîjanê bêjî, bi nav bikî û kîjanêkî. Û li her dera tiştên şabûnê û serbilindîyê didîtin. Em îdî derheqa wê yekêda nabêjin, ku Simo bi xwe jî dibû guleke wan rasthatin û êvarîyan, bi xwe jî şabûn dixist dilê xelqê.

Me li jorê kivş kir, ku zemanê acizbûnê bona Simo nedima. Heger ew bi xwe nediçû nava civîn û civakên gel, hetanî li gundên dûrî Yêrêvanê yên kurda û yên ku kurd jî lê diman, rojeke usa tune bû, ku heval û hogirekî, nasekî bi xizmet û wek dibêjin, kêfa dinêra derê cîyê kar û bare wî, derê mala wî venekirana. Heger karekî wan hogir û nasan yê acil tunebûya hizret, kovana dîtinê ew dibirin bal Simo. Li her dera ew bi hemêza vekirî qebûl dikirin, pêşwazî li wî dikirin, hemîn wî bi xwe jî hogir û nas bi şabûn qebûl dikirin.

A ji ber vê jî, weke dibêjin, kêf-kêfa Simo bû, ewî her wa, weke ew bi xwe dinivîse, dikakandê, distira. Awa xweşbînî, optîmîzma Simo ji ku û ji çi dihat û ji wan dor û beran jî dîharbûna xwe nava poyêzîya wîda didît.

Weke emê piştra bibînin, sed mixabin, zemanek jî buhurî pêsîmîzmê jî li Simo destda, notên hêvîbiriyê nava poyêzîya wîda dîhar bûn, bi serda jî ew alîyê moralîda şikest. Sebebê destdan, çêbûna vê pêsîmîzmê jî, weke yê çêbûna optîmîzma Simo ew qewl û şert, ew dor û ber bûn, di nava kîjananda helbestvan dima û diefrand. Bi rastî jî, her mirovek û nemaze yê efirandar, heger em dikarin bi wî awayî bêjin, netica dor û berên xweye, heger em dikarin bi awakî dinê jî bêjin, ji nava wan dor û beran dizê, tê cîhanê û gorî qewil û şertên, ku dora wî çê dibin, berheman biefirîne. Me gorî vê nêrîna rast, em weke ya rast ber wê yekê jî dibînin, çimkî bilî me gelek kesên dinê jî ev nêrîn dîhar kirine, optîmîzma Simo û ya di nava berhemên wîda dîharbûyî nirxand. Em niha sebebên çêbûna pêsîmîzma şexsê Simo û dîharbûna wê di nava berhemên wîda raxin ber çevan.

Pêsîmîzm di nava giyan û efrandinên Simoda bi giranî wî zemanî çê bûn, gava ew, weke dibêjin, berbi kalbûnê dimeşîya. Hilbet, di warê çêbûna pêsîmîzma Simo û ya di nava berhemên wîda dîharbûyî temenê mezin jî hetanî warekî rola xwe lêyîst, gava hêdî-hêdî mezin bi mirovanva eyan dibe, lê weke emê bibînin, sebebên çêbûna notên pêsîmîstîyê nava poyêzîya Simoda, yên şikestina wî ya moralî bi giranî faktorên dinê bûn. Û ezê, ku haya min ne ku bi tenê baş ji poyêzîya Simo, lê karaktêrê wî jî heye, hewil bidim xwe wan sebeban bibînim û raxim ber çevan, ku karekî hêsan nine.

Bona sebebên çêbûn, peyîdabûna hevîbirîyê û pêsîmîzmê nava hişmendî, giyan, hesten Simoda zelaltir bên raxistinê li ber çevan û ji yalê xwendevananda baştir bên femkirinê, heger em dikarin bi vî awayî bêjin, bi cure dîrokî ser analîzkirina wê pirsê rawestin, alîyê zemînda jî dûr va gotina xwe destpê bikin.

Dawîya sala 1994-a min karê xwe dikir ji Ermenîstanê derkevim

herim welatekî Avropayê, her çiqasî jî bi cîanîna wê biryarê jî bona min ne hêsa bû, ber ku min jî weke Simo Ermenîstan weke welatê xwe yê duyemîn didît.

Berîya çûyînê jî ez weke berê bawer bikî her roj diçûm bal Simo: cîyê karê wî- polîklînîka xwendkaran. Em ser çûyîna min pir kêm, hema-hema qet nedipeyîvîn, ber ku xistina wê yekê bîra xwe ji bona me herduyan jî zehmet, giran û dijwar bû. Rojekê jî, gava ez weke her cara çûm bal wî ewî ji berîka xwe kaxazekî qetkirî derxist, dirêjî min kir û got:

-Wezîr, hanê bixûne, bal xwe bihêle, xweyîke. Min, weke dibêjin, bînekêra xwend. Helbest bû, ku hogirê minî ezîz pêşkêşî min kiribû. Ez pêwîst dibînim wê helbestê li vira bi temamî bînim navê, ber ku ew jî bona min pêwîste ji bona piştra analîzkirina naveroka wê, ku ji bona dîharkirina ruhiyet û karaktêrê Simo bi xwe, weke emê bibînin, pêwîsttire. Awa ew helbest sernavê wêva:

PÊŞKÊŞÎ WEZÎRÊ EŞO

Herkê rokê ez te nabînim,
Min tirê tiştek min unda kirîye,
Vê dinîya fire cîyê xwe nabînim,
Qeyî bêjî yekî dure min birîye.

Lê wexta têyî, ça behra rabûyî,
Hêdî û fesal ruhê min datîne,
Divêjî ew nîne, ew dilê rabûyî,
Îdî ne hêrse û ne jî dîne.

Ruhê min dilîze wî kenê tera,
Çawa minminîk, bi nûr awazî,
Baska hildide, naz milê bêra,
Kilama emir şa dike gazî.

Min tirê dane min eva dinîya çê,
Minra zêr û zîv îdî ne lazim,
Min unda kirîye gele hogirê te,
Tenê tu mayî: ji wê ditirsim.

Min xwendina helbestê temam kir û, weke Simo temî û şîret li min kiribû, ew qet kir, xiste berîka xwe ji bona parastina heta mirinê wek dîyarîya hogirê xwe ya bahagiran û pîroz. Hilbet, piştî hatin û cîwarbûna li Avropayê jî min çend cara ew helbest xwend, ber ku hêlma hogirê min jê dihat.

Zemanê „ De ma xatira„ jî hat. Temî weyîsetê hogirê min yê dawî ev bû: „Wezîr, ewî got,- ezê tiştekî ji te rica bikim: tu ji minra carana nema binivîse û bi rê bike, lê benda bersiva min nemîne: ez hiz nakim nema binivîsim„.

Gava ez hatim Avropayê ya nenase xerîb-ketim rewşa eyînî zarokekê: law û keçên min weke beled û zanên zimanê avropî, ku berî hinge zanibûn û piştî hatina li Avropayê fêrbûna yên pêwîst berdewam dikirin, ez nava bajêrda digerandim, dibirim cîyên pêwîst, her bi tenê bi wê cudatîyê, ku destê min nedigirtin. Zemanekî angor dirêj ji Ermenîstanê, ji Tiflîsê, ji malbavanan, xûşk û biran, ji qewm û pismaman, heval-hogirên nêzîk bawer bikî bi temamî qut bibûm. Hetanî çêkirina girêdan û axaftina bi telefonê jî ji boyî min pir dijwar bû, bahyê xeberdana têlêfonê gelekî giran ser me rûdinişt, kîjan weke niha arzan nî bû. Bi serda jî pirsa stendina mafê rûniştandinê (rûniştevanîyê) jî hela hê nehatibû helkirinê, ku ez jî serhêsa bibim û bikaribim daxwazên şexsî yên bigiranî dilxweşkirin, dilrehetkirina xwe bi cî bînim. Yekemîn nema ku min nivîsî û rê kir, ya bona Simo bû. Hilbet, gorî temîweyîsetê wî ez benda stendina bersiva nema xwe nemam û ne jî min piştra ji wîra neme nivîsîn. Sebebê vê yekê jî hebû. Vê care li bendê bûm, ku ezê zûtirekê destûr, îzna rûniştina xwe bistînim û piştî wê yekê ezê bikaribim herim Ermenîstanê û Gurcistanê dîtina malbavan, qewm û pismam, heval û hogirên xwe û di nava wanda, hilbet, ya Simo. Ez dikarim

we bidim bawerkirinê, îqnekirinê, ku bawer bikî jî hemûşka bêtir xîyal, mexseda çûyîna mala Simo dilê minda dikelîya, disêwirî. „Ezê, weke dibêjin, ser Simoda bigirim,- ez dilê xweda difikirîm.- Berîya çûyînê ez wî ser wê yekê agahdar nakim, ku weke bi zimanê bîyanî dibêjim, sûrprîzekê jêra çêkim. Gava gihîştim Yêrêvanê ezê herim ber derê hewşa mala wî bisekinim û zengil (zîl) xim. Xîyala minda, Simoyê derkeve derva û hê ji dûrva biqîre, bêje: „ Ew kîye?„. Ezê dengê xwe biguhêrim û bi zimanê ermenî (ku bi vê yekê jî wî bixapînim, ber ku min û wî çiqasî jî baş û serbest ermenî zanibû, lê bi hevra em her bi tenê bi kurdî diaxivîn) jê bipirsim, ku giva min dengê wî nas nekir: „Mala Simo Şamoyan eve?„. Ewê dest xweda dengê min nas bike, her çiqasî jî min ew guhêrî bû, bi serda jî bi ermenî bi wîra axivî bûm, wê ji şabûna lez berbi dêrî bê, li dîwara keve, wek mirovekî serxweş, sermest bişewişe, bilukume, bitirse û dema hatin, meşîyana berbi min- ber xweda, lê bi dengekî hêle vê gotinê bi şabûn her wa dubare bike: „Pî lê, kuro, Wezîr hat!„.

... Lê sed mixabin, ev xewnerojk, ev xîyala min ya xweş û bi hizret-kovana himberî Simo dagirtî bi cî nehat. Weke dibêjin, înî zûtir hat, ne ku şemî. Gava ez qet ne benda wê yekê bûm, ji nişkêva, piştî zemanekî ne pir dirêj yê ji hev qut bûn, qetyana, weke dibêjin, destên me 10-ê adara sala 2001-ê caba wefatkirina Simo li min daxistin.

Mirovên ku jîyana xweda, ketine rewşa min ya giran- nava xerîbyê, wê ji min rind fem bikin, kanê di wê xerîbîya giranda bihîstina cab, besa ne bi xêr ya wefatkirina mirovekî nêzîk, ezîz û hizkirî li mirov çiqasî dijwar tê, çiqasî giran ser mirov rûdinê, nemaze gava ew cab bi derengî digîhîje tê û îdî ne mûmkûne tu xwe defînkirina wîra bigihînî. Dema ji minra gotin, Simo îdî berîya çend mehan wefat kiribû û haya min ji wê yekê tune bû. Her bi tenê dima ez dilê xwe bi cîanîna karekî dine rehet bikim, berpirsîyarîya xwe himberî hogirê xwe yê îdî gorbuhuştda bi awakî dine bi cî bînim: Bi nivîsandina peyîva xwe ser wî û kar û barên wî yên pir hêja û ba-

kurdîn online

hagiran ber gelê xwe, mirovan, edebîyet û çanda kurdîda. Min hema usa jî kir: gava weke dibêjin, hişê min piştî çêbûna şokê hinekî hate serê min- ez rûniştim û kula dilê xwera ew peyîva xwe nivîsî ya bi sernavê „Ew jî kete rêza nemira„ û ew di rojnemeke me ya kurdîda da weşandinê (Binhêr: „Pêradanokê„). Lê weke hûn, xwendevanên min, dibînin ez bi nivîsandina wê peyîvê jî razî nebûm: bona bêtir rehetkirina dilê xwe û bi cîanîna berpirsîyarîyê hindava hogirê xwe û kedkirê edebîyeta me kurdan, vaye, ez nivîsandina vê pirtûka ser jîyan û kar û bare Simoyê Şemo bi cî tînim.

Piştî wefatkirina Simo çend sal buhurîn û min destî lawê gorbuhuşt yê hêja- Rizgan pirtûka bavê wî ya bi tîpê latînî çapbûyî ya bi sernavê „Baxçê payîzê„ stend. Min di wêda ew helbest dît ya ku gorbuhuşt pêşkêşî min kiribû û berîya hatina min ya li Avropayê hê bi destnivîsar dabû min, ber ku pêra negîhandibû ewê berevokê berhemên xweda bide çapkirinê. Lê gava zemanê ji hev xatirxwestinê hat Simo ew helbest bi destnivîsar da min, ku bi wê yekê him dilê xwe rehet bike û him jî yê min. Belkî niqitîbû dilê wî, ku emê îdî hev nebînin û ji ber vê yekê jî dixwest min agahdar bike, pê bihesîne, kanê ez bona şexsê wî weke hogir çiqasî pêwîst û bahagiranim. Simo nizanibû zimanpenîyê, nangenimîyê, şalûzîyê, himberî hogiran rû bi rû bike. Bi giranî piştî mirina hogirên xwe ewî hêja pesnê wan dida, ew bilind û bi hêjatî dinirxandin. Emê piştra ser vê yekê bi giranî rawestin. Lê ya min tiştekî îstîsna û taybetî bû. Weke me li jorê kivş kir, ew ne bawer bû, ku wê careke dinê jî min bibîne û ji ber vê yekê jî dixwest ku zêndîtîya me herduyanda dilê xwe rehet û baristan bike bi eyankirina helwesta xwe ya himberî min weke hogirekî xwe yê herî nêzîk. Bi wê yekê wî dixwest dilê min jî rehet û baristan bike berîya çûyîna min ya li xerîbîyê.

Min hilbet di pirtûkêda, careke dinê helbesta ku Simo pêşkêşî min kiribû xwend. Eyînî helbest bû, tu farqî, tu cudatî navbera herdu varîyantên helbestêda tunebû: varîyanta bi destnivîsar ku gorbuhuşt berîya çend sala dabû min û varîyanta ku vê pirtûkêda hatibû çapkirinê. Her çiqasî jî cudatî navbera herdu varîyantanda tune bû,

lê cudatîya têgihîştin, femkirina herdu varîyantên bi temamî weke hev bal min çê bû û awa bi çi awayî, çima, bi çi sebebî.

Min berevoka „Baxçê payîzê„ xwend û hêja min Simo bi temamî fem kir, hêja min tecrûbe kir ku hindava hogirê xwe yê gorbuhuşt ez xapîyame: kontêksta helbestên wî yên pêsîmîstîyêda yên vê berevoka bi tîpên latînî min hêja tam û temam ji naveroka helbesta Simo ya ku pêşkêşî min kiribû fem kir...

Min vê care wê helbestêda ne haqasî xwe, lê bêtir Simo û hest û his, giyana wî dîtin. Emê piştra bi giranî ser şirovekirina vê yekê rawestin, lê niha emê besa qala pêsîmîzma poyêzîya Simo bikin ya ku dîharbûna xwe di eşeke helbestên vê berevokêda dîtibû.

Belê min berevoka „Baxçê payîzê„ xwend lê min Simo bi temamî nas nekir. Şûna Simoyê xweşîn, optîmîst li himber min ji nişkêva Simoyê hêvîbir, xemgîn, pesîmîst rawestîya,her çiqasî jî helbestên pêsîmîstîyê di vê pirtûkêda bi jimara xwe pir hindik bûn. Belkî di vî warîda dema pisîkolojîyê rola xwe lêyîst: helbestên pêsîmîstîyê tehsîreke girantir ser min çê kirin, ber ku bi jmara hindik jî ewana berevokên helbestên Simoda dihatin weşandinê.

„Çetine„. Vê helbestêda Simo hale xweda digirî, ku ev yek hetanî hinge dûrî karaktêrê wî bû û li xwe mukur tê.

Ax çetine,
Zef çetine,
Emirda tim
Tenêbûn,
Heval-hogir,
Min nekin qar,
Hevkî rehm bin
Boyî min hûn.

Hela bikin
Û mêzekin
Min van kulê

Bê serî,
Gurê çîya jî
Dilê tijî,
Halê minda
Dgirî.

Ji alyê çepê Simoyê Şemo, Mîkayêlê Reşîd û Sehîdê Îbo (salên 198O-î)

Piştra Simoyê xemgîn eşkeretir û zelaltir derheqa tenêmayîna xweda dinivîse û boyî wê tenêmayînê gazinan li hogirên xwe dike, wana bi sûc dike.

Hevalêd min kuda çûn?
Hevaltîya me bîr kirin,
Çewa bextreş li dinê
Tenê hîştim, temam çûn.

Hogirêd ezîz, çima çûn?
Min tu gazin we nekir,
Gula dilê min hûn bûn,
Lê hevaltî we bîrkir.

Simo haqasî ji tenêbûnê direve, haqasî acize, ku sernavê helbesteke xwe jî danîye „Tenêbûn„ û di wêda bi ax û kovan dibêje:

Ax tenêbûn, tenêbûn,
Te dilê min kire kaf-kûn,
Te ez hêram nolanî aş,
Te ji min bir ew rojên xweş.

Simo helbestekêda ser rewşa xwe ya giran bi awakî usa dinivîse, ku wek dibêjin, gunê kafiran û dilkeviran jî wî tê. Bi awaz û miqamekî çqasî zelûlî ev xet hatine sêwirandinê:

Li çola,
Li gelîya
Ker helîya,
Emirê min,
Bi dirîya,
Stirîya
Xitimî
Rênga min.

Helbesteke xwe ya dinêda jî Simo ji boyî undakirina hevalan danavî dibe, dêşe. Sernavê wê helbestê bi tenê jî naveroka wê ya melûlî û zelûlî eyan dike di wêda helbestvan bi dilekî ji ber xemgînîya giran xişivî û pirs û pirsîyara ji hevalên undakirî dike, dibêje:

Şeva tarî, bê serî,
Ne steyrke, ne guman

Ez nizanim, ez nizanim
Hevalêd min li ku man.

Şeva tarî girtîye derî,
Ne steyrke, ne guman,
Kese tune, ku bêje min-
Hevalêd min li ku man.

Piştî haqasî Simo îdî bi rastî ser hevalên undakirî dêşe, dikewgire. Awa helbesteke wî, ku avîtîye ser hogirê xwe yê zarotîyê, doxtir û nivîskarê kurd yê bi nav û deng Sehîdê Îbo, ku destpêka sala 1991-ê li Yêrêvanê nava rewşa kirîmînêlîyê û anarşîyayê ya giranda hate kuştin. Simo wê helbestêda rewşa ya moralî û pisîxolojîyê ya giran radixe ber çevan, gava herşev Sehîdê Îbo tê xewna wî:

Hevalê min,
Tune şevek neyêyî xewna min,
Heta sibê gazina nekî,
Nola berê, tu birê min,
Dilê xweyî behir venekî.

Cemîlan xûşka Simoye mezin bû. Min ew dît gava ez û Simo bi mêvanî çûn mala wê li navça Telînê. Mirov bê şubhe dikaribû ew bi nav bikira wek xatûna kurmancîyê. Cemîlan îdî temenê mezin bû ku çû ber rehma Xwedê, lê birangê wê yê helbestvan ji ber undakirina wê haqasî xemgîn dibe, bi awakî usa şewat û zelûlî derheqa mirina wêda dinivîse, ku mirovên mayîn, xerîb jî bi xwera xemgîn dike, û ewana bi rêz û hurmeteke mezin himberî birakî weke Simo û şîrhelal û hest û hisên wîye nazik tên dagirtinê:

Ax xûşka ezîz, tu minra dê bûyî,
Ji dê êtîm, tu dewsa wê bûyî,

Ger nexweş bûme, tu kûr nelîyayî,
Te şev ron kirîye, ker-lal heliyayî.

Her êşa minra te ax kişandîye,
Xweyînga ciwan, lê min tişt nekir,
Ez xwe hekîm bûm, min tu kar nekir.

Ax dîsa, dîsa xweyînga şîrin,
Te ser lêvê xwe navê min xwera bir,
Ax, xûşka ezîz, çima zû çûyî,
Dibe, şîrinê, tu ji min sar bûyî.

Ne birê teme, min tenê neke,
Dilê min dêşe, çarekê bike!

Weke ji alîyê zaniyarîyêda hatîye îzbatkirinê, mirov bi giranî, payê pirê wan tiştan, wan bûyaran û wan kesan xewnêda dibîne yên ku hertim xîyala wandanin, yên ku dema hişyare derheqa wanda difikire. Her usa jî tê gotinê, ku mirovên mirin bi wanva eyan dibe, hilbet, yên bi piranî xudanê temenê mezin û nexweşên giran, miryan xewna xweda dibînin û bi giranî mirovên nêzîk û dilê xweda ezîz. Weke kivş dibe, vê yekê Simo jî dest daye, gava ewî weke bi xwe şedetîyê dide, her şev Sehîd xewna xweda dîtîye:

Hevalê min,
Tune şevek neyêyî xewna min.

Lê vê tangê ezê kivş bikim, ku sebebê çêbûna hêvîbirî, pêsîmîzma Simo haqasî jî temanê mezin û bi wîva eyanbûna mirinê nîbû, ber ku, weke lawê wî yê doxtir Rizgan jî şedetîyê dide, Simo zemanekî kivş berîya mirina xwe, em dikarin bêjin, zemanekî dirêj qet nexaş nebûye, tundurustîya wî cîda bûye, ew neketîye nava cînivîna. Mirina Simo ji nişkêva dest dabûye, gava xûn rijîyaye ser

mejûyê wî. Weke dîsa Rizgan di nema xweda ya ji bona min nivîsandî kivş dike ku Simo destî tenêmayînê zêrîyaye, li vira bi fikra qutbûna ji heval û hogirên nêzîk, bi giranî yên pênûsê, yên ronakbîrên kurd. Di vê pirtûka Simo ya dawîda her çiqasî jî poyêzîya pêsîmîstîyê, hevîbirîyê sertacîyê nake, lê çend helbestên ku di wê pirtûkêda hatine bi cîkirinê û weke kivş dibe, salên jîyana wî yên dawî hatine nivîsandinê, analîzkirina beşeke kîjanan me raberî guhdarîya xwendevanên xwe kir, şedetîya tiştekî dinê didin, şedetîya wê yekê, ku salên jîyanê yên dawî hêvîbirîyê, pêsîmîzmê nava giyan, hest û hisên Simoda sertacî kirine. Helbestên ku Simo dawîya jîyana xwe nivîsîne şedetîya şikestina wî yalê moralîda didin, şikestineke mezin. Û ya bona min here giran û bi keder ew bû, ku min ev şikestina hogirê xwe cara yekemîn tecrûbe kir û ya ji bona min here balkêş û muhîm jî ew bû, ku min kontêksta her bi tenê çend helbestên bi awazên pesîmîstîyêda naverok û nêta helbesta, ku Simo pêşkêşî min kiribû û di vê pirtûkêda ya xwe ya dawîda bi cî kiribû, ji nûva, bi temamî û rast fem kir û vê yekê ez bona hinek tiştên, ku min berra berda bûn, bi cî neanîbûn, pir êşandim û xemgîn kirim.

Me li jorê kivş kir, ku piştî stendina pirtûka Simo ya dawî, gava min di wêda helbestên gorbuhuşt yên pêsîmîstîyê xwendin- di kontêksta wanda hêja rast û bi temamî ji naveroka helbesta wî fem kir, ya ku wî pêşkêşî min kiribû. Raste, Simo bi wêda xwestibû wê yekê eşkere bike, kanê ez weke heval ji bona şexsê wî çiqasî pêwîstim, ku ez demên çêbûna rewşa wî ya moralîyê ya giran jêra dibim berbîn, lê dijî daxwaza xwe wî belkî bêtir ruhê xwe, karaktêrê xwe yê qenc di wê helbestêda eyan kiribû. Simo vê helbestêda derheqa îhtîmala ketina xwe nava rewşa moralîyê ya pir giranda nivîsî bû, derheqa wê yekêda pir zelal eşaretî dabû, ku gava dikeve rewşa moralîyê ya pir giran û ez wê demê dêrî lê vedikim, wek dibêjin, dêrîda diçim, bi kenê minra ew rewş bi carekêra beta vebe, ji nava giyanê wî derdikeve- dice. Em muhîm dibînin beşeke wê helbestê dubare bikin, ku gotina me bona xwendevanan piştî eyankirin vê nêrîna me bêtir femdarî be:

kurdlib.online

Herkê rokê ez te nebînim,
Min tire tiştek min unda kirîye,
Ve dinîya fire cîyê xwe nabînim,
Qeyî bêjî yekî durê min birîye.

Lê wexta têyî, ça behra rabûyî,
Hêdî û fesal ruhê min datîne,
Divêjî ew nîne, ew dilê rabûyî,
Îdî ne hêrse û ne jî dîne.

Ruhê min dilîze wî kenê tera,
Çawa minminîk, bi nûr awazî

Dawîya helbestêda Simo tirs û xofa xwe ji bona wê yekê eyan dike, ku piştî undakirina gelek hogirên xwe dikare min jî unda bike û ji ber wê yekê ditirse, ku ez hogirê wî yê nêzîk yê dawî me.

Belê, vê helbestêda hetanî stendina pirtûka Simo ya dawî min bi tenê xwe didît û hema bi vê yekê ez xapîyam. Û ev xapyan jî ser min weke emê bibînin, alîyê moralîyêda pir giran rûnişt. Ez bi wê yekê xapîyam, ku Simo hertim bi devekî ken, bi beşereke xweş min bal xwe qebûl dike. Lê min nizanibû, ku ew devkenîntî, ew beşera xweş bi dîtina minra çê dibe. Min nizanibû, rasttir, ez serva nediçûm ku berîya dîtina min Simo gelek caran ketibûye rewşeke moralî ya giran. Lê gava ez didîtim, dest xweda, weke me li jorê kivş kir, ew xemgînî, weke dibêjin, jê direve û min pêra nedigîhand wê xemgînîya wî ser rûyê wî, wek dibêjin, bixûnim û tecrûbe bikim.

Simo dawîya helbesta xweda ya ku pêşkêşî min kirîye, tirs û xofa xwe ji bona wê yekê kivş dike, ku piştî undakirina hemû heval û hogirên dinê yên here nêzîk tenê ez zêndî mame û ew hema ji wê yekê ditirse. Xên ji tirs û xofa li ber mirina min Simo belkî weke wê ji tenêmayîna xwe ya piştî min ditirse:

...Tenê tu mayî,
Ji wê ditirsim.

Simo baş haj karaktêrê xwe hebû. Ewî zanibû ku tenêmayînêda, bê heval û hogirên nêzîk hew dikare ber xwe bide.

Bilî vê helbestê dîsa kontêksta helbestên Simo yên pêsîmîstîyê, hêvîbirîyê yên dinêda min careke dinê temî-weyîsetên Simo, dît-inên wî yên dema xatir ji hev xastinê analîz kirin, gava wî ji minra got: „Ji minra nema binivîse...„, „Ez ditirsim tu xerîbîyêda danavî bibî„. Ya derheqa nivîsandina nemanda ji tenikbûna dilê Simo dihat. Wî dixwest qet nebe bi serê wan nema, bi xîyalî min li tenîşta xwe bibîne. Ya danavîbûna min. Heger Simo bi xwe tirs û xofa danavîbûnê dilê wîda tune bûya dijwar ji îhtîmala danavîbûna mn bitirsîya. Sed heyf, ku ez zemanê pêwîstda xapîyam, sed heyf, ku min derengtir hogirê xwe yê pir salan bi temamîya karaktêrê wîva naskir, her çiqasî jî berîya wê naskirina bi temamî Simo eşaretîya nasandina karaktêrê xwe bi zar, temî-weyîsetan dabû.Ez niha hêja fem dikim ku min bi nivîsandina her bi tenê nemekê sûcekî çiqas mezin himberî hogirê xwe kir. Ez niha hêja tê digîhijim, kanê Simoyê ku tenê mabû, çiqasî hewcê nemê min bû ku min jêra neşandin. Ez bi xemgînîke mezin wê yekê tînim ber çevên xwe, kanê bi çi awayî Simo her sibe rabûye çûye ber qutîya poştê ya mala xwe rawestîyaye bi hêvîya di wêda dîtina nemeke min. Lê gava qutî vekirîye û têda nema min nedîtîye bi sergerdan, xapîyayî veg-erîyaye mala xwe. Û zemanekî dirêj, weke dibêjin, ji berxweketinê hişê wî nehatîye serî.

Hogirê min yê ezîz, heger min weke niha bizanibûya dilê te haqasî tenike, zû bi zû, weke dibêjin, birîndar dibe, tu dikarî alîyê moralîyêda zû bişkêyî minê carekê na, lê sed carî tera neme bi rê biki-rana, ku îro jî xwe li ber te bi sûc nedîta û eva yeka dilê minda nebûya kuleke giran, derdekî mezin... Ew rewşa giran ya ku Simo têda bûye û derheqa wêda Rizganê birazîyê minî hêja dinivîse, her bi tenê min dikaribû siviktir bikira, ji wê rewşê bi qonaxeke kivş derxista.

Tecrûbekirineke teref, alîkî dinêda ya pir balkêş ez dixwezim li vê tangê eşkere bikim.Simo îtîmala danavîbûna min dît, lê min ya wî nedît. Sebebê vê yekê yê herî giring ew bû, belku Simo baştir karaktêrê min nas kiribû, ne ku min yê wî. Bilî vê, Simo di welatê xwe yê dayemînda, nava êl û eşîra xweda dima, her çiqasî jî ew olka wî sêrektir dibû, dora wî jî heval-hogirên pênûsê, ji ronakbîrên kurd xalî dibû. Lê ez diçûm xerîbîyê, welatekî nenasî dûrî deraz û ji ber vê yekê jî îhtîmala danavîbûna min jî ya Simo pir bêtir bû. Lê encamê dawîyêda ekisî vê dîtinê destda, Simo îzbat kir ku mirov welatê xweda jî dikare danavî bibe heger heval û hogirên wî bi carekêra mina bibin, ew mirov „unda„ bibin, yên ku ewî dikaribû derdê xwe bi wanra parevekira, siviktir bikira.

Simo, weke me li jorê jî kivş kirîyê, tu cara xwe feqîr û belengaz nedikir, hale xweda nediqirqirya û me hew dît ew xudanê cesaret û raya xurte, dilê wî wek pola qewîne û ber vê yekê jî ne yê alîyê moralîyêda şikestinêye, ne yê danavîbûnêye. Lê dawîyêda eyan bû, ku giyan, hest û hisên Simo ji yên min jî û yên me heval-hogirên dine teva jî naziktirin. Ez li xerîbîyê hetanî niha jî danavî nebûme, rasttir, tiştek ji min nehatîye, lê Simo neçû xerîbîyê û welatê xwe yê duyemînda, wekî wî Ermenîstan dihesand, danavî bû, wefat kir. Di wî welatê xweda jî xwe bi tenê dît û ew tenêmayîn bû sebebê dawîhatina jîyana wî. Em dikarin wa jî bêjin: vê tenêbûnê Simo kuşt. Bona gotina me ya „tenêmayîna„, Simo şaş neyê femkirinê, emê zelalîkê bixin nava vê gotina xwe. Simo alîyê malbetîda tenê nema: keç û kurên wî yên bavhize dilovan, birakî weke Sûto, ku mîna çîyakî pişta wî bû û di nava wanda Rizganê xemkêşê bavê hebûn. Lê dîsa jî Simo xwe bi tenê didît. Awa derheqa wê yekêda Rizgan nema xweda ya ku ji minra nivîsî bû û hogirekî xwera bi rê kiribû, çi dinivîse: „Mamê birêz, hogirekî bavê min yê pênûsê û herî nêzîk hûnin, û ez bi tenê bi wera dikarim wê şabûna xwe parevekim, ku bal min peyda bû piştî amedekirina vê pirtûkê bona weşandinê...

(gotina wî ser pirtûka „Baxçê payîzê„). Ji matêrîyalên vê pirtûkê

yên here balkêş û tehsîrçêkir ji bona min ew helbestên bavê minin yên ku zemanê dawîda hatine nivîsandinê, di kîjananda gazî heye, gazîya hindava hogirên xweda, hisret, fikir- mitalên mirovê nava tenêbûnêda. Ez baş zanim, ku rojên bavê mine here xweş hevalên wîra girêdayî bûn. Nava zemanê jîyana xwe ya dawîda ew bawer bikî tenê bû. Min ew yek tercube dikir û dicêriband wê tenêbûnê bi pîvaneke kivş dagirim: Bi derbazkirina zemanê xwe yê gorî îmkanê xwe azakirî li tenişta wî. Lê heyf, gelek tişt ji minra li hev nedihat. Mejûyê wî yê bi xemanva mijûl, bengz û bala wî jî wê yekê nedihat guhêrandinê.

Sebebê vê rewşa wî min fem kir tenê piştî mirina wî, gava nasîya xwe da arşîva wî. Raste, hogirên wî yên ezîz li dûr bûn, lê ewî hisret, tenêbûn, mitalên xwe tenê bi wanra pareve dikir û ew jî bi alîkarîya pênûsê,,.

A bi vî awayî, gorî zeman, dîtina lawê Simo hate îzbatkirinê, ku sebebê şikestin û dûra mirina Simoyê Şemo ya angor ji zeman zûtir bi giranî qutbûna wî bû ji heval-hogirên nêzîk û tenêmayîna wî bû. Lê dikarin pirsîyareke wa jî bona vê gotinê ji me bikin:

- Lê ew çi qewimî, ku ji nişkêva, bi carekêra Simo heval-hogirên here nêzîk unda kirin, sebebê vê yekê çi bû?

Emê niha hewl bidin bersiva vê pirsîyarê jî bidin.

Dawîya sala 1991-ê Yekîtîya Sovyêtîyê hilweşîya, weke împêratorîke sîstêma sosîyalîstîyê û bi pêra jî sîstêma sosîyalîstîyê bi xwe jî navê rabû. Bi giranî qutbûna girêdanên êkonomîkî navbera komarên wî welatî yên berêda, çêbûna krîza êkonomî, gur û geşbûna nijadperestîyê, çêbûna rewşa anarşîk, bêserîtîyê û gorî wê jî giranbûna rewşa krîmînalîyê gîhand bi carekêra xirabbûna rewşa rûniştevanên wî welatî ya sosîyal-abûrî. Vê hilweşanê û ji navê rabûna sîstêma sosîyalîstîyê tehsîra xirabîyê çê kir nemaze ser êtnosên welêt yên weke kurdan kêmjimar yên gorî wê kêmjimarîyê jî bê komar. Em vê yekê dibêjin, ber ku desthilat, rêvebirîya sovyêtîyê sosîyalîstîyê ya dîktatorîyê bi cîanîna qencîya hindava miletên welêt û van êtnosa bi pêra û xirabîya hindava wan jî weke monopolîya

xwe hilgirtibû nava destê xwe. Hilbet, ew qencî bi giranî ji karaktêrê sîstêma sosîyalîstîyê nedihat, lê bi giranî bi motîvê polîtîkî dihat bi cîanînê. Gorî pollîtîka Lênîn ya miletîyê navenda vê împêratorîya sosîyalîstîyê- Moskova bi hukumeta Yekîtîya Sovyêtîyê ya li vira ya sêntralva xwedî li van êtnosên kêmjimar derdiket û di nava wanda usa jî- kurdan. Sebebê vê yekê yê bingehîn ew bû, ku Moskvayê xwe dihesand çawa navenda împêratorîyê û loma jî parastina yekîtîya wê hertim li ber çevên xwe digirt, lê paytextên komarên wê yekîtîyêda dikaribûn têndêsên dijî vê hewhildana sêntralkirinê çê bibûna ser bingeha tûjbûna nasîyonalîzmê (nijadperestîyê), ji yalê miletên wan komaran yên payê pirê û gorî wê jî rêvebirda binpêkirina mafên van êtnosên nava xwe yên kêmjimar yên miletîyê. Vê xwedîderketina Moskovayê gîhand çêbûna şorişa çanda êtnoseke welêt ya kêmjimar ya kurdan, lê piştî navbirîkê, ku ji sala 1937-a hetanî mirina Stalîn çê bû, gîhand Ronêsansa çanda kurdî. Hilbet, ser vê têndênsa sêntiralkirinêda faktoreke dinê jî dema çêkirina Ronêsansê hate holê: hewildana Barzanîyê Nemir ji bona qazanckirina piştgirîya Sovyêta hindava Tevgera Azadîxwezîya kurdda û bona pêşxistina çanda kurdî li Yekîtîya Sovyêtîyê, ku netîca bi cîanîna wê yekêda ew Ronêsans çê bû.

Lê gava Yekîtîya Sovyêtîyê hilweşîya, piştovana êtnosên weke kurdan kêmjimar- Moskova ji navê rabû wek navenda wê yekîtîyê û sûbsîd, fînansên, ku ser pêşvabirina çanda kurdî dihatin mesrefkirinê, bicarekêra hatin qutkirinê. Hukumetên komarên ji Yekîtîya Sovyêtîyê veqetîyayî û di nava wan da ya Ermenîstanê bi giranî bi sebebên çêbûna kirîza êkonomîkî hew dikaribû şûna Moskovayê mesrefên ser çanda kurdî bi cî banîyana.

Civaka kurdî li Ermenîstanê piştî hilweşan, ji hev berdana Yekîtîya Sovyêtîyê ji hundurva ji hev berda. Dutîretî kete nava wê civaka ji eyînî miletî ser bingeha olî navbera du baskên wêda: kurdên musulman û kurdên êzdî. Em ser sebebên çêbûn û çêkirina vê dutîretîyê ranawestin, ber ku ewê dûr û dirêj bikişîne û me ji babeta vê pirtûka xwe ya serekîn dûrxe.

Belê, nava van qewl û şertanda pêşketina çanda kurdî, kurdzanînê hema-hema rawestîya. Û ji ber wê yekê beşeke ronakbîrên kurd ji Ermenîstanê çûn derva, lê hinekên weke Simo cîyê xweda man. Berdewambûna nifşî ya ronakbîrên kurd nava van qewil û şertanda ne mûmkûn bû: şûna yên dimirin û diçûn yên nû danedigirtin, ber ku bi sebebên femdarî çê nedibûn. Û ji ber vê yekê jî Simo hema-hema tenê ma, heger em wê yekê jî bigirin ber hesêb, ku di nava ronakbîrên kurdda yên ku weke wî li Ermenîstanê man, heval û hogirên wî yên nêzîk tune bûn. Em derbarê rewşa wî, derbarê sebebên şikestin û dawîhatina jîyana wîda bi kurtayî û bi awakî nexşnîgarî dikarin wa bêjin. Simo weke hogirên xwe yên dinê berîya hilweşana Yekîtîya Sovyêtîyê xwe spartibû dîwarekî stûr yê ku bi giştî, bi tomerî çanda kurdî ji wî pêk dihat, çê dibû, lê gava ew dîwar hilweşîya, hedimî Simo jî piştostan ket. Lê ji ber vê ketinê, weke hemû ronakbîrên xudanê kemal û keda mezin bi tenê bi fîzîkî mir. Simoyê helbestvan, Simoyê ronakbîr, Simoyê welatevîn û miletevîn yê ser welat û gelê xwe şewitî zêndî ma, rasttir, nemir û ne jî dimire. Ewî tu qelpî-qûlpî nekirîye nava poyêzîya xwe, ew tişt gotîye, çi ku bi rastî,bi rêalî dilê wîda sêwirîye û ji ber vê yekê jî hetanî poyêzîya Simo hebe ewê bi xwe jî nava miletê xwe yê bi şêkirda bijî.

Simoyê şemo gelek helbestên bi hûnera bilind efirandine. Bi wana jî ew nemire. Em li vê tangê her bi tenê mîsaleke wê hûnera helbestvanîyê ya bilind bi çarîneke helbesta wî bi sernavê ,,Kerba,, bînin navê:

Ker helîya dilê min,
Bû kevçî ava sar,
Ji herdu çevên min,
Wek hêsir hate xar.

Çi kurdîke xweş, xwerû, gelêrî, çi li hevanîn, hûnandin, vegirtineke gotin û hevokan ya bi awakî aza, rehet bê çêkirina zor-

darîyê ser hemd û hişê xwe. Belê, peyîv û hevokên vê helbestê û çarînên weke cewikên li pala çîya xweberî xwe dixulxulin û bi dengekî xweş jorda tên xarê. Bi tenê helbestvanê weke dibêjin xwedêdayî, xwezayî, zane zargotin û zar û zimanê gelê xwe yê hosta dikare bi awakî wa hêsa netîca kerbê (berxweketinê) ser giyan, hest û hisên xwe bi vî awayî raxe ber çevan. Bilî vî hemûşkî em di vê çarînêda stîl, awayê hevanîn-sêwirandina helbestan ya usa dibînin, ku bi tenê stîl û awayê Simoye: nivîsandineke ku weke ava çemê li rastê, li deştê ser gîhêra dişûlike, nerm û nazik, bê teqîn û reqîn, bê xuşîn û guşîna ku mirov aciz dikin. Şedetîke hostatîya helbestvanîya Simo ya bilind jî ewe, ku eger mirovek, xwendevanekî, ku haya wî pirî-hindikî ji poyêzîya Simo û şureta femkirin û nirxandina poyêzîyayê bi temamî bal wî heye û ev helbest, ev çarîna vî helbestvanê me nexwendibe dema xwendina wê ya cara yekemîn wê dest xweda xudanê wê nas bike. Çêkirin, efirandina poyêzîyake bi stîla cuda, tayîbet, ku ji stîl û awayê nivîsandina hemû helbestvanên dinê bi cudakirinê şedetîya bilindaya hûnera wê poyêzîyayê dide. Kerema çêkirin, li hevanîna poyêzîyake usa, ku her nimûnek, her helbesteke wê efirandarê wê bide naskirinê-kerema Xwedêye, ku her kesîra nabe. Ev çarîn her usa jî mîsaleke here geşe ya çêkirina wênan. Ew çi ku Simo vê çarînêda dibêjedibe weke tabloyeke, wênekî, rasttir, perçekî fîlmekê û tê ber çevên xwendevanan. Gava wê çarînê dixûnî tê qeyî bêjî dilê helbestvan jî dibînî yê ku ker, bê deng dihêle, jorda tê dikeve kevçîkî weke ava sar, piştra ew av ji herdu çevên wî wek hêsir têne xar.Ev çarîn her usa jî mîsaleke hûnera Simo ya wênenîgarîyê ya here başe.

Me li jorê kivş kir, ku sebebekî danavîbûn, keribîbûn û ji zeman angor zûtir mirina Simo yê objêktîv tenêmayîna wî bû piştî undakirina heval û hogirên nêzîk, helal û amin. Lê sebebekî vê yekê yê dinê jî hebû, ku bêtir ji karaktêrê Simo dihat, heger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, bi heyîna wî karaktêrî nava giyanê wîda ew sebeb çi bû. Ber vê yekê jî em vî sebebî dikarin bi giranî bi nav bikin weke yê sûbyêktîv. Simo ne êgoyîst bû, ne bi tenê xwe hiz bû û her çiqasî

jî xemgîn bûya, weke me li jorê jî ev yek kivş kirîye, gava heval-hogir didîtin ew xem dest xweda jê direvîn. Belê, Simo mirovekî civakî bû, eşq û şabûna xwe nava heval-hogiran, civakêda didît û eva yeka jî, her çiqasî jî destpêkêda gotina me weke paradokis kivş bibe, bû sebebê serê Simo, rasttir, evê yekê weke dibêjin bû sebebê mirina wî. Belê, bi lojîkî waye: kesê ku şabûna xwe, serbilindî û bextewarîya xwe nava heval û hogiran, civaka mirovên bona xwe bahagiran û ezîzda dibîne, piştî undakirina wan hew dikare jîyana xwe berdewam bike. Sed mixabin, qanûneke emir, jîyanê ya wa jî heye: mirovhizî, heyfbûn, dilsozî bêtir dibin sebebê qutbûna jîyana mirov.

Dawîya dawîyê min dixwest careke din vegerîyama ser karaktêrê Simo weke mirov û weke helbestvan. Simo, heger em dikarin bi vî awayî bêjin, lêyîtmotîva temamîya jîyan, kar û bare xwe weke mirov, şexs û weke helbestvan di vê yekê da didît:

Emirê xweda ez sîyar bûme, ne peya,
Kilama min perwaz daye her alîya,
Wexta Pêgas min zîn kirîye eşq û şa,
Ew nesenîye ne ber zanga, ne gelîya.

Min tim gotîye, çi ku dilê minda bûye,
Ne ku ew, ku ser zarê min hebûye,
Min hiz kirîye rewş û rastî, bedewî,
Û şûrê min tu şerada ko nebûye.

Min ne kirîye mixenetî kesîra,
Nîvî kirîye parîyê xwe her kesîra,
Herkê yekî nenas ketîye tengasîyê,
Neçûme dûr û ne gotîye,- çî minra.

Weke hogirê Simo yê zemanê dirêj, ku haya min rind ji karaktêrê wî hebûye, ez dikarim wek dibêjin, bi herdu destan îmza (qol) xwe,

mora xwe ya şexsî bin van çarînên wî û gotinên wîda daynim, weke yên rast. Min bi giranî ji ber wê yekê ev helbest anî navê, ku Simoyê Şemoyî helbestvanê esilî, xudanê kemal, talanta helbestvanîyê ya mezin bira nava nifşên dûyerojêda bimîne bi giştî. Bira ew bîra nifşên gelê meda bi taybetî bimîne her usa jî wek mêrê eyînî kurd: comerd, ciwamêr, merd, destvekirî û helal, xweyê bextê mêrê çê, wek pêşî û bavpîrên me kurdan yên kevnar, yên ji mala Zal.

PERADANOK

Pêşepeyva peradanokê

Ji bona reng û rû, karaktêr û bi temamî, weke cama wa jî dibêjin, cîhana hundurîn ya Simoyê Şemo bê raxistinê ber çevên xwendevanan, me birîyar danî wê pirtûkê ser jînenîgarî, kar û barê wî bi giranî weke helbestvanê kurd bi "Peradanokê", rasttir, bi matêrîalên pêwîst temamtir bikin.

Min beşa peradanokê ya yekemînda du gotar-peyvên xwe yên ser hogirê xwe bi cî kirinê. Yek ji wana gotara mine, ku weke pêşgotin di pirtûka Simo ya " Dilê bengî"-da hatîye çapkirinê, lê ya dinê, sed heyf, ya bi mûnesebeta wefatkirîna wî hate nivîsandinê, ku rojnema " Dema nû"-da bi sernavê "Ew jî kete rêza nemira" hatîye weşandinê.

Dîsa vê beşêda min hinek dîtin û tecrûbekirinên xwe yên ser hogirê xwe yê gorbuhuşt pêşkêşî guhdarîya xwendevanan kirîye, ku bi awayê bîranîan hatinê nivîsandinê.

Di nava ronakbîrên me yên kurd yên bi giranî Ermenîstanêda, her usa jî beşeke rûninştevanên wê komarê yên kurd yên neronakbirda beşên derheqa hinek bûyerên dora min û Simo çêbûyî eşkere û belaw bibûn, lê hinek ji wana jî bilî min û wî haya pir kêm ronakbîrên me ji wana hebû. Ew buyer bêtir karaktêrê Simo weke henekçî, laqirdçî, weke xudanê hest û hisên hûmorîyê dîhar dikin. Min

neveroka çend bûyerên ku bi beşdarbûna min û Simo, dora me herduyan, ser pêwendî û girêdanên min û wî çê bûne, kirine bingeha çend novêl, serpêhatî, çîrokên xwe yên bûyerî û wan jî pêşkêş dîharîya xwendevanên xwe dikim. Ewana cara yekemîn di vê pirtûkêda tên weşandinê.

Xweyê qelema qenc û bi bereket

Ev berevok dema t'emambûna 6O-salîya bûyîna xudanê wê-Simoê E'lîyê Şemo çap dibe ya şayîrekî kurd yê Sovyêtê yê naskirî û hizkirî. Eyînî zemanîda 4O- salîya karkirina wî ya berhemdarîyê di ware edebyeta kurdîda xitim dibe.

Simoyê Şemo bi barxaneke giran, bi berê qelema satîrîyê ya qenc û bereket hatîye- gihîştîye vê rojê, vê qonaxê. Ew bi wêva bû xweyê heyşt berevok, heyşt pertûkên şiêr û destanan. Heminkî rûpelê rojnema kurdî ya " Rîa teze" gelek berevorkê berhemên şayîr û prosaîsên kurda ji berhemên wî xalî nebûne. Weşanên radîyoyê jî yên bi kurdî alîyê xweda guhdarên xwe dike heyr û motacên berhemên wî.

Simoyê Şemo sala 1928-a gundê navçа Ermenîstanê ya Hoktêmbêryanêye Kelederxêda / niha Şênavan/ ji dayîka xwe bûye. Hema li vira jî dibistana navîn temam kirîye. Piştî wê bûye xwendikarê xwendinxana Yêrêvanê ya doxtirîyê û sala 1951-ê xwendina xwe demam dike. Lê sala 1957-a ew înstîtûta Yêrêvanê, ya doxtiryê bi serkeftin demam dike. Weke doxtirê xudanê xwendina bilind li navçên Ermenîstanê yên Telînê û Axbaranê kar dike û bi giranî wek serok- berpirsîyarê nexweşxana gundê Elegezê li vê navça dawî / niha nawça Aragasê/, lê ji sala 1966-a polîklînîka û nexweşxanê paytextê Ermenîstanê- Yêrêvanê yên cuda-cudada bi helalî û xemkêşî xizmeta karê parastina saxlemî, tundurstîya rûniştevanan dike. Û tiştê herî kivş û balkêş nava kar û barê wîda ew bû, ku kî dibû hewcê alîkarî, zanebûnên wî- tu kesek ji wana dilmayî verê nedikir,

bona hemûşka zeman û hereket dest dixist.. A ev mirovhizî, dilsozî û xemkêşî bêtir bi şêweyê temam nava berhemên Simoyê Şemo yê şayîrda dîhar dibin.

Simoyê Şemo 6O- salîye. Vî temenîda weke qanûn û weke cêrbandina jîyanê nîşan dide, tûrê piranîya şayîran hema- hema vala dibe. Piştî wê ew destbi nivîsandina berhemên pirozayê, dûznivîsarê dikin, yanê jî îdî bîranînên xwe ji bona çapkirinê amede dikin.

Simoyê Şemo vî temenê xweda ji ser xwendevanên xweda bi tûrê dagirtî, tijî hatîye, bi berhemên tam û temam yên nû, weke xwe berê, weke ew yek nemaze dema çapbûna berevokên wî yên yekemîn çê bûye.

Weke hogirê wî yê nêzîk ez heyran, şaş û metelê eşqa dilê wî dimînim. Simoyê Şemo deman jîyana şexsî yên dijwar û giranda jî hesîna hûmorê unda nake, henek û laqirdîyên xwe berdewam dike. Ew wê hesînê unda nake ya ku ji bona ronakbîrê berhemdar û nemaze şayîrekî tiştekî pêwîst û bi kêrhatî dihesive. Û tiştê ecêb û metelmayînê haqasî jî ew yek nîne, ku Simoyê Şemo hetanî niha jî, wî temenê ji bona berhemdarîya şayîrtîyê angor mezinda jî helbestan dinivîse, ne jî haqas ewe, ku kel, germaya bengîtîyê, evîndarîyê nava bedena wîda hela hê sar nebûye, lê ewe, ku tu di nava poêzîya wîda awazên gumanbirîyê, hêvîbirîyê, melûlîyê û zelûlîyê bawer bikî navînî, yên ku wî temanîda bêfitîya, bibê- nebê bi mirovan kar dikin. Lê heger ew awaz cî- cîna bi xwe didin hisandinê, k'ivş dibin jî, nava yên hêvîya qenc, ronikda zû bi zû beta vetên, unda dibin. Lê eva yeka nîşan nade, ku şayîr ber xwe nakeve, nakewgire, xemgîn nabe yanê jî hêrs nakeve. Nerastî û neheqîtî, zulmkarî û bêwijdanî, ku îro bi rengên topa dinîayê yên cuda-cuda bi xwe didin hesandinê, tehlike- qezîya şerê atomîyê, bindesta bêtifaqîya gelek miletan û nemaze ya gelê wî yê bîstmîlîonê / bi texmîn û tecrûba niha gelê kurd dora 4O mîlîon mirovane/, dilê şayîr diqusînin, dêşînin, ewî hêrs dixin. Lê faktor, îzbatî û bûyerên dilbaristanîyê, hêvîyê û şabûnê bêtir zef li ber çe'vên wî dikevin, bêtir kivş dibin. Ew pêşketin û gulvedana welatê wî yê Sovyêtîyê, gelên welatê wî

û beşeke gelê wîye, ku malbeta gelên bira ya mezinda bûye xudana mafên miletîyê yên temam / hilbet, gorî jimara xwe/. Ew pêşketin, gulvedana Ermenîstana Sovyêtîye, Yêrêvana şêne rengîne, li kîderê şayîr dimîne û diefrîne û bi rêra ji ya edebyet û çanda gelê wîye, ku bi saya polîtîka Partîa Komûnîstîyê ya rast, alîkarî û piştgirîya ermenîyên bira, xemkêşîya wan gihîştîye gelek mexsedên qenc. Û ber vê yekê jî, weke gelê me demên wada dikare bêje, ew bûye şayîr û bilbil, dengbêjê jîyan, pêşketina me ya îroyîn, dûyeroja me ya bêtir bi nûr, bi ronik. A bi vî awayî, Simoyê Şemo jîyanêra bi hezaran sîmê dilê xwe, rehên xûna xwe, bi rehma wî dilî ya mezin, bi dilsozîya xwe, bi xemkêşî û kêfxweşîya wî dilî girêdaye û ew jîyan bi xwe bûye kanîya ava avilheyatê, bi k'îjanê tîbûna dilê şayîrtîyê dişkê.

Simoyê Şemo şayîrê lîrîke. Ew motac û maşoqê xwezayê / tebyetê/ û evîna helale paqije. Ew pesinê hîva zelal kûr dide. Şayîr me xwendevanên xwe bi xwera dibe sozanên bilind, nava mêrgên keskîn yên bi kanîyên ava zelale sar, te dibe nava gul û kulîlkên hezar reng û awazî, nava konên kurmancîyê, yên reş, jîyan, deb û rizma zoma, di nav kîjanada zarotîya xwe ya zêrîn derbaz kirîye. Ew ruh ber xwezayêda tîne, bi wêra bi dilsozî diaxive û xwezayê jî bi xwera dide kêlimandinê. Ew hema nava wê gotebêja xwe û xwezayêda gelek hesîn, şêwirên dilê xwe yên qenc dide dîharkirinê. Ew xwezayê ra bi awakî usa diaxive, weke mirov hogirekî xwera xeber bide, hogirê herî nêzîkî helalî aminra bikeve nava sobhetê, qisê û qisewatan.

Poêzîya Simoyê Şemoda, weke dilê wî, qelpî- qûlpî tune. Û ber wê yekê jî tu îtbar û bawarîya xwe bi wî tînî û bi wîra hevaltîyê, rêberîyê dikî. Ew hevaltî û rêberike xweşe, dilê mirov baristan, xweş dike. Şayîrra baş li hev tê wê hevaltîya xwe û xwendevanan çê bike. Ew rîya berbi dilê xwendevan rind û rast divîrne, çimkî ew bi xwe şayîrê hesîn û şêwira dile. Û badilhewa nîne, ku wî navê şiêreke xwe danîye " R'ênga dila". Belê, şayîrê ku vê " R'ênga dila" dibîne ew esil şayîre û bi pêra jî bexteware. Ew bi wê yekê xema, derd û kulan dilê xweda nahêle.

Û, dawîyê, xwendevan ji poêzîya Simoyê Şemo hiz dikin, çimkî şayîr îtbar û bawarîya xwe bi wana tîne, dilê xwe bi helalî, bi temamî li ber wan vedike, sura dilê evîndar wanra dide eyankirinê.

Em bi haqasî gotina xwe xilaz bikin bi wê hêvîyê, bi wê bawarîyê, ku derheqa poêzîya Simoyê Şemoda wê hela bê nivîsandinê, çimkî şayîr xwe xwe jî, weke ev berevok şedetîyê dide, beng- benga wîye, benga berhemdarîya xêr û bereket. Û bera vê pertûkêra jî oxir be ser " R'ênga dila". Wezîrê Eşo, xweyê qelema qenc û Bereket.- Simoê Şemo, "Dilê bengî", Yêrêvan, 1989 rûp. 3-7

EW JÎ KETE RÊZA NEMİRA

Caba wefatkirîna şayîrê kurd yê bi nav û deng, hogirê min yê herî nêzîk, amin û helal li Ermenîstanê Simoyê Şemo xerîbîyêda, li paytextê Fransa- Parîzê 1O-ê adarê sala 2OO1-ê li min daxistin, gava ez ji paytextê Bêlçîka- Bryûsêlê çûbûm wira beşdarî konfêranseke ser pirsa kurda bibim, ku înstîtûta Parîzê ya kurdî organîze kiribû bi seroketîya Kendal Nezan. Zemanê mirina wî ya li paytextê Ermenîstanê- Yêrêvanê ne zelal ji minra gotin. Her bi tenê wa kivş kirin: " Îhtîmalê ewî Ewî berîya çend mehan wefat kirîye". Ez piştra haydar bûm, ku hogirê min yê ezîz 3O-ê mijdarê, sala 2OOO-ê çûye ser dilovanîya xwe. A bi vî awayî, Simoyê Şemo dora 72-salan jîyan kir. Gorî bîr û bawerî, raman, felsefa gelê me yê kurd, ku dîharbûna xwe nava zarotîyêda jî dîtîye, 7O sal sembola kalbûnpîrbûnêne. Di nava xelkê meda dibêjin: " Kalê 7O salî", gava dixwezin temenê wî weke yê mezin kifş bikin. Lê bawera dilê minda, bi texmîn- tecrûba min ya ser bingeha hevaltîya min û Simo ya zemandirêj, ew 7O salên wek sembola kalbûnê ya here kivş qet ji bona yekî weke Simo negotine. Bîlî min gelek kesên dinê jî yên ku Simo baş nas dikirin, vê bawarîyêda bûne. Eva jî hela sirîya xweda: me heval û hogiran qet bawer nedikir, ku Simoyê hertim beşerxweş, devken, henekçî dikare wek mîrovên dine kal bibe,

mirûzê xwe bike, lêva xwe daxwe, rûyê xwe tirş û tal bike. Hetanî nîveka salên 9O-î ez û Simo bal hevbûn, gava temenê me nêzîkî 7O salan dibû, lê ne min û ne jî hogirekî dinê navê kaltîyê ne danî ser wî. Ne ku qêmîşî wî nedikir, heyfa xwe wî danî ji bona danîna wî navî li ser wî, lê ew yek, ku Simo hê dûrî temenê kalbûnêye me wek tiştekî real li ber çevan kivş didît. Simo her bi tenê, weke em kurd dibêjin, por û gulî sipî kiribûn, lê bi natûra xwe, bi beşera xwe ya xweş, bi ken û laqirdîyên xwe, hetanî bi rêveçûna xwe jî, ya çapik- çeleng, bi rûyê xwe yê bê qerçimok û weke yên genca şimşatok ew bêtir dişibîya mêrekî, weke dibêjin, navsere, yê 4O-5O salî, ji k'îjanîra, weke bi kurdî tînin ser zara, dikarin bêjin: " Beng-benga wîye". Û belkî sebeb ew nekalbûn, ew rûsivikî û eşqa dilê wî bû, ku hetanî dawîa jîyana xwe jî Simo weke şayîr çik nebû, nemiçiqî, stewir nebû. Lema jî ewî nava şayîrê Sovyêtîstana berêda kedeke berhemdarîyê, helbestvanîêye yeke hew mezin kir. Şedetîya wê yekê jimara berevok, pirtûkên helbestên wî jî dide, ku salên 5O-î virda hatine weşandinê: dora deh pirtûkan. Ew jimar di nava qewil û şertên welatê Sovyêtîyêda ya mezin dihesibî, ber ku dewletê bona çapbûna pirtûka her nivîskarekî honorar / bi peretî/ dida wî û loma jî nivîskar jî bona weşandina pirtûkên xwe sirêda radiwestîyan /sirîya nivîskaranda/ û çimkî pere di navêda hebûn kesî nedihîşt, ku hogirê wî yê pênûsê pêşîya wî keve. Weke dibêjin şerê pera bû jî. Ber vê yekê jî piştî zemanekî angor dibêj hêja sirê dihat ser nivîskarekî: perê dewletê haqas zef tunebûn, ku hersal pirtûka nivîskarekî biweşîne û bilî mesirefa ser çapkirina pirtûkê pera jî bide avtor, xudanê wê.

Belê, weke nîv sedsalê Simoyê Şemo bê westandin helbestvanî kir, efirand, bi rengekî taybet û xweşik edebyeta kurdî li Ermenîstanê dewlmend kir. Ser hîmê nêrîn û tecrûbên min yên pirsale / me bi hevra hogirtîya nêzîk kirîye bawar bikî nava hemû salên efrandina wîda: ji dawîya salên 5O-î hetanî dawîya sedsalê ya 2O-î/ ez hatim ser wê fikirê, bawarîyê, ku Simo wek şayîr nava tarîxa edebyeta kurdî ya Ermenîstanêda dîharbûn, kivşbûneke îstîsna, efrandarekî degme bû. Eyane, ku şayîrtî, helbestvanî, heger em dikarin wa bêjin, pêşê sinetê ciwana û ciwantîye, qencane, ber û rezê dilê bengî û evîndare. Gava mirov temenê xweda mezin dibe, rasttir, kal û pîr dibe ew kela dilê bengî û evîndar jî bere- bere datîne, wek ava sîtilekê yanê jî beroşekêda vedipesire, piştra sar dibe. Piranîya şayîrên cîhanê yên mezin jî di nava wanda, gava weke dibêjin, kalbûn-pîrbûnê li wana kar kirîye, dest daye, nivîsandina helbestvan bere- bere dane birînê, rasttir, bê daxwaza wan, dijî îdara wan ew nivîsandin hatîye birînê, wek dibêjin, hezarî carekê destê xwe avîtine pênûsa helbestvanîyê. Hinek ji wana jî şûna helbestvan, beyt û destanan derbazî nava karê nivîsandina efrandinên vekirî, dûznivîsar/ prozayê/ û bîranînên xwe bûne, hê evê yekê li Simo dest neda. Belkî sebebê vê yekê yê bingehîn nava karaktêrê wîda bû: weke dibêjin, ruhsivik, hest û his, karaktêra hûmorîstekî, henekçî û laqirdçîkî hetanî dawîya jîyanê ji nava beden, qalib, dil û sewdayê wî derneketin, ew neterkandin. Hetanî dawîya jîyana xwe jî ew evîndar û bengîyê keça kurd, gel û welatê xwe, xwezeya cîhanê bû.

Simo, em dikarin bi bawarîya temam bêjin, herroj diefirand. Evê yekê em bi awakî dinê jî dikarin bêjin: Simo herroj, hergav bi şayîrtî, helbestvanî difikirî. A eve eynî helbestvan. Em wî dikarin bişînin kanîke zozanên çîyayê Elegezê, ku bi şev û roj av jê dizê. Simo aşiq û maşoqê zozanên çîyayê Elegezê, reşkonên kurmancîyê, zomên kurda û keça kurd ya bi gul û gîhê wî çîyayî xemilandî bû. Çawa ku helbestên wî dixûnî ji wana ne ku bi tenê bêhna kulîlkên çîyayê Elegezê, lê her usa jî xişe- xişa gul û gîha, xule-xula cew û kanîyên wî çîyayî tên.

Simo her çiqasî jî xudanê talant, kemala mezin bû, lê ji pesindayîna xwe hiz nedikir, rasttir, ji xwexwa pesindayîna xwe û pesindayîna ji hêjabûna xwe ya helbestvan zêdeir. Gava gorî hêjabûnê helbestvan wî û karkirîna wî ya efrandinê dnirxandin, eva yeka bi dilê wî bû, bi wî dilî xweş dihat, lê ne bi awakî pir eşkere. Simo ji ber pesinandina xwe, ew pesinandin çiqasî jî gorî hêjabûna wî bû

weke helbestvan tu cara xwe qure- babax nedikir. Lê gava ji hêjabûnê zêdetir pesinê wî û helbestên wî didan, eva yeka li wî xweş nedihat. Awa mîsaleke îzbatkirina vê nêrîn û tecrûbekirina me. Sala 1989-a pirtûka Simoyê Şemo bi sernavê " Dilê bengî" li Yêrêvanê hate weşandinê bi pêşgotina min ya bi sernavê " Xweyê qelema qenc û bereket". Piştî xwendina wê pêşgotinê Simo pir gazinên xwe li min kir, got: " Malavayo, te haqas pesinê min daye, ku serê min gîhandîye heylo ber perên ezmîn".

Simoyê Elîyê Şemo li gundekî deşta Araratê / Yêrêvan/, li gundê Kelegerxê/ berê: navça Hoktêmbêryanê ya ne jî gorî bi lêvkirina kurdên ji nifşa mezinan, ya Serderavê/, lê niha Şênavan li navça Armavîrê/ hatîye dinyayê, hetanî bûye xortê gihîştî rûniştexanê wir bûye, lê bawer bikî, nîvê zemanê jîyana wî pirtir zarotîyê û xortanîyê li nava xwezaya çîyayê Elegezê, gul û gîhên wîda buhurîye. Hema weke dibêjin, çevê sibê vebûne- venebûne, ji tarîbara wê, ji berbangê hetanî êvarê, gava tarî hêdî- hêdî erd hilçinîye, ewî û hogirê xwe yên zarotîyê yê herî nêzîk, piştra şayîr û doxtirê / profes- sor- doktor/ bi nav û deng Sehîdê Îbo bi hevra berx çêrandine. Û loma jî badilhewa nîne, ku jîyana kûrda ya nîvkoçerîyê, jîyana zomên kurmancîyê, xwezaya çîyayê Elegezê piştra bûne çevkanîya efrandinê ya nemiçiqî bona Simoyê şayîr. Lê pişt ra, gava ew bû doxtir û dehsalîyên jîana xwe yên dawî bû rûniştevanê bajarê giranpaytextê Ermenîstanê- Yêrêvanê, toqê derd û kulên jîyanê û bi giştî qedera gelê wî li stûyê wî hate hev û giran bû, gava li Ermenîstanê û nemaze dervayî wê kêmasî, nivîşkanî kete nava kurdîtîyê bi awayê çêbûna dutîretîyê, dubendîtîyê, şayîrê miletevîn bi ax û kovan, bi hizkirineke mezin û kûr ev rojên zarotî û xortanîya xwe yên bêxem û şa, yên bi kûrdîtîya xwe rû dagirtî û hilbet ya li ber pala çîyayê Elegezê, nava paşila xwezaya rengîn û xweşikda bîr anî: nava helbestên xweda. Piştî pir salan ewî ew xwezayî bîr tanî, ya ku hogirtî bi wîra kiribû û niha ser dûrayîke zemîn ew xwezayî bi wîva kivş dibû wek hogirekî zêndî, wek mirovekî, yê ku ewî unda kiribû. Simo ne mirov û fikirdarekî paşverû bû, ku bixwesta

miletê wî car din vegerîya nava jîyana nîvkoçerîyê. Na. Lê gava piranîya kurdên deşta Araratê gundên bîyanîyanda û bi taybetî yên ermenîya û azêrîyanda diman û tehlîka asîmîlîasîyonê roj bi roj zêdetir dibû ji ber kêmjimarîya kurdan himberî bîyanyan, lê her usa jî bi selefê zêdebûn, gur û geşbûna girêdan, komînîkasîyonên vî zemanî, bi sebebe ketina zimanê bîyanî, nava deba hemû kurdan " bi destî" dibistanan, weşan û axaftinên radîyoyê û têlêvîzîyonê, Simo xwezila xwe bi wî zimanî danî, gava ev tehlîke tunebû, peyvandin û jîyana êl û olkên miletê wî jî bi kurmancî, bi kurdîya xwerû bû. A evin sebebên bingehên, bîlî yê xweşikbûna xwezayê ku Simoyê şayîr bû aşiq û maşoqê xwezayê û hilbet, yê evîna dilê xwe- keça kurde wek horî- perî, ku ew ji nava wê xwezayê û wê jîyanêda lê dîhar dibû. Û Simoyê xudanê derd û kulên zemîn wan evînên dilê xwezayê û keça kurda bi hizret û kovaneke kûr bîr tîne û bi wek hogirê zêndî dipeyîve, ku wan derd û kulên giran hinekî siviktir bike yên ku giranîya xwe avîtine ser dilê wî yê nazik û ew bin xweda wek mêwa, wek fêkîyê gihîştî dipelçiqandin.

Ji bona bi hêjatî û rast nirxandina poêzîya Simo ya evîndarîyê û bi taybetî evîndarîya ser xwezayê em dikarin wa bêjin : şexsekî, kesekî jîyana xweda qet çîyaê Elegezê, xwezaya wî, zome, reşkonên kurmancî yê li berpalên wî nedîtibe- bi xwendina helbestên Simo ew xwezayî û jîyana kurda ya li wir weke fotokê tên ber çevên wî. Gava Celadet Berdirxanê mezin û hogirên wî li Sûrîyayê destpêka salên 3O-î çend jimarên rojnema kurdî ya " Rya teze" û çend pirtûkên kurdî, ku hemûşk jî li Yêrêvanê hatibûn çapkirinê, distînin / bi destê Hecîyê Cindî û Cerdoyê Gênco/, ew „Hawara„-a„ xweda bi wê mûnesebetê dinivîse: " Ji nava rûpelên wan yên teze û ter bîhna kulîlkên çîyayê Elegezê, bayê zozanên Serhedan dihatin„. Evê gotinê em dikarin bi bawerî û îgnebûneke temam himberî helbestên Simoyê Şemoda bi kar bînin. Em di wanda ne ku bi tenê wan zozanan û rûniştevanên wane kurd dibînin, lê tê qeyî bêjî hetanî dengê jêzayîna ava zelale sar ji kanîyan, xule-xul, xuşe-xuşa cewikên mezin û biçûk, ku ji wan avan çê dibin, dibhên.

Simoyê Şemo bengî- evîndarê xwezayê, zerîyên kurdane, ku dimeşin bindarûkê. Ew dawîya helbesteke xwe, ya xweşik sebebê kalnebûna xwe nava heyîna xwezaya zozanên bilind û keça kurde xweşikda dibîne û bi pêra jî sebebê çêbûna efrandinên xwe yên ser wana:

Çawa nestrêm? Xwe ne lalim?
Vê buhuştê çev navîne?
Çawa nestrêm xwe ne kalim?
Zef jî îdî xweyî nevîme.

Ev carîna helbestekê îzbata wê yekê ya geşe, ku Simoyê Şemoyî xweyînevî dîsa bengî- evîndarê xwezayê, zerîyên kurdane, ku dimeşin bindarûkê û hema evê yekê nehîşt, ku şayîr kal bibe. Raste, îdî nevîyên wî hene, lê dilê wî, ruh û ruhyeta wî weke yê ciwana mane.

Simoyê Şemo welatevîn, miletevînekî bi şewat bû, lê ne weke hineka şayîrê gazî, slogan û bang, awazên vike-valane, ku bi wana xwe weke miletevîn kivş bike, weke dibêjin rûmeteke arzan bi dest bîne.

Di helbesta xweda bi sernavê " Gelê minra"-da ew welatevîntîya xwe di nava xizmetkirina hindava gelê xweda divîne. Çevên Simo her lê bûn, kanê çi kêmasî dikevin nava gelê wî, yên berbi bi tehlikê kîjanin û dijî wan şerekî giran datîne. Ji wan tehlike, qezîyayên rêal ew bi heqe yekê ji asîmîlabûna gelê me ya îroyîn dihesivîne: çi li welet bi xwe, çi li dîasporayên kurdî. Îro, gava asîmîlîyasîyon wek bizûzê ketîye nava laşê gelê me û goştê wî duxwe, digure, wek zûrîya jî xûna wî dimije, helbesta Simo ya bi sernavê " Zimanê kurmancî" gotineke helbestvan ya pir bi cî û war, pir rojane, aktûêle. Ev helbest dijî nêrîna wan çepên kurdane, yên ku dibêjin: " Ziman ne mûmkûne, ya mûmkûn bîr û bawer, raman, zanînên derheqa rê û dirbên azakirina welêt da nin. Lê şayîrê me yê gorbuhuşt heyîna milet, nasnema wî nava zimanda divîne, wî zimanîda ku

usa bi sedsal û hezarsalan miletê me weke miletekî cuda û serbixwe parastîye. Simo kivş dike, ku ziman ber tîrên neyara nava zemanê buhurîda bûye mertal û ji nava bahoz û firtonê bobelîsk û tofanên zemandirêjra gelê me çawa helbestvan dibêje "wek nemir" gîhandîye rojên me. Simo rast tecrûbe kirîye, kanê kîjane sebebê wê yekê, ku kurd hetanî îro weke kurd mane, gelê kurd jî bi tevaya xwe weke gelekî cuda dihesîne. Û ev helbesta wî, ku emê dîsa besa wê bikin, rojên meda roleke pir aktûêl werdigre, gava prosêsa asîmîlekirina bi destê zorê, ku dewletên dagirkerên Kurdistanê dimeşînin û bêxemî, arxayîntî û tewekelîya me kurdan heyîna wî zimanî kirine tehlîke:

...Bûye mertal, ber tîrên qal
Hemû deran ber neyaran,
Nav şevêra, dewir- qurnêra,
Weke nemir, gîhandîye wir,
Te gelê min...

Me li jorê kivş kir, ku Simo meremê jîyana xwe nava xizmetkirina hindava gelê xweda didît. Û weke haya min pir baş jê heye, ewî bi tenê weke helbestvan xizmeta gelê xwe nekir. Wek şexs, wek mirov û nemaze wek doxtir emekê wî himberî gelê xweda geleke. Hê ewî bi tenê weke doxtir jî xizmeta gelê xwe nekir. Simo, weke gelê me dibêje, merê hewar û gazîya bû, yanê: mêrekî bi kêrhatî, ku gava xelq diket tengasîyê, rewşeke giran, dijwar bona alîkarîyê hewara xwe li wî dadixist yanê jî, gava ew bi vê yekê dihesîya bê hewar û gazîkirin diçû hewara xelqê û nemaze xelqê ji miletê xwe. Milet, evîntîya wî nava dil, jîyana basîtda jî dîhar dibû. Ew ji şîn û şayên milet kêm nedibû û amedebûna wî di navda wek ronakbirekî bi nav û deng, dilê mîlîyona xweş û baristan dikir.

Simo alîkar û piştovanê mirovên ketî bû, û bi pêra jî comerd, mêvandar û nandar bû.

Simoyê Şemo piştî demamkirina dibistana gundê xwe ya navîn

berê xwe dide Yêrêvana paytextê Ermenîstanê û xwendinxana wir ya doxtiryêda tê qebûlkirinê. Hê gava dawî li fêrbûna di wêda anî, wî zemanekî ne dirêj li gundên navça Telînê wek alîkarê doxtir kar kir, ku bi zimanê doxtirîyê, mêdîsînayê jêra dibêjin fêldşêr. Û çimkî li wê navçê gundên kurda jî angor pir bûn, wî li wir bi dilsozî û ciwamêrî xizmeta gelê xwe jî kir, hê meremê wî, nemaze- bavê wî- Elîyê Şemo ew bû, ku ew bibe esil doxtir. Sala 1957-a wî bi serfinyazî û rûspîtî înstîtûta Yêrêvanê ya doxtirîyê xilaz kir û dîplom, nasnema doxtirê esilî stend. Ji wê salê hetanî sala 1967-a wî li navça Axbaranê, bi giranî nava gundên kurdan yên dora gundê Elegezê, ku zemanekî jî bû navenda navça eynî bi wî navî, wek serokê nexweşxana wî gundî û doxtirê sereke kar kir û rûmeteke bilind nava rûniştevanên wê navçêda qazanç kir.

Ji sala 1967-a hetanî hema dawîya jîyana xwe Simo li Yêrêvanê nexweşxanên cuda-cudada kar kir. Li wir jî ew ji xizmeta gelê xwe derneket. Wek doxtirê naskirî û cêrbandî nexweşên kurd ji navçên Telînê, Axbaranê û yên deşta Araratê, ku Simo ji nava evên dawî derketibû, rêke dûr didan ber xwe û bi bawarîya qencbûn, silametbûna bi destê wî dihatin Yêrêvanê. Belê, Simo di nava kurdên deşta Araratêda, gundên wanda kar nekir, lê wana ew weke doxtirê xwe dihesibandin, bi wî serbilind dibûn û ji bona dîtina cara qenckirina nexweşîya xwe dihatin bal wî. Van kurdên deşta Araratêra bi tevayî digotin " êl". Ez., niha piştî wefatkirina hogirê xwe yê ezîz derheqa wê yekêda jî xemgîn dibim û difikirim: gelo ew kalemêr û pîrejin, ew keç û ew zilam, ew zarokên me wê bê Simo çawa bikin, wê derdê xwe ji kêra bêjin, weke dibêjin, wê li kê bisekinin. Simo sernavê "Ez û êl" bi hizkirin û serbilindî danîbû ser destaneke xwe. Niha ew "êla" giran wê bê Simo çawa bike?

... Min Simo mirîtî nedît û tê qeyî bêjî bawarbûna min ya tam û temam jî nayê, ku ew îdî tune. Belkî ji ber vê yekê wek dayîka qehremanê stiraneke kurdî Rizayê Xêlit li min dest bida, ku stiranek sêwirandîye ser mirina lawê xwe yê ezîzî hizkirî, mirina ji zeman zûtir û ji nişkêva, ya ku dest dide, gava ew li bajarê Mûşê diqeside

û loma jî şubha jerdadayîkirina wî bal xelqê û dayîka wî jî çê dibe. Ev kilam ser Rizayê Xêlit sêwirandî ketîye nava gel û ewê dengbêjê rojên me yê kurd yê bi nav û deng yê ji Serhedê Şekroyê gorbuhuşt jî distirê. Û ber ku dayîka Riza wî weke nexweş nava cî- nivînanda û her wa mirina wî jî bi çevên xwe navîne- bawarîya wê ji undakirina lawê wê ya heta- hetayê nayê, ew lawê xwe weke her zêndî dihesibîne û loma jî stirana xweda dibêje:

....Hetanî sax bim li rû- barê vê dinîayê,
Ezê bikim hewar, bikim gazî: Riza kanê?

Belê, belkî gava ez jî rojekê bi hizreta dîtina mirovên ji xûn- qinêta xwe, heval û hogirên nêzîk dagirtî ji xerîbîya li welatekî dûrîderaz vegerim Yêrêvanê, ji ber nedîtina mirina Simo yanê jî- Simoyê mirî ez jî weke dayka Rizayê Xêlit ji mirina wî bawar nekim û gava lê bigerim, herim mala wî, herim cîyê karê wî û li wan deran wî nevînim, ji kerba, iac, qehîr, êş û jana dilê xwe bi dilekî kovan, kul û birîn biqîrim, bi dengekî hêle bikim hewar, bikim gazî: Simo kanê!

Wezîrê Eşo, Ew jî kete rêza nemira.- Dema nû, 15 gulan- 3O gulan, 2OO1 / Di rojnema "Dema nû"-da kurtaya peyîv, gotina Wezîrê Eşo ser wefatkirina Simoyê Şemo hatîye weşandinê. Vê pirtûkêda xeber, peyîva nivîskar û dîrokzan- edebyetzan ya ser Simo û ya temam hatîye çapkirinê. Ew peyîv ji xudanê vê piştî sala 2OO1-ê veçê kirîye, cî- cîna gotinên nû serda zêde kirine, cî- cîna jî kurt kirîye bi mafê xudanê wê peyîvê.

MÊVANDARÎ NANDARÎYA SİMOYÊ ŞEMO

Karê Simo yê doxtirîyê giran bû. Ew mecbûr dima li du-sê cîya kar bike, ber ku maaş li Sovyêtîstanê gorî Avropa Roava kêm bû, ber vê yekê jî têra jîyanê, xwedîkirina neferan, zarokan nedikir. Bilî

we, Simo mirovekî destvekirî bû, weke gelê me yê weke wîra dibêje, perda ber çevê wî tunebû.

Simo mêvanek bê nan û avkirin ji mala xwe dernedixist. Hemîn li derva, gava nas, heval û hogir rastî wî dihatin û pêwîstîya xwerin- vexarina li aşxanekê yanê jî rêstoranekê çê dibû, Simo nedihişt, ku bilî wî yekî dinê destê xwe bibe berîka xwe,ku perê mesirefkirina ser xarin- vexarinê ji wîra derxe. Simo di vî warîda jî xwe weke berpirsîyarê xelqê, qewim û pismam, heval û hogiran didît.

Gelê me yê kurd gotin, meseleke xweş û bi cî û war ser mêvandarîyê, nandarîyê sêwirandîye. Di wêda tê gotinê: " Mêrê ku berîka xwe, girfana xwe ezîz dike, navê xwe rezîl dike. Lê merê ku berîka xwe rezîl dike- navê xwe ezîz dike". Bona xwendevan jî vê gotinê, meselê bi temamî fem bikin em pêwîst divînin ewê zelaltir şirovekin, komêntar bikin. Ev mesele tê wê menê, ku mirovên qêmîşî mesrefkirina perê berîka xwe nakin, ewana navê xwe xirab û rezîl dikin, lê yên wê berîkê rezîl dikin yanê perên di wêda mesref dikin ewana navê xwe bilind, ezîz dikin. A Simo ji wan mirovên dawî bû yê ku mesirefkirina perên berîka xwe navê mere mêvandar, nandar yê bilind û qenc qazanc kir.

Her çiqasî jî di vî warîda Simo di nava gelek heval û hogiranda hetanî warekî îstîsna, degme bû, lê gava em du faktoran bigrin ber hesêb- dikarin ser wî karaktêrê wî metelmayî nemînin. Ya yekemîn, Simo lawê gelê kurd bû, lê mêvandarîya kurdan bûye lêgênd, efsen. Ji rêwîyên ji welatên derva û nemaze ji Rûsîyayê û Avropayê, ku li Kurdistanê gerîyane û di nava wanda zanyar, diplomat û karkirên warê leşkerîyê yên bi nav, ser vê mêvandarî, nandarîya kurdan şaş û metel mane. Û ya duyemîn, ev mêvandarîya Simo ya bêtir konkrêt û dîrekt genetik bû, ji bavê- Elîyê Şemo jî dihat yê ku bi nandarîya xwe sîyanet- rûmeteke bilind nav êl û eşîrên dor- berê xweda qazanc kiribû.

Simo çara bêçaran, hêvî û alîkarê nexweşan

Govek, xeleqa heval- hogirên Simo gelekî berfireh bû, bi taybetî nava doxtiranda û eva yeka bi temamî femdarîye. Eva yeka jî ji karaktêrê wî yê mirovtayê dihat. Piştî gelek salên demamkirina înstîtûta doxtirîyê ji heval- hogiran ne ku bi tenê ew bîr nekiribûn, lê gava gelek caran bi tesedûfî rastî wî dihatin- pir kêfxweş dibûn. Û Simo ev hogirtî û hogirên xwe jî bi kar tanîn ji bo qenckirina nexweşan. Û ne ku bi tenê nexwexşên kurd, lê yên ermenî û ji miletên dinê jî. Her çiqasî jî Simo miletevînekî bi şewat bû, lê gava sirê dihat ser nexweşan ewî varvêşî nedixist navbera nexweşan gorî esil û esasê wan yê miletîyê û navbera nexweşên kurd û ji miletên dinê jî. Her bi tenê belkî gorî jimara xwe hê gelek kurdan xwe li wî digirtin. Hilbet, wî jî bêhtir xwe li wan digirt. Îdî ez wê yekê navêjim, ku Simo nava kar û barê xweda sonda doxtirîyê wek tiştekî herî pîroz diparast. Ez bawar bikî, herroj li cîyê karê Simo- polîklînîka xwendikaran diqesidîm, ber ku bê dîtina wî sebra min nedihat. Û ez şedê wê yekê bûme, ku di nava heftêkêda herî kêm sê-çar nexweş dihatin bal wî bi hêvîya qenckirina xwe. Hilbet, her çiqasî jî Simo doxtirekî zane bû, lê ne mûmkûn bû, ku ew hemû nexweşîya qenc bike. Û ji ber vê yekê jî ewî gorî nexweşîyê her yek ji wana bi rê dikir ser doxtirê pisporê nexweşîya wî, lê hilbet berîya bi rêkirinê bi têlêfonê doxtirê hogirê xwera derheqa wê yekêda pev diket. Lê carna jî, gava pêwîstîya wê yekê hebûya, bi xwe dida pêşîya nexweş û ew dibir bal pisporê nexweşîya wî. Carna ez jî bi wanra diçûm.

Tiştekî herî balk'êş, gorî karaktêrê Simo ew bû, ku wî tu caran ji hatina nexweşan acizbûna xwe eyan nedikir, rasttir, ew acizbûn di nava ruhîyeta wîda nedibû jî, ka wî ew eşkere bikira. Bi ekis, ewî nexweş bi beşereke xweş qebûl dikirin û bi wê beşera xwe bal wan hêvîya qencbûn, silametbûna nexwexşîyê çê dikir.

Roj hebûn,ku çend nexweş dihatin bal wî. Em li vê tangê pêwîst dibûn kivş bikin, ku ew nexweşên ku ji cî- ware dûr, weke dibêjin, ji derva dihatin, ne xwendkar bûn û qebûlkirina wan ne berpirsîarîya

Simo bû. Belê, çend nexweş rojekêda, bawar bikî, zemanekîda dihatin bal wî û Simo dîsa jî aciz nedibû. Ez ser wê sebir û bînfirehîya wî şaş û metel dimam. Carna, gava nexweşan oda wî dadigirt, gunê min bi Simo dihat û şûna wî ez aciz dibûm, ez dêşîyam û min dilê xweda digot: " Qe gunê wan bi wî nayê. Ev camêr xwe ne ji polaye, ku bilî karê xwe yê ofîsîyêl, eslî xerêqa haqas mirovan bikişîne.

Belê, ez şede bûme, min bi çevên xwe dîtine, ku Simoyê gorbuhuşt ji ber hatina gelek nexweşan qet, rojek çiye, rojekê rûyê xwe tal nekir.

Carekê jî merîkî qewimê Simo anîn bal wî, yê ku ji ber nexweşîya giran nikaribû bimeşîya. Simo biryar danî, ku wî bibe nexweşxaneke Yêrêvanê bide paldanê. Ez jî bi wanra çûm. Li ber derê neweşxanê min ew nexweş hilgirt, pişt kir û hetanî kabîna doxtirê nexweşxanê bir. Simo jî ber vê yekê him kêfxweş bû û him jî şaş û metel ma. Û ji minra got: " Wezîr, wî temenê xwe yê mezin te çima nexweş pişt kir? Meyê çareke dinê bidîta. Min bersiva Simo wa da: "Min jî boy xatirê te ev yek kir, boy xatirê wê yekê, ku tu haqas ezîyet, haqas cefa bona nexweşan dibînî. Hêjaye ku em jî boyî xatirê te cefê bidin xwe".

Şayîrê usa hene, ku bextê xwe dişewitînin, derewa li xwe dikin û helbestên xweda pesinê xwe didin, pesinê mirovatî, dilsozîya xwe didin, gava nava jîyanêda ew qet jî xemkêş û dilsozên mirovan nînin, nemaze mirovên ketî, hewcê alîkarîyê. Helbesteke Simo heye û gava ez wê dixûnim hogirê min yê gorbuhuşt bi temamîya bejin û bala xweva, bi rastî, dilovanî û helalîya xweva tê ber çevên min radiweste. Awa çarîneke wê helbesta wî, ku di wêda Simo bi temamîya karaktêr, temamîya ruhîyet, hest û his, mirovhizî û mirovtaya xweva xanê dike:

Min nekirîye mixenetî kesîra,
Kerî kirîye parîyê xwe her kesîra,
Herkê yekî nenas ketîye tengasîyê,
Neçûme dûr û negotîye: - Çî minra.

SİMO MÊRÊ HEWAR Û GAZÎYAN

Weke me dît, Simo barekî giran yê hema hema dervayî taqet, dervayî taqet dervayî hêz û hereketê xwe hilgirtîbû, pişt kiribû: bilî kar û barê profêsîya xwe ya eslî- doxtirîyê, her wusa jî karê ronakbirîya kurdî bi temamî û yê helbestvantîyê bi taybetî. Lê dervayî bi cîanîna van berpirsîaryan, wan kar û baran Simo zeman û hêz didît di warekî dinêda ji xizmeta mirovan, mirovtayê bi temamî ya gelê xwe bi taybetî bike di ware jîyana civakîda. Bi dîtina rewşa Simo ya giran, gava wî, weke me dît, berpirsîyarîyên mezin û giran hilgirtibûn ser milên xwe, gava valabûna wî, weke dibêjin zemanê xurandina serê xwe jî bona wî t'unebû, ew ji zehmetê giran pir diwestîya, min carna qêmîşî wî nedikir wî ser hinek bûyeran agahdar bikim ji bona berpirsîyarî û karê wî girantir nekim. Awa mîsaleke wê yekê. Destpêka salên 9O-î ronakbirekî me kurdan yê bi nav û deng, doktorê zanînên kîmîayê, dosêntê înstîtûta Yêrêvanê ya polîtêxnîkîyê Ezîzê Xeto Maxmûdyan çû ser dilovanîa xwe. Cinyazê wî dest xweda ji Yêrêvanê birin gundê Elegezê li navça Aragasê, ku li wira binax bikin. Mala Ezîzê gorbuhuşt nêzîkî mala me bû. Bilî wê ez û wî weke welatî, weke xizm û weke hogirê nêzîk jî bi hevra girêdayî bûn û loma ez haj van hemû tivdîram hebûm û bi aktîvî beşdarî mêrasîma Ezîzê Xeto dibûm. Haya min jê hebû, ku Simo jî Ezîz nas dike û wî weke hogirekî xwe divîne. Haya min her wisa jî jê hebû, ku Simo nexweşxaneke Yêrêvanêda ser wîda çûbû, li halê wî pirsîbû. Dîsa jî min ji ber sebebên li jorê kivşkirî qêmîşîya Simo nekir, ku wî ser mirina Ezîz agahdar bikim, ber ku zanibû, ku bêfitîya beşdarî mêrasîmê / şînê/ bibe û wî temenê xwe yê ne cîwanda ezîyetî bibîne bi hatina xwe ya li Elegeza dûrî Yêrêvanê. Ez bi cinyazra çûm Elegezê. Zemanê hildan, binaxkirina Ezîzê gorbuhuştî nêzîk dibû. Ez bi tevî gelek hewarîyan û rûniştvanên Elegezê bi devra rawestîyabûm û benda hildana cinyazê gorbuhuşt bûm. Min hew bala xwe dayê Simo ji yalê rîya sereke, ku nava gundra derbaz dibe, bi lez berbi me tê. Û ji ber ku min gotî Simo ser wefatkirin û

roja binaxkirina Ezîz agahdar kiribûya bi cîanîna berpirsîarîya xwe. weke hogirê herdûyan jî, min ji ber vê hatina Simo bê agahdarkirina wî ji yalê xweda ji wî gelekî şerm kir. Lê piştî çend deqan wî bi xwe jî şermî da min. Gava gihîşt bal min Simo bi dengekî nimiz, ku xelqê dora me nebihên, bi xeyîd û bi awayê gazinan, bi talkirina rûyê xwe ji minra got: -Malavayo, belkî ez bi tesedûfî ser wefatkirina Ezîzê gorbuhuşt hayîdar nebûma û îro jî li wira amade nebûma, wîjdanê min wê heta hetayê ez bizêrandama, bêşandama. Qet nebe te ji minra têlê xista û bi du- sê gotinan ser vê yekê agahdar bikirama.

Min her bi tenê ev gotin, weke dibêjin, da ber r'ûyê xwe: -Simo, tê biborînî. Sebebê agahdarkirina te her bi tenê ew bû, ku min qêmîşîya te nekir. Bilî karê doxtirîê yê ofîsêl li du cîyan tu li gelek nexweşên dinê xwedî derdikevî, ku bi rastî ne nexweşên tene, lê bi naskirina te weke doxtirê zane û dilsoz xwe li te digrin, ku tu alîkarîya wan bikî. Ez hemûşka bêtir haj vî karê te yê pir giran heme, loma jî bilî ku heyfa min li te tê gunê min ji te tê. -Wezîr, ez te baş fem dikim, lê min dixwest, ku te tiştek jî bigirta ber hesêb, lê gunê te li min nayê, ku heger ez definkirina hogirekî me yê hêjada amede nebim ezê li ber xelqê rûreş bibim. Bilî wê, wijdanê min jî wê min bizêrîne, bêşîne.Ez mecbûr mam wan argûmanên Simo bidim ber hesêb û gazinê wî weke yên rast û bi cî bihesibînim. Belê, bi tenê yekî weke Simo, ku xwe berpirsîyarê heval û hogiran didît, dikaribû wa bigota.

TÊLÊGÎRAMA SER NAVÊ SÊKRÊTARÊ GİŞTÎ YÊ ORGANÎZASİYONA MİLETÊN YEKBÛYÎ Û TAN

Em têra xwe ser welatevîntî, miletevîntîya Simoyê Şemo rawestîyan dema analîzkirina poêzîya wî ya welatevîntîyê, ber ku weke şayîr, weke helbestvan ew yek bi giranî û eşkeretî nava wê poêzîya wîda hatîye dîyarkirinê. Lê di vê beşa pirtûkê ya bîranînanda min dixwest ew welatevîntîya şayîrê gorbuhuştî hizkirî raxista ber çevan ya ku nava jîyan, nava kar û barê wî yê praktîkda eyanbûna xwe dîtîye û min jî weke hogirê wî yê nêzîk dema pêwendî û girêdanên xwe yên pir caran bi wîra ew yek, heger em dikarin bi wî awayî jî bêjin, bi çevên xwe dîtîye û bi hiş û sewdayê xwe tecrûbe kirîye. Bi ser vê gotinêda ez dikarim wê yekê jî zêde bikim, ku her rasthatin, her axaftineke xweda ya bi Simora min welatevîntîya wî tercûbe kirîye, lê ne mûmkûne, ku ez bikaribim derheqa wan hemû dîtin, tercûbekirinên xweda li vir yeko-yeko kivş bikim. Emê niha her bi tenê eşkere bikin, kanê ew yek di nava jîyana wî, nava karkirina wî ya praktîkda bi çi şêweyî dîhar dibû, ber ku bîranîn ji îmkana wê yekê didin. Weke min got, her ku welatevîntîya Simo nava jîyana wîda hertim û bi pir şêwan eyan dibû, ezê li vira her bi tenê meselek, bûyereke k'ivşbûna wê welatevîntîyê bînim navê ya ku bi tecrûba me ya gelekî balkêş û xisûsîyê bona karaktêrê / xeysetê/ Simo.

A bi vî awayî, ez dil dikim li vê tangê, rasttir, vê beşa pirtûka xweda bîranîneke xwe ya ser Simo raxim ber çevê xwendevanan, ya ku girêdayîye bûyerekêra, kîjanê berîya nîv sedsalîyê / qurnê/ dest daye, lê hê jî bi awakî geş bîra mindane û tê qeyî bêjî berîya çend mehan bi cî hatîye. Bona gotina me bêtir konkrêtbe ez dikarim bêjim, ku buyer ya sala 1964-ane. Ez wî zemanî bi malbeta xweva nû hatibûm Yêrêvanê, piştî temamkirina perwerdebûna xwe di ware kurdzanîyêda, bi tayîbetî di ware dîroka Kurdistanêda li Lênîngradê / niha Pêtêrbûrg/. Lê Simo hela hê li Elegeza nawça Axbaranê se-

rokê nexweşxanê bû. Eva sala duyemîn bû, gava rêjîma Bexdadê ya BAAS-îyê li Îraqê li kurdên Kurdistana Başûr hatibû xezebê û hewil dida serhildana kurdan bi seroketîya Barzanîyê Nemir nava gola xwînêda bixeniqîne. Wî zemanî bi saya kar û barê Nemir li Sovyêtîstanê hukumeta Yektîya Sovyêtîyê bi seroketîa Nîkîta Xrûşçov eşkere piştgirîya Tevgera Azadîxwezîya kurd bi temamî û serhildana kurdên Kurdistana Başûr bi taybetî dikir. Gava rêjîma Bexdadê li kurdan hate xezebê- hukumata Sovyêtîyê nota şikyatkirinê, protêstokirinê li ber hukumata Îraqê da amedekirinê, di kîjanêda zor û zulma wê hukumatê himberî gelê kurd bi awakî sert, hişk, bi tundî bi sûc kir. Bilî vê yekê, hukumeta Sovyêtîyê rê da kurdên Sovyêtîstanê, ku ew jî yalê xweda weke kurd wê zor û zulma BAAS-îan himberî xûşk û birên xwe bi sûc û protêsto bikin. Rêke berfirehtir bi taybetî jî bona kurdên Ermenîstanê hate vekirinê, ber ku ev komara Sovyêtîyê bibû navenda çanda kurdî ya here mezin. Destûr dan wan kurdan û bi taybetî yên ronakbir, ku bi rîya weşanên bi kurdî yên Radîyoya Yêrêvanê bi parastina kurdên Kurdistana Başûr û doza wan ya heq, ya rast xwe kivş bikin. Lê Simoyê welatparêz di nava wê rewşêda çi bike?. Evê te, weke bi vî awayî jî dibêjin, perene qalin bi xwera hildide, tê Yêrêvanê bal hogirekî xwe yê nêzîk Şerefê Eşir / Şerefê Çerkez Aşîryan/, ku wê demê serokê beşeke rojnema kurdî ya " R'ya t'eze" bû, lê piştra di ware dîroka Kurdistanêda bû pisporekî bi nav û deng, navê doktorê zanînên dîrokî û profêsor qazanc kir. Simo pêşnîyar dike, ku herdu heval bi hevr'a, bi navê xwe têlêgiramekê / berqiyakê/ ser navê sêkrêtarê giştî yê Organîzasîyona Miletên Yekbûyî Û Tanra binivîsin û bi rê bikin, di k'îjanêda ji wî rica bikin, ku ew temamîya tehsîra Organîzasîyonê, otorîte, rûmeta xwe bi kar bîne, mesref bike ji bona rawestandina zor û zulma rêjîma Bexdadê himberî gelê kurd. Û hema usa jî dikin. Piştî amedekirina têksta têlêgiramê evana li Yêrêvana paytextê Ermenîstanê diçin posta Navendî / sêntral/ û ji serokê wê rica dikin, ku wê têlêgirama wan bighînin ber destê Û Tan, her çiqas jî bona rêkirina wê mesrefeke giran ya peretî pêwîstbe. Simo hema

usa jî berpirsîyarê postêra dibêje: " Ez amedeme bona bi rêkirina vê têlêgiramê çiqas pere pêwîstbin haqasî mesref bikim". Mirovên ji nifşa niha, îroyîn dijwar ji vê ricakirina Simo û vê amedebûna wî jî bona mesrefkirina gelek peran fem bikin. Têknolojîa îroyîn îmkanê dide, ku neme û têlêgiraman hema bê mesrefkirina pera bi rê bikin û her bi tenê bibin hewcê têxnîkayê û têknolojîayê. Lê di wî zemanîda, yê ku em besa wî dikin, bi çêkirina bergîyake bi têksta berfireh ya weke neme, ku têlêgirama ser navê Û Tan jî ya bi eyînî awayî bû, dewa mesrefeke peretî ya pir mezin dikir, nemaze ew ser dûrayîke mezin dihat bi çêkirinê: " Nîyû-Yorka Ştatên Amêrîkaê yên Yekgirtî". Eva jî şûna xweda. Dewrana rêvebirîya Îosîf Stalînda şandina têlêgramekê ser navê serokê Organîzasîona Miletên Yekbûyî ji Yektîya Sovyêtê, bi destî rûniştevanên Sovyêtîstanê ne mûmkûn bû, tiştek dûrî mentîqê, hiş û sewda bû. Heger zemanê Stalînda du kesên weke Simo û Şeref bi daxweza şandina têlêgrameke ser navê berpirsîarekî li welatekî yanê jî weke Û Tan yê pir welatvan biçûna wê poştê ne ku bi tenê ew têlêgrama wan bi rê nedikirin, lê wê ew cî bi cî bigirtana û bavîtana hebsxana KGB / îstîxbarata Sovyêtîyê/. Wî zemanî çêkirina pêwendî û girêdana bi dervayî sînorra bona mirovên Sovyêtê bi temamî qedexe bû/, lê bi kurdên dervara û bona pirsa kurdî ya miletîyê tiştekî bi temamî dûrî lojîkayê, hiş û aqilan bû, yanê bi temamî ne mûmkûn bû. Bese em bîr bînin, ku rêvebirî, hukumeta Sovyêtê zemanê Stalîn û Molotovê wezîrê Yektîya Sovyêtê yê karên dervada tevgera azadîxwezîya kurd bi nav dikir wek ya fêodalî / yanê: paşverû û ajanî / yanê" beşdarên wê tevgerê û tevgera bi xwe ajanên dewletên Rojava yên împêrîalîstîyêne ku Sovyêta weke dijminên xwe yên- qane- qan didîtin/. A bi vî awayî, heger piştî mirina Stalîn atmosifêra li dewleta Yektîya Sovyêtîyê bona kurdan berbi qencîyê û xêrxwezîyê nehatibûya dîharkirinê Simo çiqas perên bi jimara mezin mesref bikirana jî tiştek ji wî kar û meremê, ku wî dabû ber xwe, çê nedibû.

Belê, ew ciwamêrê berpirsîarê poşta Sêntral soz dide Simo û Şeref, ku wê têlêgirama wan bighîne ber destê xwedîyê wê: Û Tan.

Piştî rojekê-dudyan poşt bersiva herdu ronakbirên kurd ser adrês û navê wan bi rê dike, di k'îjanêda wana bi îzbatan agahdar dike, ku ew nema wan ya bi şikilê têlêgiramê / berqiyayê/ gihîştîye Nyû-Yorkê ber destê birêz Û Tan. Ji şabûna lingê herdu hogiran, weke dibêjin, erd nagre, nemaze yê înîsîator, destpêkirê vî karî Simoê Şemo.

Li jorê em ji ber wê yekê dûr û dirêj ser nêrîna dewleta Yektîya Sovyêtîyê ya nêgative zemanê Stalînda himberî tevgera Azadîxwezîya kurd û ser guhêrandina nêrîna eyînî dewletê ser eyînî Tevgerê berbi qencîyê û xêrxwazîyê rawestîyan, ku şabûna Simoyê Şemo ya bê sînor jî bo xwendevanên me yên îroyîn bi temamî femdarî bû. Bê girtina ber hesêb faktorên li jorê kişvikrî ev karê Simo wê bi temamî neyê femkirinê. Em wan faktoran bihesibînin wek sebebên şabûna Simo yên objêktîv û vegerin ser sebebên, ku em weke yên sûbyêktîv dikarin bi nav bikin. Ew sebeb jî ji ruhiyet û karaktêr, ji hest û hiş, ji fikirandina Simo weke mirov û helbestvan dihatin. Piştî ji poştê stendina nema agahdarkirinê ya ser wê yekê, ku berqîya wî û Şeref ofîsa Û Tanda hatîye stendinê / bona wê agahdarkirina xwe jî Simo perên zêde dabûn/ û ew gihîştîye ber destê birêz Sêkrêtêrê giştî yê Organîzasîona Miletên Yekbûyî, weke zarokekê li Simo dest da, rastir, Simo demeke kivş bû weke zarokekê. Ez vê yekê weke şedê şabûna hogirê xwe ya bê sînor dibêjim. Simo ji cîyê karê xwe- Elegezê hatibû Yêrêvanê, navenda çanda kurdî, ku heval û hogirên xwe yên ronakbir, berîya hemûşka yên kurd, û eva yeka bi temamî femdarîye, agahdar bike ser şandina berqîya xwe û Şeref û stendina bersiva qenc /pozîtîv/. Gava rastî yekî ji wana dihat yanê jî diçû bal wî, jêra digot: " Haya te ji berqîya me ya ser navê Û Tan heye?. / Ez li vira kurtebirî gotina wî tînim navê/. Gava wî bigota " na"- Simo wê gave dîroka şandina berqîyayê ya naveroka wê jêra şiro vedikir, lê heger haya wî jê hebûya wê gavê Simo pir kêfxweş dibû. Yên ku haya wan karaktêrê Simo baş yanê jî qet tunebûnhew tire ew bi vê gera xwe ya nava heval û hogiran, nasan quretîyê û pozbilindîyê dike û dixweze wan agahdar bike, ku karekî welatevîntîyê yê wa mezin bi dest anîye. Lê yên ku baş haj karaktêrê Simo hebûn û ez jî bi pêra em qet ji ser wê fikirê nîbûn, her ku me zanibû, ku quretî û pozbilindî ne pêşê Simoye, ku ew xwe hertim biçûk bivîne. Lê ev çi hewalê Simo bû, çi lê dest dabû, ku gava cadê kûçêda jî rastî nas yanê hogirekî xwe dihat, dest xweda destê xwe dibir berîka xwe, ji wira dokûmêntek derdixist û destbi gotina xwe ya ser bi rêkirina berqîya ser navê Û Tan dikir. Ez nizanim kê bi çi awayî ev helbest, ev kirina wî dinirxand, lê min û hogirên meyî dinê, ku baş haj karaktêrê Simo hebûn, me demên usa ew dişiband zarokekê. Belê me dişiband wê zarokê ya ku şexsekî, kesekî gelekî jê hiz dike dîyarîke xweşik û bi dilê wê zarokê dide. Ew zarok jî, weke pir zarokên dinê, dilezîne bal dê û bav, xûşk û bira, heval û hogirên xwe, dike hewar û gazî, wê pêşkêşa bona xwe ya giranbiha nîşanî wan dide, ber ku bedena wî bi şabûn dagirtîye hetanî dawîyê, haqasî, ku hew dikare xwe bin wî barê giranda ragire. Û loma jî dilezîne wê şabûnê bi mirovên dinêra paraveke. Ev şabûna bê sînor ji sirîya xweda Simo dikir wek zarekê, ber ku ji ber şabûna wî awayî, bi wê pîvanê bêhtir hesten mirovan "kar" dikin, ne ku mejû, hiş û sewda. Evên dawî wek motorekê nemaze dema xemgînîyê" kar" dikin. Heger em bi awakî kurt û kese bêjin, Simo wan rojên, ku ez besa wan dikim, bibû weke zarekê û carna jî ber şabûna bê sînor jî bîr dikir, kanê ev besa xêrê, ev mizgînî li kê daxistîye û li kê- na. Loma jî, rastî yekî nas dihat berîya hemûşkî jî dipirsî, jê pirsîyar dikir, kanê mesela xwe- Şeref Û Tan jêra gotîye, yanê na.

Bilî şabûna bêsînor ew gera Simo nava mirovanda bona agahdarkirina wan ser wê kirina xwe awa ji çi jî dihat: Simo helbestvanê eslî, bi kemal û xwezayî, tabîl bû, gorî wê jî xudanê hest û hisên nazik, dilê sax, bawarkirina zû bi zû, weke dibêjin, xêfikê dilê xwe bû. A ev Simo dilezîne bal heval û hogiran, qewim û pismaman, nasan, ku bi wanra şabûna xwe pareveke, nîvî bike. Belê, Simoyê helbestvan yê warê polîtîkayêda negihîştî û nepijîayî hew tirê, ku heger bersiva stendina berqîyaê ji ofîsa Û Tan hatîye stendinê û têda tê gotinê, ku ew gihîştîye ber destê xwedîyê wê / yanê: Û Tan/,

usane, eva weke wê yekêye, ku sêkrêtêrê giştî wê şerê dijî kurdan bide rawestandinê.Yên ku Simo û karaktêrê wî baş nas dikirin û min jî bi wanra bi dîtina şabûna Simo ya bi vî awayî em dihatin bawarkirinê, ku agahdarkirina me ya ser vê faktê qet jî ji qiretî û pozbilindîya wî nayê, lê netîca şabûna wî welatevînê bi şewate, ya bê sînore boyî xatirê xilazkirina gelê wî ji xezeba rêjîma Bexdayê. Gelê kurd lawên weke Simoyê Şemo welatevîn tu zemana jî bîr nake.

SİMO Û XWENDİNA HELBESTAN

Gava berevok, pirtûkên efrandinên Simoyê Şemo bi giranî bi şikilê helbestan ya nû dihat weşandinê û dighîştine ber destê min, bawar bikî min ew nedixwend yanê jî nav-navara dixwend. Û hûn zanin sebebê wê yekê çi bû? Hilbet, qet jî ne ew bû, ku ew helbest bi min xweş ne dihatin, bala min nedikişandin. Bilî ekis, her helbesteke Simo ya nû cîhaneke xweşike nû li ber çevên min vedikir, têl, sîmekî hest, hisên min yên nazik ji cî dileqand, dihejand û dilerizand. Sebeb her bi tenê ew bû, ku min hela hê berîa weşandina wê pirtûkê hema hema hemû helbestên di wêda bi cîkirî û çapkirî " xwendibûn", rasttir bihîstibûn, gava ewana hela hê xav, ne temam kelyayî û pijîyayî bûn, şiveta wî nanî bûn yê ku nû ji tendûrê derxistîbûn: xudan hela hê pêra negîhandibû wana careke dinê bixûne û serrast bike. Simo ew helbestên xwe bawar bikî hema di roja efrandin, nivîsandina wanda ji minra dixwendin, ber ku ez û wî hemû rojên kar û bara rastî hev dihatin. Ez sibê zû diçûm bal wî li cîyê karkirinê- polîklînîka xwendikaran, ku li ser rîya min bû, ser cada Yêrêvanê ya Têryanê, çimkî kar û barê minî di radîyoyêda / beşa weşanên bi kurdî/ piştî nîvro destpê dibû girêdayî zemanê stendina piranîya matêrîalên boyî weşandinê / deng û bes û şirove/ bi têlêtaypê ji Moskvaê bi zimanê rûsî, ku min piştra ew weldigerandin ser kurdî. Lê karê Simo îdî seheta 11-a diqedîya, temam

dibû. Di wê navberêda, hetanî destpêbûna karê min kêf- kêfa min û wî bû, çimkî çend katjimêr / sehet/ bin bandora meda hebûn yên ji kar û baran azad. Gelek caran em ji polîklînîka wî radibûn diçûn xanîyê rêdaksîona rojnema me ya "Rya teze", ku li ser rîya me bû ya çûyîna berbi nava bajêr: li ser cada Îsahakyan. Me li wir bi çûyîn û amedebûn, bi axaftin, henek û laqirdîyên xwe dilên hogirên xwe yên li wir kar dikirin xweş dikirin, lê hilbet em bi xwe jî bi dîtin û guhdarkirina wana dilşa û dilbaristan dibûn û piştî vê hevdîtinê ez û Simo wa hêja derdiketin ger û seyrana nava bajarê giran- Yêrêvana paytexta Ermenîstanê. A hema di wê rêda, di wê rêwîtîyêda, hema li derva, li ser cadan Simo helbestên xwe yên tezenivîsî ji minra dixwendin.

Nemaze havînan, gava qije-qija tevê bû, kîne- kîna germa Yêrêvanê bû, ku asfalt diheland, ji bona berdewamkirina sohbeta xwe em dadigerîyan aşxanekê yanê jî rêstoranekê û me li wir bi avca mutulgên qişagirtî dil û hinavê xwe hênik dikir, xwîdana xwe sar/ rasttir- ziha/ dikir û me hêja xatirê xwe ji hevdu dixwest, em ji hev vediqetîyan bi hêvîya rasthatina roja peyîra.

Carna jî em bi mêvanî diçûn mala hogir yanê jî psimamekî xwe yê nêzîk, ku şurîya me lê dibuhurî û me zanibû, ku bi hatina me ya li mala xwe ewê pir kêfxweşbin. Li wir jî sivira xwarin- vexarinê, kêfkirinê dihate navê.

Ez li vê tangê jî bîr nekim bêjim, ku edet torekî wa bal me herduyan çê bibû: mesrefa xarin- vexarina li derva bi piranî Simo dikir: weke xwe hercar, gorî karaktêra xwe ya mêrê comerd û nandar. Û ne ku tenê bi minra wisa bû, lê bi heval û hogirên dinêra jî. Simo degme dihîşt heval û hogir dest bibin girfan, bêrîkên xwe, gava bal wî pere hebûna.

Jîyana me wa berdewam dikir, lê rojekê jî buyer, rasttir, gotebêjeke ecêb û balkêş ya bi hûmorê, henek- laqirdîyan dagirtî navbera me herdûyanda çêbû.

Belê, rojekê weke her cara ez û Simo dîsa derketin seyrana xwe. Havîn bû. Gava em ji odên rêdaksîyona rojnama "R'îya teze" yên

hênik derketin / ew ode li qatê yekemîn bû û keyîsa wan wisa bû, ku bin avayê çendqetêda tîrênca tavê nedida nava wan/ germa derva li min dijwar û giran hat û ji ber wê yekê jî ez dilê xweda wa fikirîm: " Ya Rebbî, tu rehmekê bavêjî dilê Simo, ew me bibe dora sivira avca sar bide rûniştandinê". Hiş û sewdayê min bal avcê bû, lê Simo jî weke xwe cara, wek herroj dîsa li berîk û girfanên xwe dixurdilî. Ewî sivte destekî xwe bire berîkeke xwe û ji wira kaxezekî hevekî qerçimî û bi destnivîsara xwe dagirtî derxist cîhana ronik. Min bê xwendina naveroka wê destnivîsarê, ku ji dûrva ew yek ne mûmkûn bû jî, zanibû, ku ew têksta helbesteke wî ya here nûye. Hema di cadêda, dema meşandina me ewî ew helbest, bi heyacan xwend û gava temam kir hêja berê xwe bi minda kir û li çevên min mêze kir. Îdî bêyî axavtina wî ya bi minra min ev gotin, ev pirsîyar di çevên wîda "xwend": "Hi, çawa bû?". Min, weke dibêjin, tawê da bersiva wî da: "Helbesteke rind, xweş bû". Em çend gavan jî wêda çûn. Na, min bala xwe dayê dîsa tabetî nakeve Simo û ew li berîk û girfanên dinê dixurdile. Vê care jî kaxezek destxist ber ronîyê, xwend. Ez ya xwe bêjim, min vê care dengê wî yê xwendina helbestê nebihîst, çimkî wê demê hiş û sewdayê min ne ku bal Simo bû, lê li bal sivira avca cemidî. Ê, qe dibe ez bêjim: "Min nebihîst". Wê ne bi eşreke, lê di dilê xweda ji min bixeyîde û ezê bibim sebeb, xenîmê risqê xwe. Û ji ber vê yekê jî, gava ewî awazê axaftina xwe guhêrî û pirsî: "Eva çawa bû?", min xwe şûna guhbihîstîyê helbesta wî danî û ev bersiva jî bona pirsîyara wî derengî neêxist: " Qusûr t'unebû".

Piştî êmekî helbest sêyemîn jî minra xwend bersiva min ya vê care jî ev bû: " Eva jî herdûyên dine çêtir û xweştir bû". Xulese, ez serê we xwendevanên xwe pir neêşînim, boyî helbesta çaremîn min gotê: " Simo, eva sertaca hersê helbestên dinê bû, ewana weke gelê me dibêje, qe nayên mizginîya wê". Lê vê carê şûna kêfxweş bibe, bengizê Simo xeyîdî, şûna rûgeşîyê telayî û tirşayê xwe avîte ser rûyê wî û bi curê gazinan û hinekî bi hêrs ji minra got:

- Kuro, Wezîr, xwedê mala te ava bike, te heman hellbestara got:

"Rinde", "Qusûr t'une", "Eva ji ya dinê çêtir û xweştirbû". "Eva sertaca hemûşkane", ev çawane, qet yeke sist, yanê jî hevekî kêmasî û qusûra wê hebe, yeke ne haqasî baş di nava vî hizêmetê helbestanda t'unebû?.

Min dest xweda bersiva wî da:

- Simo, tu min şûna femkor û heqmaqa datînî, çiye?

Simo jî nişkêva cîda, weke mirovekî ji tiştekî bitirse, vecêniqî û got:

- Haşa ji te, çima xwera wisa dibêjî?

- Lê ez çawa bêjim, - min bersiva wî da.- Ez ku qusûr û kêmasîyê bînim, lapî kêm ser helbesteke te, belkî tu ji min eşkere û gelekî nexeyîdî, lê dilê te wê bive neve biquse, bişkê. Û gava dilê te şikesttê min jî, avcê jî, ku hergav havîna ji minra dikirî, ji bîr bikî û piştî demekê tê xatirê xwe ji min bixwezî û berê xwe bidî mala xwe, herî... Ez feqîr û hêsîrê Xwedê ber vê teva sincirî ku agir û şewatê bi mirov dixe, li wan orta perîşan û sergerden rawestim û dilê xweda çêrî xwe bikim: " Min çi anî serê xwe, ji boyî gotin, peyveke ne bi dilî Simo xwe kire vê rewşa giran. Çi kula min sistbûn yanê jî başnivîsa helbesta wî ketibû, çima bi gotina min Simoyê baş yanê jî ne rind binivîse?. Hazir te hemû helbestanra bigota: " Başe". Ev gotina te ya derew bûya jî, lê tê piştî êmekî ne dirêj qurbet- qurbet dora sivreke odeke hênikda rûniştayî û teyê avca weke avên kanîyên çîyayê Elegezê cemidî vexara û teyê ev gera hanê jî bîrkira".

Gava min wa got, Simo jî nişkêva wisa zerp û bi hêbet kenîya, ku hêsir ne ku ji çevên wî jorda barîn, lê bijiqîn, pekîyan. Demekê ji kena axavtin bi wî nedibû, lê gava zor dida xwe, emekî kin kenê xwe dida birînê û dixwest tiştekî bêje, ken dîsa pê digirt. Piştî demekê axavtin bi wî bû, lê bi zemanekî pir kin, haqasî, ku wî her bi tenê pêra digîhand bêje " Serê bavo..." Piştî wan herdu peyvan, ku sonda Simo ya here pîrozî bû, dîsa ken bi wî digirt. Xulese, gava kenê wî qedîya, hêza kenandinê di wîda nema, hêja gotina xwe berdewam kir hetanî xilazbûna wê:

- Serê bavo, te tiştekî haqas bi cî û war, xweş got, ku hetanî mi-

rinê ez ji bîr nakim. Û ezê vê gotina te bi lawikên me bidim hisandinê, hem jî ronakbîrên mera bêjim. Sivetirê, bawar bikî, hemû ronakbirên me yê, li Yêrêvanê haj vê bûyerê û vê gotina min hebûn: Simo derheqa vê yekêda bi telefone gelekara gotibû. Wan gelekan jî sirîya xweda yên dinê ser vê bûyerê û gotinê agahdar kiribûn. Û, weke dibêjin, li Yêrêvanê û hetanî dervayî wê jî, bû şare-war. Gava rûniştevanên kurd wan rojan rastî hev dihatin peyîv û gotina wan ya yekemîn ev bû: "Te ya Simo û Wezîr bihîstîye...".

...„NE DA-NE STEND„

Çi salên xweşîyê, şayê, xêr û bereketa çanda ruhî, geşevedana moralê bûn bona me kurdê Ermenîstanê salên sedsala 2O-î yên 5O-î, 6O-î, 7O-î, 8O-î, ku em dikarin bi tevaya xweva bi nav bikin wek sedsala çanda kurdî ya zêrîn. Her çiqasî jî ev hilperîna çanda kurdî bi destî rêjîma Yektîya Sovyêtê ya komûnîstîyê, dîktatorîyê dihat bi cîanînê- ev yeka ne ku ji karaktêrê wê rêjîmê dihat, lê bi giranî ji motîvên polîtîkî. Lê çi jî hebe, berên vê polîtîkayê, netîcên wê yên qenc û baş bûn ji bona kurdên Ermenîstanê.

Piranîya rûniştevanên kurd yên Ermenîstanê li navçê warên gunda diman, lê paytextê vê komarê bilî navenda çanda kurdî, ber ku ocax û rêxistinên çanda kurdî li vira hatibûn konsêttîrekirinê. Yek ji wana jî sêksîya, beşa nivîskarên kurd bû, ku di nava goveka Yektîya nivîskarên Ermenîstanêda kar û barê xwe dîmeşand. Ewê bilî kar û barên xwe yên bingehîn şevên sersalên nivîskarên kurd jî organize dikirin. Ew şev sera mala nivîskaranda dihatin kivşkirinê, ku dihesibî wek navenda admînîstrativî/ rêvevebriîyê/ ya Yektîya Nivîskarên Ermenîstanê û ber ku sêksîya nivîskarên kurd dihesibî wek şaxekî wê yektîyê nivîskarên kurd ew mal bi mafên temam dihesibandin wek mala xwe jî. Û gava sersaleke hobêlîyanîyê ya nivîskarekî kurd temam dibû gorî agahdarkirina serokê sêksîyayê rêvebirîya Yektîya Nivîskarên Ermenîstanê û admînîstrasîya Mala

Nivîskaran sera wê malê roja kivşkirî vala dihîştin bona bi wir bi cîanîna şeva rojbûyîna nivîskarê kurd. Bi serda jî çend serokberpirsîyarên Yektîya Nivîskarên Ermenîstanê wek nîşana rêzgirtinê himberî nivîskarê kurd beşdarî wê şevê dibûn. Sêkrêtêrêkî Yektîya Nivîskarên Ermenîstanê, nivîskar Mikirtîç Sargsyan hemû şevên wada her dem amede bû, ber ku rêvebirîya yektîya nivîskaran şêftîya nivîskarên kurd dabûn destê wî. Hemîn kurdhizên weke Zarzand Darîyanê nivîskarê ermenî hemû şevên kurdanda amede bû, bi hogirên xwe yên kurdra bi tevayî pêşketina edebyeta kurdîra kêfxweş û serbilind dibû, bi şabûn guhdarîya stiran û awazên kurdî dikir.

Şeveke ji wan şevada bûyereke ecêb çê bû, ku girêdana wê ya bi min û hogirê min yê gorbuhuşt Simoê Şemora hebû, rasttir, em herdu bûn pêrsonajên vê bûyerê yên serekîn. Ew bûyer, ew şev bi temamî baş bîra min tên, lê şev bi mûnesebeta roja bûyîna kîjan nivîskarê me hatibû organîzekirinê- eva yeka ji bîra min çûye. Û sala çêbûna şevê jî nayê bîra min, lê her bi tenê ez zanim, ku ew saleke ji salên 8O-î bû.

Sera bi beşdarên şevêva kimkimî bû û ber ku kursîyan têrê nedikirin gelek ser pîya ber dîwaran rawestîyabûn. Sebebê çêbûna vê rewşê ew bû, ku bilî ronakbirên berhemdar, ku piranîya wan li paytextê Ermenîstanê- Yêrêvanê dezgeh û organîzasîonên çanda kurdîda kar dikirin gelek keç û xortê kurdan zanîngehên eyînî bajarîda dihatin perwerdekirinê. Em derheqa wan karkerên kurdda navêjin, yên ku bibûn rûniştevanên Yêrêvanê.

Kurdên ronakbir, bi giranî yên mamostên dibistanan, her usa jî yên rêncber / şivan û gavan/, cotkar hetanî ji gundên dûrî Yêrêvanê jî dihatin wan şevan, ber ku ewana çend rojan berîya çêbûna şevan derheqa bi darxistina wanda agahdar dibûn bi agahdarî, îlanên ku ser rûpelên rojnama kurdî, ya "Rya teze" dihatin çapkirinê û bi radîyoya kurdî dihatin belavkirinê. Dûrbûna gundan ji Yêrêvanê li ber çûyîn- hatina rûniştevanan weke berê nikaribû bibûya asteng, ber ku problêma transporta civakî zûva hatibû helkirinê, em îdî der-

heqa wê yekêda nabêjin, ku hinekan jî xwera otomobîlên şexsî yên bona neferên malê dikirîn.

A bi vî awayî, bawar bikî hemû rûnlştevanên Ermenîstanê yên kurd bi awakî dîrekt û êndîrêkt beşdarî şevên wa dibûn, ber ku yên ku şevanda amede nedibûn derheqa wanda agahdarî ji beşdaran distendin yanê jî agahdarîyên berfireh rojnamên komarêda dixwendin, bi têlêvîzîonê û radîyoyê temaşe dikirin û dibihîstin.

Weke hemû şevên dine dawî li beşa vê şevê, ya ku em behsa wê dikin, ya axavtina gotarvan /dakladvan/ û axavtinkerên dinê hat, ku em hetanî warekî jî wek beşa ofîsîyêl dikarin bi nav bikin, ji kîjanêda weke qanûn gotarvan û axaftinker nêrîn û tecrûbekirinên xwe ser xudanê hobêlyanê / sersalê/, pêşkêşî guhdarîya beşdarên şevê kirin. Piştra dest bi beşa şevê ya dûyemîn bû, ku weke beşa bedewî yanê ji konsêrtê tê bi navkirinê. Bilî stiran û awazên dengbêj û mûzîsîyênan hinek berhemên nivîskaran jî weke herçar gotî vê şevêda bihatana pêşkêşkirinê. Ewana bi giranî berhemên bi naveroka kurt, yên hûmorê û satîrayê bûn, ku pêşkêşî guhdarîya beşdarên şevê dikirin ji bona şakirin û kenandina wan. Wê şevêda karê rêvebirîya wê beşê rojnemevan Cemalê Ûsiv hilgirtibû destê xwe, ku beşa weşanên kurdî ya radîyoya Yêrêvanêda wek nûçegîhan kar dikir. Berîya ku Cemal dest bi karê xwe yê îlankirina naveroka beşa şevê ya dûyemîn bike bi navkirina xudanê berhemên ku gotî pêşkêşî guhdarîya beşdarên şevê bihatana kirinê, lê her usa jî bi navkirina sernavên berheman bikin, haya min qet jê nîbû, ku novel, çîrokên min jî xistine nava bernama şevê ya bi sernavê " Neda- ne stend" ku berîya hingê berevokekêda îdî hatibû weşandinê. Wek rûniştevanên gundê min- Pampê yên henek û laqirdîkir wê li vê tangê bigotana, ev novela min koreqedêra xistibûn destpêka bernama beşa şevê ya dûyemîn.

Cemalê Ûsiv ji kûraya sehna serayê bi bejina xwe ya kine qalin, bi meşeke lez hat ber kevîya sehnê ya raste-rast pêşberî cêrgên kursîyan, ku beşdarên şevê li ser wan rûniştibûn, rawestîya û ji ber wê yekê, ku cara yekemîn nava jîyana xweda rêberî li beşa şeveke

wa giran û bi berpirsîarî ya bedewî dikir, loma jî îtîmale, ku ji şerma û bi serda jî li ber tirs û xofa ji berbi cîanîna karê axavtinkerê di wî warîda xişîm, bê tecrûbe, bê hemdî xwe çûye xwe tirs û tel kiribû û bi dengekî bi ricaf mîkrofonêda ne virda û ne jî wêda, wa qîr kir: "Wezîrê Eşo ne da- ne stend". Ji ber vî hemûşkî, bi taybetî ji ber awa û awazê anîna vê hevokê li ser zar û naveroka wê hevokê bi xwe ya cabeke ne bi xêr bawar bikî bal tu beşdarekî şevê şubhe nema, ku Wezîrê Eşo jî nişkêva mir, can da. Hetanî mirovên ku berîya destpêbûna şevê, berîya çend deqan jî ez divînim û me slav û kilav jî li hev kiribûn, ser vê gotina Cemal ji nişkêva ji cî vecêniqîn û çevên xwe li herçar yalê şayê gerandin ji bona dîtina min, her çiqasî jî, weke me got, gorî gotina Cemal şubhe nedima, ku Wezîrê Eşo ji nişkêva mir. Ji ber vê yekê jî piştî vê gotina Cemal dengekî usa ji amadên şevên çêbû, ku mirov saw lê digirt, çimkî ew dengê dîharkirina tirs û xofekê û bi serda jî ji heyfanîn, dilêşîya amadên şevê bû: him yên ku Wezîrê Eşo rind, nêzîkva nas dikirin, him jî yên ku ji dûrva navê wî bihîstibûn. Yên ku berîya destpêbûna şevê bi demeke kurt Wezîrê Eşo avayê mala nivîskaranda dîtibûn û bi wîra axavtibûn jî ewana jî piştî vê gotina Cemal kirin "wîşîn", "axîn", ber ku mirina her mirovekî ya gorî naverok û lojîka kurdî ya hevoka ji peyvên "neda- ne stend" dikare nava êmekî herî kurtda çê bibe: ji rawestandina dilik.

Belê, bawar bikî hest û hisa tirs û xofê bal hemû beşdarên şevê çê bû bilî çend kesên ku li tenişta min rûniştibûn û di nava wanda Simoyê Şemo ku dema vê gotina Cemal zivirî li min mêze kir, ne ewe bi çevên xwe careke dinê jî bivînin, kanê ez bi rastî mirime yanê weke berîya demekê zêndîme yanê jî, kanê vê gotinê tehsîreke bi çi awayî ser min çê kir. Her bi tenê yê xwe şaş nekir, nexapîya û di nava hemûşkanda û berîya hemûşka bi awakî eşkere rêaksîyona xwe himber vê gotina Cemal kivş kir- Simoyê Şemo bû, ku weke hercar kîp li tenîşta min rûniştibû. Ez dikarim bi bawarî bêjim, ku hela hê ev dengê heyfanînê nehatibû birînê, ku berdewama gotina Cemal ya dîrekt, bê navbirî bû, gava Simoyê Şemo hindavda ji cî

qulozbû, destekî xwe berbi sehnê, konkrêttir berbi Cemalê Ûsiv dirêj kir û bi dengekî bilind, bi awayê gazinlêkirinê û serdahêrsbûnê tevî hev serda qûriya:

-Kuro, Cemal, belkî devê te bişkê, tu çawa navê mirinê tînî ser vî hogirê minî ezîzî sipî- silamet, ser Wezîrê Eşo, gava ew vaye li tenîşta min rûniştîye.- Piştî vê gotinê Simo destê xwe avîte girka milê min, hetanî hêza wî têrê kir ew hevraz kişand û bi serda ev gotin anî:- Wezîr ca rabe ser pîyan bera ev xelq te bivîne, bera pê bihese, ku tu şikir ji Xwedêra, sax û silametî, zêndîyî di nav meda.

Hilbet, piranîya xelqên seraêyda amede haj Simoyê Şemo, henek û laqirdîyên wî hebûn, ji ber vê yekê jî pir zû serva çûn, ku di bin van gotinên wî yên tel û tirs, yên bi hêrs û kinda gotinên hûmorîyê, henek û laqirdîyan hatine veşartinê û sebebê bingehîn zanîna vê yekê bû ku Simo hela hê peyva xwe temam nekiribû, gava pîrqîn li xelqê serayêda amede ket. Xelq piştî vê gotina Simo ya bi henek û laqirdî tê gihîşt, kanê rûyê peyvandina Cemal, ya şaşda çi tiştekî ecêb, çi mesqere çê bû. Kenê xelqê demeke dirêj kişand, çimkî bilî wê yekê, ku henek û laqirdîya Simo pir xweş û bi cî û war bû, ewê şabûna boyî tiştekî dinê jî kire dilê xelqê: ya li ber zêndîmayîna Wezîrê Eşo. Hemûşk dikenîyan bilî du kesan: Cemal û Simo. Cemal ji berbi derengî femkirina şaşîtîya xwe ya zimên, ya axavtinê ya mezin cîda bibû risas, çila bibû sekinîbû, nizanibû çi bike, ku ji nava wê rewşa giran derkeve. Lê Simo gorî karaktêra mirovên eyînî henekçî, eyînî laqirdçî nedikenîya. Sura tehsîra henek û laqirdîyên wî û yên weke wî di nava wê yekêdane, ku gava henek û laqirdîkê dikin û xelq dikene- ewana bi xwe pir ciddî, pir sêriyoz dimînin, ku giva tiştekî ecêb û kenandinê çê nebûye. Hema eva yeka jî tehsîreke pisîkolojîyê ser mirovên li dora henek û laqirdîkiran çê dike, gava ewana li reng û rûyê laqirdîkiran mêze dikin û divînin, ku ew bi cîanîna henek û laqirdîya xwera sêrîyoz, siddî dimînin û ew yeka bêtir kenê guhdarvana tîne. Lê tiştê herî metelîmayînê ne haqasî ew bû, ku Simo berîya hemûşkan, pir zû şaştîya Cemal tecrûbe kir, lê ew bû, ku wî ew gotina Cemal dest xweda kir çevkanî û vanana li

hevanîna laqirdî, hûmoreke pir balkêş, yeke usa, ku hemû beşdarên şevê dan kenandinê û şakirinê, lê piştra jî bawar bikî hemû rûniştevanên Ermenîstanê yên kurd: bi demeke dirêj: ez dikarim bê şubhe bêjim, ku hêza humor û satîra, laqirdîyên Simo di nava vê yekêda bû, ku ewî hûmorêsk, laqirdîyên xwe pir zû li hev tanîn, disêwirandin: berîya me hogirên xwe-ronakbîrên kurd yên dinê û berîya gelek xelqên mayîn jî. Simo henek û laqirdîyên xwe pir zû, bi çêbûna bûyeranra bi tevayî li hev tanîn, em dikarin bi awakî dinê jî bêjin, ew henek û laqirdî germe- germ li hev tanin bê ku bihêle, ku buyer betsar bibe. Belê, gava bûyerek çê dibû Simo dest xweda kilît û mifta bi karanîna wê bona sêwirandina henek û laqirdîkê didît. Hetanî piştî çêbûna bûyerekê hişê me ronakbirên dinê bihata sêrî Simo îdî henek û laqirdîya xwe ya di mejûyê xweda sêwirandî eşkere dikir.

A bi vî awayî Simoyê Şemo yê helbestvan weke xudanê şuret, hest û hisa hûmorîyê- satîraê, henek û laqirdîyan jî bi kêrî civaka kurdî dihat. Ewî şev û şayên milet bi heneka û laqirdîyên xwe jî dixemilandin, şabûna beşdarên wan bêtir dikir.

Her çiqasî jî şaştîya Cemalê Ûsiv tê femkirinê, lê me dixwest, ku ew yek zelaltir kivş bibe. Şaşîtîya wî di ware zimên, rasttir, lojîka zimênda ev yek bû. Cemal gotî piştî hildana navê Wezîrê Eşo rawestek çêkira û hêja bigota " Neda- ne stend." Yanê jî bi vî awayî navê xudanê novêlê û sernavê novêlê bi xwe pêşkêşî guhdarîya amadên şevê bikira: "Niha bibhên novella Wezîrê Eşo ya " Ne da, ne stend". Em şaşîtîya Cemal û şakirina xelqê jî yalê Simoyê Şemoda bi vî awayî dikarin şirovekin û nemaze binirxînin, bi gotineke gelêrî:" Tune xirabî ya bêyî ku bi xwera qencîyê jî bîne". Heger Cemalê Ûsiv xwe şaş nekira Simo wê firsend û bahana lihevdanîna wê henek û laqirdîyê ji kîderê banîya?.

BAX Û BOSTANÊ SİMO

Hogirê min Simoyê Şemo jî weke gelek rûniştevanên bajarê Yêrêvanê û yên welête din yên karker û xizmetkar / evên dawî bi giranî ronakbir bûn/ ji şirîketa xwe ya doxtirîyê perçe, govekeke axê ya kivşkirî li perê bajêr stendibû, rasttir, ji dewletê, ber ku welatê Sovyêtêda bi rastî ax milkê dewletê bû. Ew percê wan axa bû ku bi sal û zemanan nehatibûn şovkirinê, bêcerkirinê, hildandanînê, xam û xopan tevayî li ser rûniştevanên bajêr paravedikirin, ku ewana ser wî erdî baxên fêkîyan binikînin, tov şitilên kûltûrayên bostanan biçînin û berê wan bax û bostanan jî bona razîkirina daxwezên neferên mala xwe bi kar bînin. Di nava wê axêda wek rûniştevanên dinê Simo jî avayîk dabû çêkirinê: jêrzemînek, odek li ser wê û eyîwanek, ku gava pêwîst bidîtana ew û neferên xwe li wir bi roj û şev jî bimana ji bona hildan- danîn, bêcerkirina bax û bostan him jî bona hêsabûnê. Ew dişibîya havîngehekê, her çiqasî jî ew ax li perê Yêrêvana li navenda deşta Araratê bû, havîna wê jî wek ya Yêrêvanê germ bû ji ber vê yekê jî nedişibîya eyînî havîngehê ya ku bi cî- warên, çîya, bilind, hênik , li zozanan tê çêkirinê û xwedîyê wê havîna ji ber germa bajêr direvin wir, ku li wira nava hewa hênike xweşda hêsabin. Ev havîngeh, bax û bostanê Simo li perê Yêrêvanê û rexê gundekî nêzîkî wê yê bi navê Xarbêrdêbû, li ser rîya berfireh, ku ji Yêrêvanê berbi bajarê Araratê asfaltkirî diçe. Hê çiqasî jî Simo bi karê doxtirîyê yê giranva gorî bû, gava zemanekî kivş jî li du cîya kar dikir, lê zeman didît vê havîngehêda bax û bostanekî baş bêcer bike û ya here mûhîm, berê wî bax û bostanî ne ku bi tenê bona neferên malbeta xwe mesref bike, li wan pare veke, lê weke emê bivînin, ji bona heval û hogirên xwe jî, ku hewcê wê yekê bûn. Yekî usa bû Simo, keda xwe, berê xwîdana enîya xwe ne ku bi tenê dikir xurê nefer, zarokên xwe, lê yê heval û hogirên xwe jî, gava ev yek ji bona wan pêwîst didît. Ez dikarim bê şubhe bêjim, ku parîkî xweş bê heval- hogirên nêzîk ber Simo, gewirîya wîda nediçû xwarê.

kurdlib.online

Carekê min jî wek hogirekî Simo feyda ji bax û bostanê wî vegirt.Bûyera ku dora stendina wê feydayê çê bû,, bûyereke balk'êş, întêrêsant û bi serda jî bi hûmorê û satîrayê dagirtî bû, eyînî weke hinek mîsal, bûyerên pêwendî û girêdanên min û wîyê, dinê. Lê ya here mûhîm, ew buyer, ev dîrok karaktêr, xeysetê Simo û ruhîyeta wî dîhar dike, ku zanîn, hajpêhebûna wê weke ya eyîankirina karaktêr û ruhîyeta hogirê min yê gorbuhuşt, bi serda jî weke helbestvan, şayîrê kurd yê bi nav û deng bona xelqên dinê û bi tayîbetî xelqên kurd ez gelekî muhîm divînim û loma jî min ev bûyera, ku min besa vê kir, xistîye nava bingeha naveroka vê çîrok, vê novela xwe ya bûyerî û weke hûn dibînin, ez wê jî tevî çend novêlên xwe yên dinê yên ser Simo û karaktêrê wî yên dîsa bûyerî dixim nava beşê vê pirtûka xwe yê bi sernavê " Peradanok".

Simo û pîreka xwe ya weke wî doxtir maaşekî baş ber karkirina xweva distendin û ji ber vê yekê jî dikaribûn hewcê berê bax û bostanê Xarbêrdê nîbûna, hemû fêkî, pincar bona malbeta xwe li bazareke Yêrêvanê bikirîyana. Lê Simo awa bona çi bi destxistina wî perçê axê, nava wîda çêkirina avayîkî havîngehê û bêcerkirina bax û bostanekî pêwîst didît. Berîya hemûşkî ewî ji bêcerkirina bax û bostanan hiz dikir, ber ku weke lawê gundîkî û rûniştevanekî deşta Araratê / Yêrêvanê/ ew ji çûktîya xweda fêrî kar û barê nava bax û bostana bibû, her çiqasî jî zemanekî jîyana xwe ya zarotîyê û xortanîyêye dirêj ewî li zozanên çîyayên bilind bi cî anîbû, çimkî kurdên deşta Yêrêvanê û mala bavê wî jî bi wanra bi tevayî pez xweyî dikirin û mehên bahar û havînan kerên pezê xwe gorî tradîsîyon, edetê, ku ji bav û kalan mabû, dajotin wan zozanên bilind, li kîderê konên xwe yên kurmancîyê vedigirtin.

Sebebê duyemîn ew bû, ku Simo ev der kire weke havîngehekê ji bona neferên mala xwe, her çiqasî jî, weke haya min jê hebû, ew nefer pir kêm diçûn wira, her ku hewcebûna wê yekê jî bawer bikî tunebû: ew der jî, weke me got, mina Yêrêvanê germ bû.

Lê sebebekî dinê jî hebû yê wê yekê, ku Simo bi şabûn ev perçê axê hilda û wira havîngeh da çêkirinê. Car-carna ewî heval û

hogirên xwe yên here nêzîk, here hizkirî vedixwendine havîngeha Xarbêrdê û li wira dora sivira kivavên goşt, mutulgên araq û şeravê xwerin- vexwerineke lezetî, kêf û şayîke temam organîze dikir. Simo di vî warîda pispor bû. Dora sivira kivavan û araq- şerava ji tirîyên baxê Simo çêkirî me hogirên wî yên ronakbir kêfeke xweş û bîrnekirinê bi cî tanî. Hemîn sohbeta me ya derheq û dora edebyet, çanda kurdî, ser berhemên me û hogiran jî şûna xweda.

A bi vî awayî, Simoyê ku ji jîyana bajêr, xireçir û dûkêlka wî aciz bibû, bi bêcerkirina bax û bostan, bi amadekirin û cîanîna kêf, xwerin- vexwerina dora sivira naz û nemetê xweş xwe pir baş, dilşa û serbilind didît. Simo ji xizmetkirina ber heval û hogiran, ber mêvanan hiz dikir, karaktêra nandarîyê nava ruhê wîda rûniştibû û ji ber vê yekê jî, gava wî desteke mênvanan bi rûspîtî, bi rûmetgirtineke baş verê dikir- ji şabûna lingê wî erd nedigirtin.

Carna jî Simo heval û hogirekî xwe mexsûs ji bona wê yekê vedixwend havîngeha xwe ku piştî xwerin- vexwerinê hinek berê bax û bostanê xwe pêra dayne ji bona neferên malbeta wî.

Rojekê jî sirê hate ser min. Gava rojekê ez û Simo weke hercar rastî hev hatin zemanê dema xatiran ewî ji minra got:

- Wezîr, ji bîr neke, sivê xwera du tûra bîne, emê herin havîngehê, fêkî û bexrên bostîn gihîştine, belkî zarokên xwera hine tişt dibî.

Sivetirê ez bi tûrên xweva li cîyê karê Simo bûm, ku piştî dawîhatina karê wî dora katjimêr 11-a /kar û barê Simo li polîklînîka xwendkaran zû xilaz dibû/ em bi tevayî berbi havîngeha Xarbêrdê rêkevin. Min li malê mexsûs tûrên here mezin hilbijartibûn, ku gelek fêkî û sewze têda bi cî bînin. Gava min tûr hildibijartin ez dilê xweda wa difikirîm: " Ez çi zanim, careke dinê îdî kengê rehm bikeve dilê Simo û ew berê bax û bostanê xwe bide min. Bilî wê, yên weke min gelekin, hetanî careke dinê sirê bê ser min belkî salek- dudu bibuhurin".

Havîn bû. Her çiqasî jî berî nîvro em rê ketin, lê germa Yêrêvanê îdî xwe bi me dida hesandinê. Weke hergav em bi otobûsê berbi Xarbêrdê rê ketin. Min vê carê baştir, weke dibêjin, bi çevên mişte-

rîkî, kiryarekî li bax û bostanê Simo mêzekir. Ez ser pisporîya Simo di ware bêcerkirina bax û bostanda şaş û metel mam. " Simoyê ku piranîya zemanê jîyana xwe ser xwendina li dibistanê û zanîngehê mesref kiribû, beşek jî ji wê jîyanê li zozanên bilind buhurandibû, kengê pêra gîhand bibe pisporê hildan- danîna bax û bostanan",- ez dilê xweda fikirîm. Bilî pisporîyê jî bona bêcerkirina bax û bostanekî wa xebat, karkirineke bi dil û can jî pêwîst bû. Sêv, hurmê, şevtelî, tirî baxê Simo sor û zer dikirin û teyê qeyî bigota bi van peyîvan ez vedixwendim boyî xwerina xwe: " Me biçîne û bide ber geza, ber dirana, tuyê lezeteke mezin ji akil û tema me bivînî, tê ji xwerina me têr nebî". Lê îro ne zemanê xwerina fêkîan bû. Min gotî bilezanda fêkîyên here bijare, here xweş biçinîya û tûrên xweda bi cî bikira. R'aste, pîreka min hertim ji bajêr mêwa û fêkîyên baş zarokanra tanîn, lê yên baxê Simo cuda bûn, gelekî xas bûn, bi serda jî minê nava hemûşkanda yên here baş bibijartana. Tirî û fêkîyên baxê Simo bi minva natîrêltir kivş dibûn û bi pêra jî yê tez, ku tem û akil, bîn û boxsa wan ya xwezayî ya xweş piştî çinînê, weke yên bazarê ji wan neçûye.

Ez niha, piştî buhurandina zemanekî dirêj li hest û hisên xwe yên wî zemanî mukur têm eyînî wek xwemikurhatina dizên bostana, her çiqasî jî ya min dizî nîbû, hogirê min yê ezîz bi dil û can berê baxê xwe bi dîyarî dida zarokên min. Gotina ser dizên bostanan jî eva hane: " Dizê bostana kivş dibin zivstana."

Min herdu tûrên nava rojnemekêda pêçayî derxistin, avîtin nava baxçe û raserî bax û bostanê Simo hatim, eyînî weke teyirê çev tolikê keve. Mêwa û fêkîyan diçînim û li ser erdê radixim bê ku bigrim ber hesêb, kanê ewê di tûrê minda bi cî bibin yanê na. Hemîn ya hildigirtin û birinê jî qet nake bîra min, di nav hiş û sewdê minra derbaz nabe. Û wê çima derbazbe, gava em du mêr amedene, ez pê nikaribim Simoyê alîkarîya min bike, xwe ne kafire.

Min mêwa û fêkî hê li ser rehê wan, darava raçev dikirin û hêja diçinîn: yên here gihîştî, xas û xweşik, yên bi texmîna min here xweş û akil. Min gûşîyên tirîya û hebên fêkîyan diçinîn, radixistin

û bawera dilê minda ewana hela hê têra dagirtina herdu tûrên min yên mezin nedikirin. Simo ser minra sekinîye û bala xwe dide kanê ez bi çi awayî bi lez û bez, weke nedîtîya nava baxê wî ketime û kîjan tirî, fêkîyên baş û xas ber min dikevin- ez diçînim. Fişke-fişk li min ketîye, ez diçinim û nişkêva dengê Simo bi hêz û bilind li min tesele bû:

- Kuro bese, - ewî deyî li min kir, - tu qet bala xwe nadêyê te çiqas tirî û fêkî çinine? Ewê çawa tûrê teda bi cî bibin û tûyê wî barê giran çawa bighînî hetanî cîyê îstegeha otobûsan.

Piştî vê gotina Simo min weke dibêjin, çevên xwe ser tirî û fêkîyên li erdê raxistî gerandin û min bi dilêşî tecrûbe kir, ku Simo rast navêje, ew ne ku gelekin, zêdene, lê têra dêvrra dagirtina tûran nakin,weke min birîyar danîbû. Û her çiqasî jî ez û Simo hogirên pir salan bûn, ez haj pê hebûm, ku weke gelê me dibêje, perda ber çevên wî tune, ku ew nizane çirûktî çi tişte, ku ew mêrekî nandar û destvekirîye, lê dîsa jî piştî ku min li tirî û fêkîyên li erdê mêze kir, min hew tirê hogirê min qêmîşî tirîya û fêkîyan nake, wana ji min û zarokên min dihêvişîne. Nizanim ji ber çi ji bona çi ev fikir jî nava hiş û aqilê minra buhurî: heger şûna min hogirekî dinê bûya belkî Simo bi vî awayî jêra negota. Lê ya here keder jî bona min ew yek bû, ku hela hê berî rêketinê Simo xwe neda berbi cîanîna alîkarîyê hindava min bi hilgirtina tûran û tevî min.

A ji ber vî hemûşkî û bi serda jî bîranîna henek- laqirdîyên min û wî yên berê, gava ewî gelek cara zora min dibir, dikete kirê min û ez aciz dikirim, min birîyar danî vê care heyîfa xwe ji wî hildim, heyîfa kevin ya teze û loma min bi awazekî eşkere acizbûnê û hêrsketinê jêra got:

- Tu qet berşoşkî nebe. Ez zanim, ku ji boyî çinîna gelek tirîyan û fêkîyan dilê te dêşe, dişewite, lê qet jî ne ji boy wê yekê, ku ezê nikaribim haqas bar hilgirim, ku ezê cefakî pir mezin bivînim hetanî wî barî bighînim îstegeha otobûsê. Kula cefê min nedane ber te, ezî şikir gepî- zepim, weke xortekî çardehsalîme, ev tûr çikin, ku ez nikaribim hilgirim.

- De, tiştek bû min got,- Simo bi hêsanî, bê hêrsketin bersiva min da,- piştra gazinan li xwe bike, lê ne li min..,

- Qet jî na, min dîsa bi acizbûn gotê,- gava min gazin li te kirin hêja vê gotinê bide rûyê min.

Piştî vê gotinê ez pê ketim min tirî û fêkîyên çinî xistin tûra. Simo rast tecrûbe kiribû, herdu tûrên min çilk-çevanra tije bûn û belkî hemû tirî û fêkî têda cî nebûna weke dibêjin, ber bimana, heger min dizî Simova, gava wî êmekî berê xwe ji min û tûran guhêrî, herdu tûr bi sire hilneqoşandana û guşîyên tirîan û fêkî bi wî awayî têda nedewisandana.

Min herdu tûrên xwe hilgirtin û em rê ketin: ez bin barda, lê Simo jî destvala rex min ket: wek begekî. Tûr bi minva pir sivik kişv bû û min dilê xweda got:" Îcar ev çike, ku ez nikaribim bighînim cîyê- cî, serî- binî kîlomêtir nîvek nîne. Min ku gîhand cîyê- cîîstgeha otobûsê-ezê careke dinê dilê wî boyî wê yekê jî bêşînim, ku ew eşkere quretîyê li min dike weke axa ku rex xulamê xwekeve, li tenîşta minda dimeşe û destekî xwe jî navêjê tûrekî min, ku barê min hevekî sivik bike. Min ku tûrên xwe gîhandin cîyê- cî ezê hêja jêra bêjim: "Te îcar dît, ku mêr di xelkêda hene, min çawa tûr gîhandin îstegehê û qet nekir ax û of". Lê ev şabûn û quretîya min, weke piştî êmekî kin kivş bû, ya ji zemîn zûtir bû. Rojên dinê ez bi Simora destvala diçûm havîngeha wî û paşda dihatim û qet westandin tecrûbe nedikir, her çiqasî jî riya ji îstegeha otobûsê hetanî havîngehê ne pir xweş bû, bi serda jî ya bi kesir bû bi tilmên axa hişk û kevir- kuçkên di navda, bi çivane, hevraz û berjêrbû, ber wê yekê jî otobûs hetanî nava Xarbêrda Kevin, ya gund dihat. Yên ku havîngeh çê kiribûn, heger pêwîstî çê bibûya vê rîya dijwarra atomobîlên xwe yên malê yanê jî yên kirêkirî dajotin û didan ajotinê. Weke min bi çûyîn- hatina pir caran tecrûbe kiribû, rîya ji îstegeha otobûsê ya dawî hetanî ber derê havîngeha Simo weke kîlomêtir û nîvekê bû, ku gava em bi peyatî, destvala diçûn havîngehê ew bi meva qet jî weke rêke dûr û dirêj kivş nedibû, hetanî me çênd gotin, çend hevok pev diguhastin em îdî dighîştine cîyê- cî. Lê vê carê bi temamî cuda

bû. Weke zûtirekê kivş bû, ev şabûn û quretîya min ya xiyalî ya ji zeman zûtir bû. Zemanek hat, gava tûran giranîya xwe bere- bere bi min kevir û kuçik, tilm, çel û nerdên ser rîya xwe diqelibîm û ser wanda dilukumîm, piştra rast- çepo dişewişîm, carna jî bi sêrî diçûme erdê, tûr jî bi minra. Wan tûra ez bi xwera wek mîrovekî pir alkohol vexaribe û sermest bûbe rast û çep, pêş û paş dibirim û tanîm, dihejandim û ji ber wê yekê jî min bi zor cefakî sepîyan didît. Ez ne haqasî derdê ketin û êşa bedena xweda bûm, ku piştî ketina min ya ser erdê dît karibû çê bibûya, çiqas derdê wê yekêda bûm, ku ezê bibûma pêkenîyê Simo. Ewê yekê ez bêtir tanîm xîretê, hêz û herekê nû didan min, ku ez li ser pîya bimînim û meşa xwe ya bin barê giranda berdewam dane hisandinê. Te qeyî digot bi avîtina çend gavanra kîlogiramek- dudu ser barên minda zêde dibûn. Zemanek jî hat, gava wê giranîyê îdî ez êşandim: tilîyên destê min hew dikaribûn giranîya tûra ragirin, te qeyî digot herdu milên min hew dimîne ji girkanda biqetin û jorda bên xwarê. Nefesa min jî alîkîda mefa min birîbû: fişe- fiş bi min ketibû, wek gayê li kotanê girêdabin ber ku ezî cigarekêş bûm. Germa deşta Araratê ya havînê ji şûna xweda ez tewandibûm zora min birîbû, ku di wî zemanîda bin sîyêda jî 4O giradûsan derbaztir dibû. Şoreşora xwîdanê bû ser minda dihat. Dilopên xwîdana serî û enîya min dişibîyan çilkên barana nîsanê ya boş û germ. Wan dilopan ez hemûşka bêhtir merûm û bêçar kiribûm. Ji ber dilopên ku nava burîyên minda hev digirtin û jorda dibarîn yanê jî ser kopên çevên minra disûlikîn nava bijang û çevên min, min nikaribû kopên çevên xwe weke pêwîste vekirana û rîya xwe bidîta. Destên min jî ne valane, ku ez bî dezmalê wê xwîdanê demekê paqij bikim bona dîtina rîya xwe ji ber vê yekê ez kore kor, bêhemdî xwe li bikim, gava min didît, tecrûbe dikir, ku bi dîtina vê rewşa min ya giran Simo bêtir dilezand, ku min dû xwe weke „mîke kulek" bihêle, bi serda jî bi min bikene, qerf û tinazê xwe bi min bike. Ji ber yê yekê jî min birîyar girt, ku çiqasî jî zehmetbe ez bi Simora gav bidim û bi wîra bighîjime îstegeha otobûsê. Min dilê xweda ew mirov bi sûc dikirin, çêrî wan dikir yên ku cîyê

wê îstegehê haqasî dûrî havîngeha Simo kivş kiribûn. Teyê qeyî bigota wan feqîran gotî ev zehmetê min, ev roja giran, ku ez ketibûm navê, bigirtana ber hesêb û hêja cîyê îstegehê kivş bikrana: nêzîktirî havîngeha Simo.

Min çiqasî jî xwe danî xîretê, çiqasî jî hewil dida xwe, lê çûyîn, meşîyana bi Simoyê destevalara çiqas diçû zehmetir dibû. Simo destevala, sivik- sivik dimeşîya, lê ez feqîrê xwedê bin barê giranda îdî tewîya bûm, hêz û hereket bi minva nemabûn. Lê dîsa jî hêvîya, ku ezê weke min tecrûbe dikir, zûtirekê bighîjim îstegehê, ez li ser pîyan dihiştim. Lê ji nişkêva tiştek qewimî, gava ji ber wî ez hêvîbir bûm û qudûmê çokê min şikestin. Em gihîştin kanala avê, ku nêzîktirî havîngehê û dûrtirî îstegehê bû. Berîya dîtina kanalê min hew tirê me piranîya rê qedandîye, îstegeh nêzîktire. Evê yekê bi carekêra fikir û ramanên min yên hetanî hingê dane guhêrandinê û min dilê xweda birîyar danî ji quretîya xwe bême xwarê, xirabîya Simo ya wê rojê jî bîr bikim û jê rica bikim, ku alîkarîya min bike. Berîya, ku ez xwe bavêjim ber bextê Simo, min xwe û gotinên xwe bi sûc kirin. Ez ji gotinên xwe yên bi wîra poşman bûm û min dilê xweda got: " Bê çi kola te bi Simo ketibû, te çima hişk û sert bersiva wî da. Te bi zimanê xwe nikaribû, de îcar niha sûcê xwe bikişîne. Rast gotine:" Yê ku bi lingê xwe dişimite tê ser xwe, lê yê ji zimên- na".

- Simo,- bi zor cefakî zarê minî zîhabûyî şikevta devê minda gerîya-Xwedê ser tera heye, ca destê xwe qet nebe bavêje wî tûrê destê minî çepê yê herî giran, barê min hinekî sivik bike, navînî ez ketime çi rewşê?.

- Min ku digot : "Barê te girane, Wezîr", te qerfê xwe, tinazê xwe bi min dikirin, ez şûna mirovekî destgirtî, çirûk dadanîm... De niha jî heqê teye, tu rind ketî kapê xwe, jê vegere... Gotinên te haqas zû ji bîra te çûn. Ev tu nîbûyî, ku te digot : " Qet berşoşkî nebe, kula karebûn û nikarebûna min nedane ber te".

Şubhe nema, ku Simo alîkarîya min nake ji ber wê yekê jî min xwe ker kir û birîyar stend hetanî hêz di minda heye wî barê xwe nîvêrê nehêlim, bighînim îstegehê. Heyîneser, min hetanî ew herdu

kurdlib.online

tûrên xwe gîhandin ber îstengehê, weke dibêjin, reşik- spîkên çevên min bûne yek.

Otobûsa me hat, em lê sîwar bûn. Û gava xwîdana min hinekî zîha bû, bîna min hevekî hate ber min ez ser bûyera wê rojê, gotinên xwe û Simoda careke dinê fikirîm, ku pê bihesim, kanê ji bona wê dilmayîn, wê xeyîdê me ya ji hev ji me herduyan kî bêtir bi sûce tecrûbekirina Simo ya gelekbûna tirî û fêkîyên ku min çinî bûn bona birinê bêtir ya rast bû, lê ne ya min.Tecrûba min di wî warîda kêm bû yanê jî qet tunebû. Simo zemanekî dirêj bi hildan- danîna bax û bostanava mijûl bibû, bi serda jî bi çinîna berê wan û raxistina wî berîva li ser erdê. Loma jî ewî rast tecrûbe dikir, kanê ew berên ku çinîne çiqasin, çend kilogram û pûtin. Lê ya min ew tecrûbekirin tunebû, lema jî berên bax û bostana yên çinî û li ser erdê raxistî bi minva hindik xanê û kivş dikirin. Belê, hemû tişt li derva kêm kivş dibin, çimkî ew derva pir berfireh, em dikarin bêjin, bê ser û bine. Lê gava wan tiştên derva dixî avayan, çewal û tûran hêja ew ber çevê mirovan zef kivş dibin. Berên baxên Simo yên îro jî bi eyînî awayî ber çevên min kivş bûn: ber ku tecrûba min di vî warîda tunebû min hew tirê fêkî û tirîyên ku min çinî bûn, têra dagirtina tûrên min nakin. Lê Simo rast tecrûbe kir, ku têra dagirtinê jî dikin û hela bi serda jî dikarin ber bimînin.

Li ber hesêb girtina vî hemûşkî ez li sûcê xwe mukur hatim û ne ku bi tenê dilê xweda, lê ekşere, li ber Simo. Gava em ji Xarbêrdê êpêce dûr ketibûn ez zivirîm ser Simoyê li tenîşta min rûniştî û min bi awakî ciddî û hêsa, bi awakî usa, ku giva navbera meda tu gilîgazin çê nebûne, gote wî:

- Simo, tu zanî ya min û te ya îro bû qisa çi?

- Na, - Simo bersiva min da,- kerema xwe bêje, ez guhdarîya te dikim.

- ... Bû qisa bizinê û şivên, ewa ku gelê me dibêje: "Ecelê bizinê tê diçe nanê şivîn duxwe".

- Min ew mesele bihîstîye,- Simo got,- lê tu wê bêje: niha kî ji me bizine û ku şivan.

- Çima bê gotina min tu serva naçî Simo?- min jêra got.

- Ez dixwezim vê yekê ji dev, ji zarê te bibhêm,- Simo gote min.

- Bizin ezim, şivan jî – tu,- min gotê.

Ji nişkêva bû pîrqîna Simo û hemû rêwîyên otobûsêda berê xwe dan yalê me. Lê Simo piştî temambûna kenê xwe ji minra got:

- Wezîr, te bi vê gotinê,bi vê mesela gelê me xwe afû kir, şaştîyên xwe yên îro serrast kirin. Eferim te û vê gotinê, te û vê li xwe mukurhatinêra. Serê bavo, ezê lawikan ser vê gotina te agahdar bikim, bera ji xwera têr bikenin. Şa û kêfxweş bibin.

Serhatîya derheqa vê bûyerê sêwirî bi rastî jî piştî zemanekî ne dirêj weke yên dinê, yên dîsa derheqa girêdan û pêwendîyên min û Simo, derheqa henek û laqirdîyên meda, bû mal û milkê ronakbirên me û hetanî gundîyên kurd jî.

A xeyîd, gilî- gazinên min û Simo bi hevra hetanî vê tangê, hetanî vî zemanîbûn, bi bûyerên konkrêtra destpê dibûn û bi dawîhatina wanra xilaz dibûn. Xeyîda me ya ji hev alîyê zemînda ji wî zemanî dirêjtir nedikişand, ber ku ew bi rast ne xeyîd bû. Weke gelê me dibêje, me xweşîyê xwe li hev dikirin. Em diketin kirê hev eyînî weke mirov bikeve kirê zarokeke, ku pir jê hiz dike û gava ew zaroka dilsax û dilpaqije eva yeka li mirov xweş tê û mezinê ku ew xeyîdandîye hêja wê zarokê hemêz dike û pê şa dibe. Heger yekî yanê jî çend kesan ji dûrva, ji tenîştêva guhdarîya axaftina min û Simo bikira, gava em diketin kirê hev, wê bigotana ewana şerê bi zar dikin û belkî piştî êmekî ew şer werguhêzî yê bi dest û lepan, yê bi sîla û kulman bibe. Bi tenê heval û hogirên me yên nêzîk û mirovên ku haj xeysetê me hebûn bin perda şer û dewê me yê bi zarda awazên hûmorê, henek û laqirdîyan didîtin.

Min û Simo me ji van henek û laqirdîyên bi hevra lezeteke baş didît. Û şede- şûdê van henek û laqirdîyên me jî, yên ne şede jî, ku ji zarê mirovên dinê ser van henek û laqirdîyên min û Simo agahdar dibûn, ewana jî usa pir lezet didîtin. Û belkî sebebê bingehîn ev yek bû, ku lawikên me kurdan, yên ronakbir û ne ronakbir jî serhatîyên derheqa henek û laqirdîyên min û Simoda, weke dibêjin, ji devê

hev direvandin. Besa derheqa vê bûyerê jî piştî çend rojan bû mal û milkê lawikên kurdan. Gava rastî hev dihatin yên haj vê bûyerê hebûn yên ne agahdarkirîra digotin: "... We bihîstîye Simo û Wezîr wê rojê çi anîne serê hev?..."

XWENDÎYÊ ŞAYÊ

Him, kakilê vê novêla min ya bûyerî ew serpêhatîye, ya ku hogirê min yê gorbuhuşt Simoyê Şemo berîya gelek salan ji minra goîye.Û ber ku ew serpêhatî balkêşe û weke ya bi hûmorê û satîrayêva dagirtî, xemilandî jî karaktêr, xeysetê Simo yê şexsîva rind tê girêdanê, min biryar danî ewê cara yekemîn pirtûka ser jîyan û kar û barê wî yê efrandinêda bi cî bikim.

Simo xudanê hestên henek û laqirdîyan bû û ji ber vê yekê jî qedir-qîmetê henek û laqirdîyên baş zanibû. Bûyereke hûmorî, henek û laqirdî, ku di vê novêla bûyerîda eyan dibe- belkî îro nebûya mal û milkê xwendevanan, heger ew şexsê yekî weke Simoyê navdara nehata girêdanê û eva yeka femdarîye. Heger şûna Simo yekî dinê, yê ku hesta wî ya hûmorê, henek û laqirdîyan ji ya Simo gelekî kêmtir bûya yanê jî qet tune bûya bibûya şede û beşdarê wê bûyerê, derheqa kîjanêda vê novêlêda tê gotinê, îtîmalê derheqa wê bûyerêda weke ya alîyê hûmorêda bi nirx û balkêş xelkêra nehata gotinê û yekî ji wan xelqa weke min ew nekira bingeha novêla xwe ya bûyerî. Ez bi vê yekê dixwezim bêjim, ku Simo nîbûya ev novêla min ya bûyerî jî çê nedibû. Simo naveroka vê novêlê bi kurtayî û bi zar ji minra got, lê min jî bi çevên nivîskarîyê li gotina wî mêze kir û ew kir novêla nivîskî, hilbet, gorî mêntalîtê û nêrîna her nivîskarekî min naveroka gotina Simo berfirehtir kir, sirîya bûyera bingehîn guhert, ew ji pêş anî paş, bi serda jî hinek nexşên bedewî lê zêde kirin û ji ber wê yekê jî ev novêla bûyerî hetanî warek bû berhema min, lê Simo bi xwe jî weke pêrsonaj, qehremanekî wê novêlê.

- Berîya çend salan Simo vedixwînin şayî, deweteke me kurdan

ya gundekî navça Ermenîstanê ya Axbaranê yê li pala çîya, li kîderê şayî bi giranî payîza derengî û destpêka zivstanê dikirin, gava xelqên cotkar û rêncber jî kar û barê ekin- tîkin, çandinîyê aza dibûn, weke digotin, xemên xwe didan ber serê xwe. Piştra Simo gotina xwe wa berdewam kir: "Ez bi du hevalên dinêra vexwendim malekê. Bi sebebê parastina sura nefereke vê male, rasttir, kevanîya wê malê ez navê malxwê kevanîyê hilnadim, eşkere nakim, ku xelq wê kevanîyê nas neke, her çiqasî jî ew sura wê kevanîyê ne robetkirin, sosretkirina şexsê wêye, lê her bi tenê kenê mirov tîne. Lê zemanê bi cîhatina wê bûyerêda ew buyer dikaribû bihata dîtinê weke bêrûmetkirina kevanîya wê male. Li vê tangê momênta pisîkolojîyê emel dike, gava dibêjin: "Dizê bostana kivş dibin zivstana", rasttir: "Dizê bostana xwe kivş dikin zivstana". A ji ber vê yekê sura eşkerekirina navê malxwê û kevanîyê, hetanî ya eşkerekirina navê gund jî diparêzim.

Mala, ku em hersê xwendîyên şayê vexwendibûn, bê ku ber hebûna dinêkeve bi cîanîna mesrefeke giran sivreke bi naz û nemetên cûr bi cûr xemilandîbû, li ber me vekirîbû, ji goştê kelandî girtî, ku bal me jêra usa jî digotin " xaşleme" hetanî kivavan, mirîşkên sorkirî, fêkîyên cûr bi cûr destpêkirî hetanî mutulgên vexarinên / îçkên/ alkoholîk: şeravê, araqê, konyak û avên şîrin û medenî. Wan mutulgan hema hema nîvê sivrê girtîbûn.

Ji nîvro, ji dema hatina xwe ya wê malê hetanî êvarê me xwar û vexwar, kas, fîncanên eşqan / noşan/ û salixyan ji hev nedibirîn. Edetê ermenîya û nemaze gurca ketîye nava me kurdên êzdî, bal k'îjanan berê di şaya û eyîdanda hema hema alkohol peyîda nedibû, rûmeta alkoholê tunebû, lê niha bê alkohol du hogirên nêzîk bi hevra dora sivirekê rûnanên. Û nemaze şayanda kî zêdetir alkoholê li mêvanên xwe bide vexwerinê haqasî qedir û rûmeta bilind bona xwe qazanc dike. Ji ber vê yekê xweyên xwendîyan alkoholê bi destî zorê li mêvanên xwe didin vexwrinê, bê ku bizanibin yanê jî pê bihesin, kanê ew alkoholê li bedena wan rûnê yanê wê li wan bibe jer.

Êvarê, gorî edet, def û zurne hate dû me, em birin cîyê govend lê digerîya, ku tewlexaneke gund ya here berfirehda çêkiribûn. Piştî nîvê şevê me hew dikaribû ber westîyanê û bêxewîyê temûl kira û em vegerîyan qonaxa xwe. Sivra me weke xwe wê demê bû, gava me nû pîyê xwe avîtin ser şêmîka wê male. Jimara mutulgên vexarinên alkoholîk zêdetir bibû- ne kêmtir, ji xarina ser sivirê bûx, hulm û gulm quloz dibû. Kivş dibû, ku derheqa vegera me ya ji tewlexanê kevanîya malê agahdar kirine, ku ew, weke dibêjin, xwerina germkirî dayîne ser sivirê. Belê, sivira ji nûva dagirtî û xemilandî, weke kivş dibû, zemanekî ne dirêj benda me bû. Malxwê hetanî çend kas alkohol li me nedan vexarinê destûra razanê neda me. Piştî destûrdana malxwê em bi qaf û bedena germbûyî û mestbûyî ketin nava cî- nivînên gulavkirî, me sere xwe dan ser belgîyên qaztûkî, em doşekên stûre nermikda çûne xwarê û piştî ger û axaftina temamîya rojekê, xwerin- vexwerina pir û westîyana ji ber wê yekê qet ji bîra min naçe ez û hogiran çawa xewra çûn.

Haya min jê nîbû, kanê ji zemanê ketina me ya nava cî- nivînan û xewraçûyîna me çiqas zeman buhurî bû, gava dengê malxwê malê yê bilind û awazê hêrsketî guhê minda tesele bû.

- Gelî lawika, eva zemanê xewêye, xelq berbangda ji xwera kêf dike, dixwe- veduxwe, lê hûn ketine xewa hingorê. Ro hatîye nîvro. De, ez heyrana webim, rabin ser xwe, her yekê ji we kaseke ya tel vexwe û dîsa serê xwe daynin hetanî kivavên we amede dibin.

Belê, malxwê bû, ku weke erzayîlekî ser meda girtibû: destekîda mutulgê araqê, destê dinda fincan û şivdarek. Ev şivdar ji boyî wê yekê girtibû nava destê xwe, ku pê wê mêvanê pir xewar hişyar bike bi lêdana pîyên wî: weke nava xelqê meda bibû edet.

Min pencerêra bala xwe da derva: ro û nîvroya çi, halÿ çi, hê li derva tarîstane û berga malê û nava odê her bi tenê bi lempê êlêktrîkî ronî dibin.

Her yekî ji me jî bona bi cîanîna daxaza malxwê hema di nava cî-/ nivînada teqîn ji binê fincanên xwe yên araqê anî. Ew bû, min xwest xwe ser piştê bavêjim ser doşekê û belgî, lê ji nişkêva texmîn

kir, ku mîza min tê, ji bona ez piştî vexwerina araqê û bi awakî xweş û lezetdayînê germbûna zikê xwe bikaribim rehet razêm min birîyar danî hinekî cefê bidim xwe: kinca li xwekim û herim devedûrê, ku weke bîst- sî mêtra binatara malêdabû: pê texta çêkirî û tûalêta wa bona gundên wî zemanî weke ya lûks dihesibe. Gava ez derketim derva, min bala xwe dayê jina malxwê, kevanîa male pê gêzî, sivikeke mezin û stûr berga malê paqij dike, her çiqas jî dema em duh hatin wê malê te av li berga wê bireşanda- şêlû nedibû, lê toz çiqas bêjî li wê wer dibû. Wê payîza derengî hê berf neketibû û piştî baranên kêm, piştî qurlixîya wê salê erdî zip – ziha bû. Ez ber kevanîya malêra buhurîm, lê min bi sebebê femdarî sivexêrî neda wê. Sebebê yekemîn, weke tu jî zanî, ewe, ku bal me kurdan berîya ciwankirina rûyê xwe, berîya şûştina dest û rûyan destûr tune sibexêrîyê li mirovan bikin. Sebebê duyemîn ji bona min ew bû, ku ez nediçûm cîkî paqij, ku kevanîya malê bi wê çûyîna xwe bihesînim, her çiqasî jî zanibû, ka ewê bizanibe, ku ez diçim devedûrê. Hetanî ez ber wêra buhurîm jî ewê bala xwe neda min: serê wê berda erd paqij dikir, her çiqasî jî min tecrûbe kir, ku ewê ez dîtim. " Belkî wê jî, - ez dilê xweda fikirîm, - weke min şerm kir çûyîna min ya devedûrê eyan bike".

Belkî ev çûyîna min ya li devedûre bi kerî û lalî derbazbûya: heger kuxike li min negirta. Min berî –hingê serma hildabû û dengdenga dikuxîyam, lê gava bûm xwendîyê vê şayê min bi mecbûrî araq û şerava cemidî vexwar, kuxikê bêhtir li min zor kir. Gava ez derketim derva û sura çîya ya sert û sar ber pozê min ket, dest xweda kuxikê li min girt, weke dibêjin, ez lal kirim, anîm halê fetisandinê. Gava kuxikê li min girt ez hela hê gelekî ji kevanîya malê dûr neketibûm. Û ji nişkêva dengê wê li min tesele bû:

- Kul, kul, kul û keratî, te êvarda haqas araq û konyaka weke cemed sar ser qurda xweda nekira- nedibû.

Koreqedêra min vê care jî terka xeysetê xwe neda û bersiva wan gotinên wê derengî nexist: "A usa bêje, xûşkê, gotina te heqe, rehma xwedê li wan dê û bavabe, ku yeke weke te rastgo li dinê xistin.Min

wa got û hela hê pêra negîhandibû berê xwe dîsa bidim devedûrê meşyana xwe berdewamkim, gava " wîşîneke" bi dengê bilind ji jinika feqîr hat, ewê gêzî wêda kewkî kir, herdu destên xwe avîtin gulançkên xwe, ew çend cara bi hêz verûtin û bi bayê bezê xwe avîte sivdera xênî û derê wê yê ji derê odên bi pencere cuda stûrtir, girantir, bi xirpîn gimmîn piş xweva girt, weke miroveke gêrê har dabe dû wê. Piştî wê kirina jinikê ez li gotina xwe poşman bûm, lê îdî dereng bû. Hema wê yekê jî xemgînîke giran ruhîyeta minda çê kir. Kirinên kevanîya malê yên bi wî awayî, reva wê ya ji min tu şubhe bal min nehişt, ku ewê ew nifir û gotinên weke çêr her bi tenê û mexsûs ji bona min gotin. Lê evê yekê qet jî şedetî nedida, ku ewê jî bona bihîstina min ew gotin anîn ser zarê xwe. Weke min tecrûbe kir, bawera dilê wê kulfetêda ne mûmkûne ez wê gotina wê bibhêm, çimkî angor bi dengekî nimiz anî ser zar, weke mirov ber xweda, xwe bi xwera wan peyvan bêje. Lê feqîrê çi zanibûya, ku dengê êvarê, şev û berbangê jî yê roj, ji yê nîvro berztir, bilindtir tê bihîstinê, berî êvarê, şev û berbangê dinîya kere, deng û his ji tu kesî û tu tiştî çê nabe. Lê roj hetanî ji sincirandina tevê jî deng çê dibe. Loma carna gava mezinên me û bi giranî jinên pîr êvara dua-dirozgeh dikirin-banga xwe dikirin êvarê û digotin: " Ya êvara ker û lal, tu bêyî hewara neferên min, ewled, nevî û nevîçirkên min". Îhtîmale, eva yeka jî hebandina totêmîzmê, pûtperestîyê dihat, gava pêşîyên me- kurdên êzdî hetanî niha jî gelek tişt, gelek nexşên te-bîyetê dihebînin. Belê, tu şubhê baş min nema û ne jî karibû bima, ku ewê kulfyetê ez bêrûmet kirim, nifir li min kir, lê bi dengekî usa, ku ez nebhêm. Ev bawarîya min jî ber wê yekê jî çê bû, ku ber derê qonaxa me lempeke êlêktrîkî dareke bilinde bê gulîda dardakirî dişuxule, dor-berê xwe ronî kiribûn û loma jî ne mûmkûn bû, ku ewê kulfetê ez nas nekiribûm... Û gava min di cîda, dest xweda bersiva gotina wê da û ew pê hesîya, ku bê îrada wê min gotina wê hemûşk bihîst, wê gavê, weke dibêjin, îdî ji şermana nizanibû xwe li kîderê veşêre. Heger ewê ew gotin, ew nifir ji bona min negoti-bûna, gava pê hesîa, ku min ew nifir temam bihîst, wê neketa

kurdlib.online

rewşeke haqas giran, gava nizanibûya, weke dibêjin xwe li ku kira, kîderê veşarta. Û ji ber vê yekê jî, gava ez gihîştim devedûrê-qere-fiska rûniştim, ku wan gotinên kevanîyê rehet, ji nûva nava pirîzma hiş û sewdê xwera derbaz bikim û ji nûva binixînim. Vê carê min dest pê kir xwe bi sûc kir, ber ku ez bi xwe bûm sebebê çêbûna rewşa wê kulfetê ya pisîkolojîê ya pir giran. " Malika min avabe, min dilê xweda digot,- Simo, bê tu çima nikarî xeber, gotineke xelqê daqurtînî, weke gelê me dibêje, kerrî bibuhurînî. Min bi xwe karibûya, deyî nekira ewê kevanîya feqîr haqas şerm nedikir, haqas şermezar nedibû. Duhva feqîrê weke dezmala ser desta ber me diçe-tê, xizmet dike.Eva jî heqê xizmetkirina wê bû, ku min bi bêsebirî û bêfersengîya devê xwe da wê hurmetê. Ew feqîra xwedê hetanî saxbe li rû hewata dine tu cara vê şaşîya xwe ji bîr nake. "Lê sebebê qehîrandina vê hurmetê çi bû, ku nifireke haqas tûj li min kir, ez bi awakî tûnd bêrûmet kirim, her çiqasî jî bawar bû, ku ez wê gotina wê nabihêm,- min di devedûrêda xwe xwe ji xwera got, rasttir, ji xwe pirsî. Belkî jineke destgirtî û çikûze û loma jî, gava me- mê-vanên wê merd- merdane konyak, araq û şerava wan vedixwar eva yeka li wê pir dijwar dihat. Û ewê jî kerba, ji aca dilê xwe ev nifir li min kir. Bi rastî jî duhva feqîra araq û konyak mera nedihêvişan-din: emê cîwan bûn û em piştî haqas vexwarin ser pîyan diman, mest nedibûn û me dîsa mutulge dû mutulganra vala dikirin. Ne axir me li vê yekê mesreva wan pir zêdetir dikir. Lê heger ev kulfet yeke usane, ew beşera wê ya xweş, ku duhva bi nîşandana wê ya dayîmî xizmeta me dikir, ji ku û ji çi dihat. Gelo mirovên weke wê jî hene, ku şalûzîyê, dirûtîyê bi awakî usa bikin, ku mirovên himber ewê yekê tecrûbe nekin?- min ji xwe pirsî. Na,ez bawar nakim, ku wê hurmetê duhva şalûzî dikir wek aktîyoreke bi kemal ser sehna têatroyê dileyîst". Min dixwest wan deman bînim ber çevên xwe, gava me ew kevanîya dilsoz mecbûr dikir himberî me raweste het-anî me ew dua- dirozgên xwe temam dikirin, yên ku ser kasa sal-ixîyê yanê jî eşqê bi cî tanîn. Dema gotina wan dua- dirozgan û vexwerina temamîya alkohola kasê, fincanêda weke min xiste bîra

xwe, ewê zere- misqaleke gunê tel bi zemanê herî kin nanî ser rûyê *xwe yê hertim guleş û ronik*. Ez ji ber şaştîya xwe ya mezin û nemaze wê yekê, ku min ew jinika feqîr kire rewşeke giran, haqasî fikirîm, ku weke dibêjin, kerr û gêj bûm... Min tecrûbe kir, ku ez *zemanekî* pir dirêj devedûrêdame û loma jî min hizî da xwe, banzda ser xwe û bi dilekî xemgîn berê xwe da qonaxa xwe. Gava ez nava *berga wê malêra* buhurîm- ew xik û xalîbû: kevanîya malê tu dera kivş nedibû, her bi tenê gêzîya wê weke berê bêxwedî li erdê mabû. Û ez ser vê yekê qet jî metel nemam.

Ez çûme oda mêvana. Hogirên min hişyar bibûn, cilên xwe bi xwe kiribûn, weke min tecrûbe kir, hetanî ser-çevên xwe jî şûştibûn û belkî benda min bûn. Zarên malê bi hatina min hesîyan, hatin odê, ez vexwendim derva, ku ser-çevê xwe bişom. Piştî vegera min ya li odê êmekî kin derbaz bû, gava zarokekê derê odê vekir, xwe li piş dêrî da alîkî, ku rê bide malxwê malê, yê ku sinîke qûç bi kivavan dagirtî destanda bi beşereke xweş hate nava odê. Evê yekê xemgînîya min ya hetanî hinge zêdetir kir. Sebeb jî ew bû, ku heger hetanî wê demê bi anîna xwerinên teze û germ kevanîya malê xizmeta me dikir, lê niha di wî warîda malxwê malê ketibû şûna wê. Edetê rûniştevanên gundên çîya, yalê Axbaranê hatibû teribandinê û sebebê vê yekê minva eyan bû.Ber vê yekê jî weke hogirên xwe beşera min bi hatina malxwê û devbikenîya wîra qet jî xweş nebû. Ev rewş, ev xemgînîya min malxwê destxweda tecrûbe kir û bi zanîna sebebê çêbûna vê rewşa min û ji min pirsî:

- Simo, bira, çima vê sivê kêfa te ne li cîye?

Min li vir jî bi zimanê xwe nikaribû bersiva malxwê bi vî awayî da:

- Bira can; tu ji min baştir sebebê xemgînîya min zanî, îdî çima dipirsî. Xûşka min niha derheqa sebebê vê xemgînîya minda ji tera negotîye?

Ser vê gotina min kenekî li malxwê girt û evê te bi zor- cefakî ev gotin anîn ser zarê xwe:

Hilbet ji minra gotîye, Simoyê bira, lê gelo tu zanî sebebê bêrûmetkirina te çi bûye?

- Na, serê te, min jî dixwest wî sebebî bihesim. Kerema xwe ji minra wî sebebî bêje, êdî sebra min hew tê: nîvê şevêda ez li wî sebebî digerim, lê navînim.

- Çava navînî, gava ew sebeb wek nîşanekê, demxekê, beratekê vê gavê jî li ser teye, - malxwê dîsa bi zor-cefakî bi zeftkirina kenê xwe ji minra got.

Piştî vê gotina wî min ser xweda nihêrî, ber ku dîsa fem nekir ew tişt çîye.

- Tu ser xweda nenihêre, - malxwê got, - ew bi mêzekirinê ne mûmkîne bi teva xanê bike. Her bi tenê dimîne tu destê xwe bibî sere xwe tê piştra wî tiştî bibînî?,

Min vê care hêja fem kir, ku gotina wî derheqa êratîya li serê mine. Ber wê yekê jî min destên xwe birin sere xwe, êratî jorda şiqitand anî xarê û bi ber wî girt: êratîya gul-gulî ya ku bû sebebê çêbûna bûyereke ecêb û xemgînîya min ya mezin.

- Ez niha serhatîya wê yekê jî tera bêjim,- Simo ji minra got,- kanê ew êratîya gul-glî kengê û bona çi min li sere xwe girêda. Gava em piştî nîvê şevê ji cîyê govendê vegerîyan qonaxa xwe- berîya razanê min ji malxwê male rica kir, ku laçikekê ji minra bîne, ku ez li serê xwe girêdim, çimkî payîza derengî oda emê têda razana têra xwe sar bû.

Malxwê, weke kivş bû, xwera nedît here yalê xênî ji minra laçikekê yanê jî sergirêdaneke dinê bîne, ber wê yekê jî ha- hanga êratîya bi eyînî sebebî li serê xwe girêdayî ya gul- gulî jorda şiqitand, anî xwerê, li ber min girt û got:

- Keremke, Simoyê bira, ev êratîya li serê min stûre, serê te wêda serma nake, ezê herim yalê xênî ji xwera yeke dinê destxim.

Min êratîya malxwê hişkem li serê xwe girêda û piştra ez derketim derê malê, ku herim devedûrê.

Weke min berîya vê yekê îdî ji tera gotîye, gava ez derdikevim derê malê kevanî, serê wê berda, berga malê paqij dike. Lê gava ez ber sura sar dikevim û kuxik li min digre, hingê, îhtîmale ew kulfet serê xwe ji ber xwe derxe, ku bibîne, kanê ewê ku dikuxe kî ji meye.

Û gava êratîya ku hertim mêrê wê şev û sermêda dide serê xwe divîne, îdî bal wê tu şubhe namîne, ku ewê dikuxwe malxwê mala wêye. Û çimkî bi wê kuxka xwe zilamê wê hetanî şev jî wê dide acizkirinê, xewa wê diherimîne, bi serda jî bona heyfpêanînê ew bi awakî hêrs, bi sûckirin û gazinlêkirin lê hiltê, jêra dibêje: "Kul, kul, kul û keratî, te êvarda haqas araq û konyaka weke cemed ser xweda nekira nedibû", bê ku haya wê jê hebe, ku ewê êratî daye sere xwe û dikuxwe ne ku mere wêye, lê xwendîkî şayê û mêvanê mala wan Simoye.

A piştra ew bûyera, ku min derheqa wêda berîya vê jî tera got, çê dibe ya ku dibe sebebê şermezarbûna kevanîya mala qonaxa me û xemgînîya min.

Wê sibê bi def û zurne, ku gorî edetê miletê me diçe dû hemû xwendîyên şaya yên ji derva hatî, - Simo piştra got,- em çûn ber derê xweyê şayê, ku ji wir herin gundê cînar bûkê sîyarkin- bînin. Me bûk anî, eyînî rojêda xweyê şayê sivira xwe bona hemû xwendîyên, xwe, yên gund jî û yên ji derva jî rast kir, xwendîyan topayî avîtin û piştî wê em hêja hatin mala xweyê qunaxa xwe, ku razîbûna xwe ji wî û neferanra bêjin. Sivira me weke hercar xemilandî bû, lê her bi tenê kevanîya malê kivş nedibû,- piştra Simo ji minra got:

- Ber vê yekê jî min malxwê malêra got:

- Bira can, ez rica dikim tu kerema xwe cefê bivînî û xûşka min vexwînî vira. Ez hetanî razîbûna xwe jêra nebêjim bona xizmetkirina ber meda û lêborînê jê rica nekim, ku bûm sebebê şermezarbûna wê, tabetî nakeve min, dilê min rehet nabe.

Min bi zor- cefakî malxwê malê danî ser rê, lê piştî zemanekî ne dirêj, ew bi tenê vegerîya got:

- Ez çiqasî bi xûşka teda ketim- nehat ser rê û ji minra got: " Qet nebûye. Ez îdî nikarim rûyê xwendîyên li mala xwe û nemaze birê Simo kevim. Min tiştekî bêterbiyetî kir, min ew ciwamêr cîyê bela sebeb bêrûmet kir. Ez nizanim ji şerma wî niha kuda herim, xwe li kîderê veşêrim, ku ew min nebîne. Lê tu jî bi serda dibêjî: "Were, rûyê wî keve". Piştra kulfeta min dest pê kir ez bi sûc kirim:

- Sevbebê wî hemûşkî tuyî. Heger te nîbûya, te êratîya serê xwe neda birê Simo ev bûyera robetî, ev şermezerîya min çê nedibûn.

Ez mecbûr mam spasîya xwe îlanî hemû neferên wê male bikim, xatirê xwe ji hemûşka bixwezim xên ji yekê- kevanîya malê. Piştî wê bûyerê çend sal buhurîne, lê min hetanî îro ew kulfeta dilsoze qedirgir û qedirbilîyan nedîtîye û xemgînîya min jî hê temam nebuhurîye,- Simo bi vî awayî gotina xwe temam kir.

ŞEWİTANDİNA ZURNÊ

Me di şûna pêwîstda ya vê pirtûka ser jîyan, kar û barê şayîr û doxtirê kurd yê bi nav û deng Simoyê Şemo hinek agahdarî dan ser bavê wî- Elîyê Şemo, ber ku bilî xwedîkirin- mezinkirinê ewî roleke kivş lîstîye û bi taybetî di ware danîna wî lawê xwe ber xwendinê, netîca kîjanê hetanî vê tanga pirtûka me îdî xwendevanên mera eyane. Simo bi şayîrtî û doxtirîya xwe bû ronakbîrekî berhemdar û spêsîalîstekî bi kêrhatî ne ku bi tenê bona gelê xwe yê kurd bi temamî, lê her usa jî- rûniştevanên Ermenîstanê yên kurd, ermenî û yên ji miletên dinê.

Her çiqasî Elîyê Şemo temam nexwendî bû, lê bîr û bawar, nêrîn û ramanê wî dişibyan yên întêlîjansekî, ronakbirekî, yê mirovê pêşverû. Gava dawîya sala 192O-î desthilat, rêvebirîya komûnîstan / bolşêvîkên lênînvan/ Ermenîstanêda çê bû ewê desthilatê berîya hemûşkî rê li ber xwendin- perwerdekirina rûniştevanên vê komarê jî / wek komarên Sovyêtîyê yên dinê/ vekir û di nava wanda ber kurdên li wir. Ewê hemû îmkan saz kirin, ku zarokên kurdên êzdî jî bixûnin, çi li bajaran û çi jî li gundan. Elîyê Şemo di nava kurdên komara Ermenîstanê yên êzdîda mirovekî herî pêşin bû, ku bi dilxweşî eva yeka pêjirand.

Em çima li vê tangê mexsûs "kurdên êzdî" cuda bi nav dikin, gava dikarin kurdên êzdî jî bi tenê weke "kurd" bi nav bikin û kurdên musulman jî bi eynî navî bi nav bikin. Lê vê tangê sebebê vê

bi navkirinê ewe, ku bi sal û zemanên dirêj hinek mezinên kurdên êzdî yên paşverû, gelek ruhanî, şêx û pîrên êzdîya xwendin ji bona êzdîyan ne ku bi tenê weke tiştekî guneh, lê bi serda jî-bi sûc dîtine.

- Sebebê nexwendewarîya me,- apê Elî digot,- qet jî yê olî nîne, lê ew qewil û şertin, di nava kîjananda emê ji nifşa min û yên jî nifşa berîya me mezin bûne. Dewrana meda dibistan jî bona miletê me tunebûn, lê niha dewleta komûnîstan bona me kurmancan li hemû şêna, li hemû wargeha dibistan vekirine.Em boyî çi zarokên xwe neşînin wan dibistanan, ku weke me ew zarok nezan nemînin.

Sebebê nexwendewarîya miletê me bi temamî û kurdên êzdî bi taybetî yê bingehîn ne jî ji wê yekê bûye, ku ewî giva rûmet, qedir-qîmetê xwendinê, perwerdê nizanibûye. Her bi tenê firsend, îmkan jêra çê nebûne, ku ew bixûne. Lê gava ew firsend hêna Sovyêtanda çê bû-yên weke Elîyê Şemo lezandin lawên xwe bibin ber xwendinê, ku weke wan nexwendî û weke wî bi xwe digot, nezan nemînin.

Ji ber vê nêrîna xwe Elîyê Şemo bendê bû, ku çend lawên wî qet nebe yek xwe li xwendinê bigre, ewê nîvhero, nivîşkan nehêle, bi destanîna xwendina bilind bibe zane, ronakbîr, mirovekî navdar. Ji ber vê daxweza xwe ya mezin himberî perwedekirina zarokên xweda mirov hew zanibû apê Elî wê pîyên xwe ji dibistana zarokên xwe ya gundda nebire. Bilî edetekî tomerî, ku gundên weke gundê wanda çê bibû, gava bav û nemaze dayîk degme diçûn dibistana zarokên xwe, ku perwerdekirin û perwerdebûna wan kontrol bikin, agahdar bibin, neçûyîna li dibistana zarokan ji ser xwendina wan agahdar bibin, neçûyîna li dibistana zarokan ji rewş û karakterê apê Elî dihat. Berîya hemûşkî ew nediçû dibistana zarokên xwe bi sebebekî herî giran, li xwe ne bawar bû, ku wê mamosta serwext bike, lê ewê jî bikaribin wî serwext bikin ser fêrbûna lawên wî. Lê sebebê vê nêrîna wî qet jî ew nîbû, ku ermenî baş nizanibû. Weke dibêjin, têra xwe zanibû: le ne zimanê xwendinê, litêraturî. Û weke mirovekî, ku rûmeta xwe destê xweda digre,wek mirovekî giran û ciddî wî nedixwest ku rûyê wê kêmasîya zimênda mamosta hetanî dilê xwe jî, ne eşkere li wî û zimanê wî yê ermenî

bikenin: weke dibêjin: tirranê xwe pê bikin, Ew gorî vê gotina gelerî radibû- rûdinişt: "Kevir cîyê xweda girane". Zarokan wî ew sebebê nehatina wî ya li dibistanê wan tê dighîştin: tecrûbe dikirin, çimkî bilî vî warî ewana sîya govde, bejin û bala bavê xwe ya xweşike tehsîrdar hergav li ser xwe didîtin. Apê Elî şûna neçûna xwe ya li dibistanê, ku vala dima, bi pirs û pirsîyarên ji zarokê xwe dadigirt: "Hi, lao, dersê te çi rewşêdanin?. Xwe tu hewcê alîkarîyê nînî?". Belê, weke dibêjin, bi rûva ev pirsîyar bi awakî xerîb, tewakel, serra-berra ji lawên xwe dikir, lê ji kûraya xweda bi awa û awazekî usa, ku tu şubhe bal zara nedima, ku bav gelekî xemgînîyê xwendin, perwerda wane, nemaze, gava ev pirsîyar bi van gotinên xwe yên xiyalî temam dikir: "Text û tacê vê dewletê qewîn, qedîm û dayîmîbe, hêna meda kengê di gundanda dibistan hebûn. Hebûn jî-ji bîst, sî gundî yekîda. Bi serda jî kirê, heqê perwerdekirina zarokan ji dê û bavan distendin. Niha xêra xwedêye: her gundekîda dibistanek heye û xwendin jî bê heqe, belaşe. Her dimîne hûn xîret bikin, bixûnin, ku bibin mirov,weke me nezan û femkor nemînin".

Piştî çend salan, gava apê Elî gurbuhuştî bû, ku lawê wî yê bi navê Simo dibistana gund ya ermenî da/ ber ku giranîya rûniştevanên gund eslê xweda ermenî bûn/ gelekî baş fêr dibe, seydayê wî jê razîne û her wa pesnê wî didin, pir kêfxweş bû,weke dibêjin, navbera wî û ezmînda buhustek dûrayî ma.

Mexseda apê Elî ya here mezin ew bû, ku Simoyê wî jî weke wan ronakbîrên kurd nav û dengê bilind û bi rûmet qazanc bike: Erebê Şemo, Hecîyê cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Gênco, Casimê Celîl, Wezîrê Nadirî, Nado Maxmûdov. Çendik- çend cara wî li ber kur ev nav hildidan, ku wî bîne xîretê, ku ew biqacqice, ku weke wan ronakbîran navê bilind û rûmet ne ku bi tenê Ermenîstanêda, lê dervayî sînorê wê jî qazanc bike.

kurdlib.online

* * *

Apê Elî yê saxê dilê xwe wê ji kîderê zanibûya, ku tehlîke, qezîyake rêal, lê ne bi eşkere, ji binva dighîje, hasil dibe ya terbandina vî nêt û meremê wî yê qenc: dijî xiyal, îrade û daxweza wî. Û awa sebebê bi awakî ne eşkere çêbûna wê tehlîkê yê serekîn çi bû. Simo hela hê sinifên dibistanê yên nimizda fêr dibû, gava mêl û mola wî, çû ser lêxistina zurnê. Û gava ewî bi tilîyên destê xwe miqam, awazên reqasên kurdî li hev tanîn- lê- lê bû ji şabûna bifire ezmanan. Lê gava bi awaz, bi qeydên wî, yên ku ewî pê zurnê li hev tanîn, govenda kurdî ya giran digerîya, keç û bûkên xweşike, weke dibêjin, rû bi xêlî bi reqas dû hev rêz dibûn, dimeşîyan- Simo îdî xwe di tevekê ezmîn yê herî jorinda didît û xwe weke mirovekî cîhanê yê herî bextewar dihesiband. Simo li zurnê dixist, lê bi tirs û xof. Ev tirs û xofa Simo qet jî ne ji ber dîtinên bav û kalan yên paşverûtîyê çê bibûn, wan dîtinan, ku ji kevnarda hiş û sewdayê piranîya kurdan û bi taybetî kurdên êzdîda hatibû qalibkirinê, yên ser defçîtîyê û zurneçîtîyê. Wana defçîtî û zurneçîtî wek pêşe, sinetê mirtivên kurdan yên gerok, evare, bê cî û war, stara dayîmî didîtîn û loma jî yê ji bona kurd û êzdîyên dinê yê bêrûmet. Lê ev nêrîna çewit, paşverû û ne qenc ser pêşê defçîtîyê û zurneçîtîyê hêdî- hêdî ji nava kurdên êzdî radibû, gava ezdîyên ne mirtiv jî destbi lêxistina def û zurnê kirin.

Bona xwendevanê me şaş fem nekin emê zelaltîkê jî bikin nava nêrîna kurdên êzdî ser aletên mûzîkayê û awazên bi temamî. Heger nêrîna wan ser zurneçîtîyê û defçîtîyê ya nêgativ, neqenc bû, lê em vê yekê nikarin bêjin derheqa nêrîna wanda ser aletên mûzîkayê yên dinê bi karanîna wan, ku bi temamî ya qenc ya pozîtîv bû. Û heger kurdan ji mûzîkayê û aletên mûzîkayê hiz nekirana ne mûmkûn bû, ku wana mîrateke awazên mûzîkayê ya here zengîn çê bikirana, nifşên îroyînra bibhîstana. Îzbatîke wê yekê, ku miletê me ne ku bi tenê ji dengbêjîyê û mûzîsîyenîyê hiz kirîye, lê rûmeta dengbêj û mûzîsîyenîyê ser asta bilind giritine ew yek dihesibe,

ku gava mêrekî dengbêj yanê jî sazbend wefat kirîye dengbêjên jin û mêr mêrasîm, şîna wîda stiran ser wî sêwrandine, gotine, di kîjanada pesinê wî bi vî awayî dane: "...meyê unda kirîye tilî- pêçîyên bilûrvana, na,welle, dîsa dengê dengbêjan", yanê jî: "...wê çawa li me qelîyane tilî- pêçîyên bilûrvana, sewta dengbêjan,,.

Nava miletê meda, bi temamî û bi taybetî kurdên êzdîda ji kevnarda hetanî roja îroyîn qedir- qîmetê aletên mûsîkayê yên weke keman, tembûr, bilûr û meya pir bilind girtine. Li Kurdistanê û dîaspora kurdî dibistanên mûzîkayê degme yanê jî qet tunene, lê mûzîsîyenên kurd weke karîyê, ku piştî baranê nîsanê yên gur derdikevin, li hev zêde dibin.

A bi van şirovekirina, komêntaran me xwest bêjin, ku Simo qet jî bona wê yekê bi tirs û xof li zurnê nedixist, ku rûmeta zurneçîtîyê nava miletê meda tunebû û ne jî ber wê yekê, ku bavê wî- Elîyê Şemo wê ew bona hilgirtin, bi cîanîna pêşekî bêrûmet yê zurneçîtîyê bi sûc bikin. Qet jî na. Apê Elî ne ji wan mirovên paşverû bû, ku zurneçîtî wek pêşê mirtivan bidîta û bi çevên ne qenc jî li mirtivan mêze bikira. Tirs û xofa Simo dema lêxistina zurnê ji nêrîna bavê ya ser xwendina wî dihat, nêrîna bi temamî jî ya qenc û pozîtîv ser xwendin- perwerdê, ku me jorê jî besa wê yekê kir, wek dîtina bi temamî vajayî dîtina paşverûyan. Ber vê yekê jî Simo ditirsîya, ku heger bav bi zurneçîtîa wî bihese wê cezayê giran lê bide xwerinê, ber ku zureneçîtîyê xwendina wî şerpeze bike. Simo baş zanibû, ku heger bav bi zurneçîtîya wî bihesîya, qezîya her mezin wê ji bona berdewambûna zurneçîtîya wî çê bibûya: bavê wê ew ji wî pêşeyî bida qutkirinê, ku Simo pir jê hiz dikir. Belê, wê ji lezeteke cîhanê, gorî nêrîna Simo, ya here xweş bide birînê, ji bingeha şabûnê ya here mezin. A loma Simo bi awakî usa zurneçîtîya xwe dikir, ku bav bi wê yekê nehese.Berîya hemûşkî ewî di wan şayada wek alîkarê zurneçîyê eslî, dayîmî li zurnê dixist, kîjanîda amedebûna bavê ne mûmkîn bû bi sebebên cuda-cuda, ku bi Simo va eyan bûn. Wîra pir dijwar nîbû pê bi-

hese, kanê bavê weke vexwendî here kîjan şayê û neçe kîjanê. Bîlî wê yekê ewî îmkanên dinê jî bi kar tanîn bona bav bi zurneçîtîya wî nehese. Ewî dora xwe sûreke aminîyetê, xweparastinê çê kiribû: ji hemû heval û hogir, hemû qewim û pismamên, ku şurîya wî li wan dibuhurî, rica dikir, ku besa derheqa zurneçîtîya wîda ber guhê bavê nexin. Lê Simo gotin, mîsaleke gelê xwe jî bîrkiribû yanê jî nedida ber hesêb ya ku dibêje: " Dizî- qabî ber sîya buşkulêye". Raste, zurneçîtîya Simo ne dizî bû bi fikira vê peyîvê ya xirabtir, dîrekt, lê dîsa jî hema hema weke dizî dihesibî, çimkî dizî bavê dihat bi cîanînê. Belê, zemanek hat, gava apê Elî bi tesedûfî, ji zarê çûka û mezina guhbihîstî bibû, ku Simo mêla xwe daye ser zurneçîtîyê, carna şayanda zurnê dixe: wek alîkarê zurneçîyê eslî, dayîmî. Û ber ku ji van mirovan tu kesî derheqa zurneçîtîya Simoda dîrekt, rû bi rû ji apê Elîra negot, bi awakî ciddî derheqa zurneçîtîya Simoda şedetî neda, ber vê yekê jî apê Elî zurneçîtîya kur jî bi awakî ciddî qebûl nedikir. Sebebê vê yekê yên dinê jî hebûn. Simo hela hê sinifên nimzda fêr dibû, hela hê zaro bû, negihîştîbû, kamil nebibû. " Vî temenîda, apê Elî dilê xweda digot,- me jî nola xwe dida ser leyîstin-mijûlîyên cuda-cuda: wek yên "çevgirtinok", "lepê û qucûr", "lextê", "kewkanî", "kaplîstin", "xumarbazî", "topleyîstin" û yên dinê. Lê gava em mezin bûn me bi sire terka van hemû leyîstina da, dawîyê- ew jî bîr kirin. Ez bawar nakim Simoyê min haqasî mêla xwe bide "lêxistina" zurnê, ku wextê dibêjin, ewê hilgire destê xwe, lê xwendinê ji destê xwe berde". Apê Elî ji wê yekê bawar nedikir, ku Simoyê dest ji perwerdebûnê bikişîne û bibe zurneçî, çimkî nedixwest ji vê yekê bawar bike. Sebebekî vê bawrîya apê Elî, ku Simo dest ji xwendinê bernede, ew bû, ku nava êl û eşîra êzdîxanêda qedir- qîmetê xwendinê gelekî ser fêza yê zurneçîtîyêda bû, pir caran bi qerf û pêkenîntî besa zurneçîtîyê dikirin.

Bîlî vî hemûşkî, apê Elî, ku nava zarokên xweda gişka bêtir ji Simo hiz dikir, dilê xweda qêmîşîya wî nedikir ji zarên dinê pirs

û pirsîyara bike, kanê ev besên derheqa zurneçîtîya Simoda, ku carna ber guhên wî dikevin, rastin yan derew. Pirs û pirsîyarên ji zarên xerîb zarên xelqê bêtir ne mûmkûn bûn, ber ku apê Elî di nava wê yekêda nuxsankirina kurê hiszkirî ber çevê xelqê didît. Bi wan pirs û pirsîyaran ewî wê ber xelqê eşkere bikira, ku bawarî û îtbara wî bi kurê hizkirî nayê. Û bi temamî jî ew yek ne bi karaktêrê apê Elîda bû, ku bi awakî ciddî pirs û pirsîyaran ji wan mirovan bike yên ku ne hinkûfê wîne: heger mirovên temenê xweda mezin, heger- biçûk, zaro.

Piştî zemanekî besên derheqa zurneçîtîya Simoda neketin guhê apê Elî. Sebebê vê yekê yê herî giring- ew bû, ku zurneçîtîya Simo jî yalê civakêda hate qebûlkirinê wek tiştekî bi cûre, awayê eşkere û loma jî ne hêjayî xeyîbê: ya mexsûs û ya bi dilê sax. Gava Simo bû xort fikira kêra wê derbazbûya, ku ew wî temenîda jî dizî bavê zurnê dixe...

* * *

Rojekê qewimî û hogirekî apê Elî yê bi navê Celo ji gundekî dûrî gundê wan tê mêvanîya wî: piştî zemanekî hevdîtina dawîyê dirêj, sebebê k'îjanê dûrayî û temenê herduyan yê mezin bû. Apê Celo mêrekî hinkûfê apê Elî bû: weke wî nandar, aqilbend, dilsoz, xêrxwez, rastgo û xudanê bextê merê çê. Ji ber vê yekê jî hatina wî şabûneke bê hed û hesab dixe dilê apê Elî yê ku dest xweda pezeke nêr ber pê wîda şerjê dike. Lê sed heyf, ew şabûna apê Elî dirêj nakişîne. Momênteke Simo dêrîda tê û gava silavê li wana dike, dibuhure û diçe- apê Celo dipirse:

- Elî, eva Simoyê min nîbû?.

- Lê çawa:- apê Elî bersiva wî dide,- xulamê apê xwe Celo bû.

- Mirazê te pê be, Elî, Simoyê min çi zurneke xweş û şîrin dixe: vî temenê xweda. Heger wa bidomîne ewê bibe zurneçîkî

herî baş, herî bi nav temamîya êl û eşîra meda,- apê Celo dibêje û bendê dimîne, ku apê Elî bona vê besa xêrê, ya weke mizginîkê wê pir kêfxweş bibe û wê serda jî razîbûna xwe jêra bêje. Lê apê Elî piştî bihîstina vê besê haqasî xemgîn dibe, ku zarê wî hemankî dêvda digere û ew dibêje hogirê xwe:

- Celo, tu rast dibêjî yan henekê xwe li min dikî?.

Apê Celo hew tire Elîyê Şemo ji şabûna bawar nake, ku lawê wî zureneke haqas xweş dixe, ku yekî weke wî lêxistina zurna wî, dihebîne. Nêrîna herdu kurapan ya weke hev ser pêşê zurneçîtîyê û defçîtîya ya pozîtîv, qenc di wî warîda rola xwe leyîst. Herduya jî weke pêşê qereçîya, mirtiva weke hinek êzdîyên dinê yên paşverû heqaret li defçîtîyê û zurneçîtîyê nedikirin. A ji ber vê yekê jî apê Celo hew tirê Elîyê Şemo jî bona zurneçîtîya kurê xwe haqasî şa dibe, ku bawar nake, ku lawê wî êdî zurneçîkî temame. Lê haya apê Celo her bi tenê ji wê yekê nîbû, ku ji bona berdewamkirina xwendina kurê xwe Elîyê Şemo ne ku bi tenê naxweze, ku kurê wî zurneçîtîyê bike, lê bi serda jî, gava derheqa zurneçîtîya Simoda dibhê,weke dibêjin, xûn ji dilê wî diçe, haqasî dêşe û xemgîn dibe. A ji ber heyîna van sebebên bingehîn bû, ku gava Elîyê Şemo ji kurapê xwera got, ku ew henekê xwe bi wî dike, Celo bi awakî xeyîd, gazin û xweafûkirin bi tevayî bersiva wî bi vî awayî dide:

- Haşa ji te, Elî, tu ew mêr nînî, ku mirov henek-laqirdîyê xwe li te bike. Heger dixwezî bawar bike ezê ji tera sond bixum: ez bi serê bavê xwe piştra hêja sere bavê ciwamêra, Celoyê Çeto bi van çevên sere xwe lêxistina Simoyê xwe ya zurnê dîtîye û bi van herdu guhên xwe awazên şîrin,ku wî bi cî anîne, bihîstine. De îcar here û xwera şa bibe...

Apê Elî wek mirovekî dilsoz, têgihîştî û aqilbend naxweze bi eşkerekirina nêrîna xwe ya rast, ya ku me hêja kivş kir, ya vajayî ya apê Celo dilê wî kurapê xwe bêşîne, biqusîne, wî bedlome û hetanî warekî jî şermezar û rûreş bike, hewil dide ser vê babetêra,

ya ser zurneçîtîya Simora, weke dibêjin, bixarîne, axaftina ser wê babetê bide birînê û ji bîrkirinê bi destpêkirina gotebêja ser babeteke dinê ya nû. Bona bi cîanîna vî meremî apê Elî ji apê Celora dibêje:

- Celo, haya min pirî- hindikî ji vê yekê heye û ez gelekî ji birê xwe razîme, ku ew ji bona bi serketin, pêşketina lawê min di warê sazbendîyêda haqasî şa dibe. Lê tu, kerema xwe, ji minra besa wan bûyera bike yên ku bal we çê bûne û haya min ji wana tune.

Piştî vê gotina apê Elî babeta axavtina wan bi carekêra tê guhastinê û ew derheqa zurneçîtîya Simoda jî bîr dikin.

* * *

Hetanî qewim û hogirê nêzîk li tenîşta apê Elî bû morala wî piştî bihîstina besa ser zurneçîtîya Simo jî ne xirab bû, lê gava mêvan çû- hêja ew bi xwe hesîya, kanê bi rastî çi hatîye serê wî û weke dibêjin, bû agir û bi xwe ket. Şeva yekemîn xew neket çevên apê Elî. Ewî hêja tecrûbe kir, ku îş, karê, ku li ber wî benda çareserkirinêye girantir, dijwartire, ne ku wî hetanî niha tecrûbe dikir. Di nava xiyal, mitalên giranda, ku hetanî berbanga sibê dom kirin, apê Elî xwe-xwe ji xwera digot: " Ewê ku hetanî niha terka zurneçîtîyê nedaye- vir hada wê dijwartir bide. Sûcê mine, ku Simo hetanî niha zurneçîtîya xwe berwam kir. Heger min zarotîya wîda zurneçîtîya wî weke tiştekî ciddî bidîta û ber vê yekê bigirtaqezîya nedighîşt hetanî vê qonaxê. Zarotîya wîda min dikaribû lê bida, her çiqasî jî lêdana zarokan ne karaktêrê mindane. Zarotîya wîda min dikaribû gef lê bixwarana, ew bida tirsandinê, ew bêrûmet bikira. Lê niha?. Ezê çawa vî zilamê gihîştî bêrûmet bikim, gava bejina wî weke ya min bûye?. Belkî ne haqasî ji wî, lê ez bêtir ji xwe şerm dikim hetanî peyveke sar jî xortê mala xwera bêjim. Bilî vî hemûşkî Simo hetanî niha bi tu şaşîtî, bi tu kirineke xwe ya xirab bêrûmetkirina here sivik jî qazanc nekirîye.

Apê Elî hêja fem kir, ku helkirina vê pirsê sedqat zêdetir dijwar û girane, ne ku wî hetanî niha tecrûbe dikir. Min jî xortanî di xweda dîtîye. Gava kur mezin dibin, dighîjin temenê xortanîyê, kamil dibin hêwil didin xwe di nava civaka gundê xwe û temamîya êl û eşîrêda xwe bidin naskirinê bi girtina cîkî kivş û bi rûmet nava wê civakêda. Û sebebê wan hemû hewildana yê bingehîn keçin. Ev hemû hewildan tên bi cîanînê boyî xatirê wê yekê, ku weke dibêjin, xwe bixe çevê keçên xweşik û yekê ji wana ser xwe bengî bike.Weke kivş dibe bilî wê yekê, ku lêxistina zurnê li Simo xweş tê ew zurneçîtîyê wek îmkana bi destanîna mexseda xortanîyê ya serekîn,bengîkirina keçeke kurd ya çevbelek li ser xwe divîne. Ber vê yekê jî her bêrûmetkirin, her heqareteke biçûk bona terkdana zurneçîtîyê dikare dilê Simo haqasî bişkêne, ku ew zemanekî dirêj hew-bicebire. Min gotî berî kamilbûnê, berî xortanîyê zurneçîtî lê bida terikandinê, lê niha îdî derenge, rasttir, dijwartire. Loma jî ez gotî bi awakî usa vê pirsa zurneçîtîya wî çareser bikim, rasttir, bi cûre û awakî usa lêxistina zurnê bona wî bidim qedexekirinê, ku Simo ne bişkê û ne jî bixweze piştî wê yekê zurnê bigre nava destên xwe, ku ew zanibe bav qet jî henek û laqirdîya nake û amedeye berbi cîanîna her îmkanekî nesekine, her bi tenê kurê xwe ji zurneçîtîyê bidim dûrxistinê, kûvîkirinê.

Apê Elî birîyar danî bi awakî usa pirsa zurneçîtîya Simo hel bike, ku him kûr bêrûmet, nuxsan neke û neşkêne û him jî zurneçîtîyê hetanî hetayê lê bide tobekirinê, terikandinê, ji bîrkirinê. Apê Elî bi rastî jî pirsa zurneçîtîya Simo bi awakî usa çareser kir, ku kur neşkênand, hetanî warekî boyî xatirê wî xwe şikênand, xwe êşand, lê zurneçîtî lê da terikandinê: heta- hetayê.

Berbanga sibê hêja xew kete çevên apê Elî, piştî ku ewî cûre, awayê çareserkirina pirsa zurneçîtîya Simo dît.

kurdlib.online

* * *

Her çiqasî jî sibe teze ron bibû, lê apê Elî, yê ku hê bi tenê berbangê çevên xwe dabûn hev, îdî li ser pîyan bû û pêra gîhandibû temîyê bide hemû neferên malê, ku gava Simo ji dibistanê vedigere- wî agahdar bikin. Û çû li tenîşta tendûrê rûnişt û çevên wî her wa li dêrî bû, her çiqasî jî zanibû, ku hetanî hatina Simo ji dibistanê zemanekî dirêj maye, carna ew hinekî ji esirê zûtir tê.

Kevanî û bişkorîyên malê jî şaş û metel mabûn, ku kalkê wan, bavê wan wê rojê ji tenîşta tendûrê dûr nakeve her çiqasî jî berîya zelalbûna dûyê tendûrê ewî bi mecbûrî gele dûyê tel hecam kir. " Heger dixweze Simo bibîne,- neferekî malê bi mafê temam û bi heq dilê xweda dikaribû bigota,- îdî çima xwe daye nava vî dûyî. Dikare odeke malê ya dinêda benda Simo bisekine û giva ew ji dibistanê tê, dizvire ew dikare wî agahdar bike derheqa temîya bavêda û cîyê rûniştandina bavê jî nîşanî wî bide".

Kevanîyên malê yên temenê xweda angor mezin û yên cîwan bi alîkarîya bişkorîyên malê dewê bona çêkirina toraqê, şîrê ji bona meyandina mast ji zûva qetandibûn, kelandibûn, xwerina wê rojê amede kiribûn û hemû firaq, sîtil, beroş, dîz, dû hev ji ser tendûrê rakiribûn, dabûn alîkî yanê jî piştî valakirinê biribûn kox yanê jî dereke dinê, lê apê Elî li tenîşta tendûrê hela hê rûniştibû û çevên xwe ji derê xênî nedibirîn. Û carna jî li nava tendûrê mêze dikir. Alava tendûrê hatibû birînê, lê şelên agirê tertê pêz hela hê geş dikirin û alaveke nimiz, ne bilind, eyînî weke ya rejûyê navbera wan şelanda mabû. Hema wê demê deng û hisa Simo li bavê tesele bû. Apê Elî xwe ser kursîyê darînî nimiz civande ser hev weke nîşana xemgînîyê û bêsebirîyê. Kur silav li bavê kir, lê şûna weke hercar silava kur bi beşereke xweş û bi peyvên: "Xêr bêyî, Simoyê min" vegire, apê Elî bi rûkî tel her bi tenê gotê:

- Xêr hatî.

Simo bi dîtina vê bengiz û bala bavê, weke dibêjin, lêva xwe gest, xemgîn bû, lê ew yek ser rûyê xwe eşkere nekir. Ji bavê

buhurî, çû, çentê xwe avît ser textê darînî bilind, ku carna neferên malê dora wî ser teştê, firavînê û şîvê rûdiniştin, ber ku textek jî li oda bi pencere hebû, ku bi giranî jî bona mêvanan bû. Simo jî carna dersên xwe ber vî textê li xênî, li tenîşta tendûrê amede dikirin. Piştî danîna çente, Simo zivirî bal bavê û wek nîşana rêz û hurmeta himberî wî gotê:

Ez çûm, bavo...

Û karê xwe kir ji xênî derkeve, gava dîsa dengê bavê lê tesele bû yê ku vê carê bi awakî milahîm, bi awazê mirovê qenc û dilsoz ji Simora got:

- Na, kurê min, hela hê vê gave neçe.

Simo xwe li tenişta wî egle kir bi hêvîya bihîstina beseke balkêş. Lê apê Elî jî derengî nexist ve daxweza xwe, ya ku Simo qet li benda wê nîbû, ji kurra eşkere bike:

- Simo, tu dikarî ji kerema xwe zurna xwe ji minra bînî?.

Weke me got, Simo qet benda daxwezeke wa nî bû, ji ber wê yekê jî cîda bû risas- rawestîya, rasttir dibe em bêjin, ku cîda weke dibêjin bû av- nerijîya. Demeke pir giran û dijwar bû bona herduyan jî û bona êmekî kerrî û lalîke xênîda rawestîya: bav jî, kur jî xwe kerr kirin. Bav bi giranî ji ber wê yekê, ku ji wîra dijwar bû vê daxweza xwe ya giran û ne bi xêr ji kurra dubare bike. Lê kur jî ne ku ji bona wê yekê xwe kerr kir, ku di wê ara xwekerkirinê wê navbirîya di axavtinêda dereweke ji ber xwe derxe, bisêwirîne, li hev bîne, ku bi alîkarîya wê derewê bikaribe bi cîanîna daxweza bavê, vê gotina wî şerpeze, feremoş, boş û betal bike. Qet jî na, ev nêt, ev mexsed nikaribû di hiş û sewdê wîda bisêwirîya ji ber wê yekê, ku derewkarî dûrî karaktêrê wî bû, rasttir dibe em bêjin, ku kur xwe ji ber wê yekê kerr kiribû, çimkî bi vê daxweza bavê ya ji bona wî giran û ya ji nişkêva dîharbûyî ji wîra şok çê bibû, ew ketibû rewşeke pisîkolojîkî ya usa, ku weke dibêjin, ne zarê wî lê digerîya û ne jî hiş û sewdê wî cîyê xweda silamet mabûn.

Ji herduyan berê Simo ji cîyê xwe leqîya.Ew bi lez çû ji pşta

stêr zurne ji nava qatekî lihêf- doşekan kişand, derxist û ser herdu destê bin wêda vekirî anî li ber bavê girt: eyînî weke mirov hedîyakî hêja li ber xweşmêrekî bigre.

Her çiqasî jî piştî vê rêzgirtina kur ya himberî xwe jî bona apê Elî dijwar bû wê yekê bike, lê ber ku wî îdî birîyar kiribû, kesereke kûr rahiştê, hizî da xwe, ji ser kursîya nimiz rabû ser pîya, zurne ji ser destê kur girt ser du destan, eyînî weke kur, ew anî rast bi rast tuşî orte, nava tendûrê di nava hewêda girt û li çevên kur bi awakî usa mêze kir, weke jê bipirse: "Ez vê zurna te bavêjim tendûrê, nava kûra êgir?".

Gava apê Elî dît, ku Simo bi tirs û xof li destên wî mêze dike, ku daxweza wî bû bi meremê çêkirina tehsîreke giran li ser kur ji bona heta-hetayê tobekirina lêxistina zurnê, hêja destên xwe ji zurnê berdan, rasttir, ji bin zurnê kişandin. Alava tendûrê jî zûva vemirî bû, lê kûra agirê tertên pêz û ya stûr hela hê geş bû, ji navbera şelên tertan alaveke ne gur û ne bilind ya weke alava komirê derdiket. Piştî bê deng ketina zurnê nava kûra êgir demeke kin tu deng û his çê nebû... Û ji nişkêva gulpîn ji tendûrê hat.Ew gulpîna wê alavê bû, ku bi zurnê ket û tendûr tije kir, dagirt, lê zû jî vemirî. Ji ber çêbûna vê alavê û dengdana wê-gulpînê apê Elî, yê ku sere xwe serfêz û navika tendûrêda girtibû, ji cîyê xwe vecêniqî.

Simo heyfa xwe bi wê zurnê anî ya ku zemanekî kivş xizmîeta wî kiribû, ew bi wê zurnê fêrî bi cîanîna serawên kurmancî û qeydê awazên reqasên kurdî bibû, bi bihîstina kîjanan keç û bûkên kurda weke qaz û werdekê li ser goleke ava zelal berfireh govendêda dimeşin. Simo piştî gulpîna alavê, gava pê hesîya zurna wî îdî nema, hew tawa xwe anî, bê deng û his pişta xwe da bavê û tendûrê û bi lez ji xênî derket û çû. Lê apê Elî, mêrê bi cesaret û xurt ji vê gulpîna, ku bi zurnê ket, xof kişand. Ewî wê demê zurne bi gulpîna wêva şiband ruhberekî, ber ku ew aleta mûzîkayê weke aletên mûzîkayê yên wan awazan, wan miqaman bi cî tîne yên ku

ruhîyeta mirovê mûzîsîyênda disêwirin û ew mûzîsîyenên bi pif-dan, bi tilî-pêçîyên xwe wan awazan bi aleta mûzîkayê, eger em dikarin bi vî awayî jî bêjin, didin gotinê, eşkerekirinê, dubarerkirinê. Aletên mûzîkayê dema bikaranîna wan awazan bi cî tînî yên ku mûzîsîyên dixin nava wan. Ber vê yekê jî ew aletên mûzîkayê dişibin giyanberan, mirovan. A ji ber vê yekê şewitandina zurna Simo apê Elîva kivş bû ne ku bi tenê weke karekî ziyan, zirardayîna matêrîyalî û gorî wê yekê jî weke karekî bi sûc, lê bi serda jî wek tiştekî webal: wek kuştin, şerjêkirina heyîwan yanê jî terewil, rawirekî usa, kuştin, serjêkirina k'îjanî nava civakake mirovan ya kivşda nebûye edet, yanê jî weke tiştekî pêwîst nehatîye qebûlkirinê. Hilbet, şikênandina aleteke mûzîkayê degme diqewime, ber ku pêwîstîya wê yekê, wek mesela şewitandina zurna Simo degme çê dibe.

Sed heyf, ku mêrekî weke apê Elî kesera "kuştina" tiştekî webal dilda wefat kir. Lê heger apê Elî çend salan derengtir bimira wê şewitandina zurna kur her bi tenê weke tiştekî bi sûc bidîta, lê qet jî ne tiştekî webal. Apê Elî weke me got, ji boyî wê yekê zurna kur şewitand, ku Simo şûna zurneçîkî bibe ronakbirekî kurd yê bi nav û deng û bi govekeke berfirehtir bi kêrî gelê xwe û bi temamî mirovan bê. Simo bi rastî bû ronakbirekî bi nav û deng, lê sed heyf, piştî mirina bavê yê ku haqasî heyra wê yekêda bû, yê ku boy saya wê yekê çi ku pêwîst bû kir, hilbet, bi saya wê yekê jî, ku Xwedê kurekî weke Simo dabû wî yê ku ya bavê xwe kir, mexseda wî bi cî anî. Apê Elî hetanî mirina xwe jî xwe şikestî, suckar û xemgîn didît, bi serda jî wek xudanê bi cîanîna tiştekî webal. Sed heyf, ku apê Elî pêşketina Simo weke doxtir û şayîrê bi nav û deng nedît û ber wê yekê jî dilê wî bi wê yekê rehet, baristan nebû, ku raste, di nava agirda alav bi zurnê ket, zurne şewitî, lê ji nava alava, ku zurnê ket- şûna Simoyê zurneçî Simoyê doxtir û helbestvan çê bû, xuliqî, derket dinîya ronik û ji ber vê yekê jî webalbûna şewitandina zurnê, ku apê Elî wa kivş dibû, bi rastî her bi tenê zirareke

matêrîyalî bû, lê bi fikira menewî serketina qencîyê û xêrê bû ji bona kur, gel û mirovayê bi temamî. Her bi tenê sed heyf, ku mirina berîya bi cîhatina vê pêşketina Simo nehişt ku apê Elî weke bav û wek sebebê wê serketina qenc şa û firnax bibe.

Belê, bi kêrhatina Simo boyî gelê xwe û gelên cînar weke şayîr û doxtir muhîmtir û mezintir bû ji kêrhatina wî weke zurneçîkî. Hilbet, em bi vê yekê heqaretê bi zurneçîtîyê nakin, lê em her bi tenê dixwezin wê yekê zelaltir raxin ber çevên ku Simo weke doxtir û şayîrê bi kemal û pisporê pêşê xwe bêhtir bi kêrî gelê xwe û mirovayê hat.

WEZÎRÊ EŞO

Xweyê vê pirtûkê nivîskar, edebyetzan, dîrokzan, rojnemevan- publîsist, wergerê kurd yê bi nav û deng Wezîrê Eşo: hogirê Simoyê Şemo yê nêzîk û pir salan. Ber vê yekê jî xwendevanê di vê pirtûkêda ne ku bi tenê Simoyê helbestvan bi berhemên wî yên giranbihava, lê her usa jî yê kurd û mirov bivînin, ku nirxa vê berhemê mezintir dike.

Wezîrê Eşoyê Hûtî Begê 1-ê mijdara sala 1934-a li paytextê Gurcistanê-Tivlîsê hatîye dinê. Perwerda xwe destpêkêda li dibistana gundê Pampa kurda / niha Sîpan li navça Aragasotinê/, piştra dibistana Tivlîsê ya jimara 23-ada bi dest anîye. Sala 1958-a fakûltêta zanîngeha paytextê Ermenîstanê- Yêrêvanê ya dîrokê demam kirîye. Salên 1958-1961-ê wek serokê dibistana gundê xwe- Pampê kar kirîye. Salên 1961-1963-a li Lênîngradê / niha Pêtêrbûrg/ beşa kurdzanîyêda ya înstîtûta Rohilatzanîyê beşa pisporê dîroka Kurdistanê. Salên 1964-1994-a wek rêdaktorê sereke ya çapemenîya / mêdîya/ Ermenîstanê, her usa jî weke redaktor-wergerê beşa weşanên kurdî ya radîyoya Ermenîstanê li Yêrêvanê kar û barên xwe bi cî anîye. Ji sala 1995-ada li paytextê Bêlçîkaê-Bryûsêlê dimîne û diefrîne.

Wek nivîskar berhemên wî di rojnema kurdîye " Rya teze"-da û her wa rojneme û kovarên Ermenîstanê yên edebyetêda ji sala 1958-a û virda hatine weşandinê.

Hetanî niha ev pirtûkên Wezîrê Eşo yên berhemên edebyeta bedew, zanîyartîyê û wergeryê hatine çapkirinê: "Mizgînî"/ Yêrêvan,1976/, "Xebera dosta" / Yêrêvan, 1982/, "Dengbêj kal bûbû" - Yêrêvan, 1983/ , "Xaçatûr Abovyan, kurd, êzdî": werger, pêşgotin, pênasîn û pêradanok yên Wezîrê Eşo / Yêrêvan,1986/, "Pamp-

Sîpan" / Yêrêvan,1986, "Dosîya Barzanî sandoqa Stalîn ya polayîda" / bi kurdî, Hewlêr, 2007, bi wergera ser erebî: Hewlêr, 2008/, "Parîyê berdamayî" / Hewlêr,2008/, "Kurdzanê mezin Qanatê Kurdo" / Bryûsêl, 2010/: "Zargotinzanê kurd yê mezin Hecîyê Cindî" / bi ermenî, Yêrêvan,2010/.

14 pitrtûkên nivîskar û zanyarên kurd û ermenî bi pêşgotinên Wezîrê Eşo hatine weşandinê. Gelek gotarên wî yên bi taybetî ser pirsên kurdzanîyê û kurdzanan, ser dîrok, edebyet û çanda kurdên Yekîtîya Sovyêtîyê û Ermenîstanê bi şikilê lêkolînên zanyarî û pûblîsîstîyê rojneme, kovarên Ermenîstanê, Rûsîyayê, welatên Avropayê û Herêma Kurdistanê ya fêdêral bi kurdî, ermenî, rûsî, almanî hatine çapkirinê. Çend heb ji wana rapor, gotarên zanyarîne, bi kîjanan Wezîrê Eşo beşdarî konfêransên zanîyarî li eyînî welatvan bûye û kîjan berevokên gotarên konfêransên zanyarîda hatine weşandinê.

Weke rojnemevan- publisist Wezîrê Eşo ji nîveka salên 50-î yên sedsala 20-î û virda deng daye. Bi sedan gotarên wî di rojname û kovarên Ermenîstanê, Yektîya Sovyêtîyê ya berê, welatên Avropayê û Kurdistanêda hatine çapkirinê, di malperên, kurdîda hatine belavkirinê. Em îdî derheqa dîsa bi sedan komêntar, şirove, nivîsên wîda nabêjin yên ku bi radîyoya Yêrêvanê bi kurdî hatine weşandinê.

Wezîrê Eşo bi sedan sêmînarên ser dîroka Kurdistanê, ser edebyet û çanda kurdî, ser kurdzanîyê li Sovyêtîstanê, Ermenîstanê, welatên Avropayê, nemaze li Bêlçîka û li Herêma Kurdistanê bi cî anîne.

Pirtûkên çend nivîskar û zanîyarên kurd, pirtûkên fêrên ziman û lîtêratûra kurdî bi rêdaktorîya Wezîrê Eşo hatine weşandinê.

Niha ev pirtûkên Wezîrê Eşo li ber çapêne, bona çapkirinê tên amedekirinê: " Edebyeta kurdî li Ermenîstanê", "Stiranbêjê kurd yê mezin Şivan Perwar", "Dîrokzanê kurd yê bi nav û deng Şekroyê Mihoyî", " Doxtirê kurd yê lêgêndî Şiralîyê Eşo", "Simoê Şemo: jîyan û kar", "Nûnera kurdî ya stiranê û mûzîkayê û qeyîdkirina berhemên wî li Ermenîstanê", "Çapkirina pirtûkên kurdî û ser kurdan li Yektîya Sovyêtîyê" û yên dinê.

kurdlib.online

Wezîrê Eşo niha bi giranî ser lêkolîneke berfireh karê xwe berdewam dike ya ser kar û barê Barzanîyê Nemir li Yektîya Sovyêtîyê salên 1947-1958-a.

Reşnivîsên bîranînên Wezîrê Eşo, novêl û kurteromanên wî têra dagirtina çend pirtûkên stûr dikin.

Keda Wezîrê Eşo kivşe her usa jî di ware wergerîyêda. Ewî gelek berhemên nivîskarên ermenî yên klasîk û hemdem, bi giranî yên ser jîyana kurdan û qehreman, pêrsîyonajên kurd, kurteromana nivîskarê rûs yê mezin Arkadî Gaydar ya "Têmûr û koma wî", bi wergerên xwe kirine mal û milkê xwendevanên kurd.

Wek nivîskar û wergervan Wezîrê Eşo yekemîn kese, ku li Ermenîstanê hêjayî xelata Yekîtîya nivîskarên wê komarê ya bi navê Erebê Şemo bûye. Ew hatîye hilbijartin wek endemê Yekîtîya nivîskar û Yekîtîya rojnemevanên Ermenîstîanê û Yekîtîya Sovyêtê. Ji ber kar û barê xwe yê civakî yê aktîv ew hatîye hilbijartinê wek cîgirê serokê / sedirê/ Şêwira Ronakbirên kurd li Ermenîstanê. Ew her usa jî hatîye hilbijartinê weke serokê şerefê yê rêxistina kurdên Kavkazîyayê li Bêlçîka.

NEVEROK

Pêşepeyîv ... 7
Cîyê Simoyê Şemo nava edebyeta
kurdî ya Ermenîstanêda ... 12
Jînenîgarî, kar û bar ... 16
Nirxandina poyêzîya Simoyê Şemo ... 28
Analîzkirina poyêzîya Simoyê Şemo ya evîndarîyê ... 32
Poêzîya Simoyê Şemo ya welatevîntîyê ... 47
Optîmîzm û pêsîmîzm nava poyêzîya
Simoyê Şemoda. Sebebên çêbûna wan ... 54

PERADANOK

Pêşepeyîva Peradanokê ... 79
Xweyê qelema qenc û bereket ... 80
Ew jî kete rêza nemira ... 83
Mêvandarî- nandarîya Simoyê Şemo ... 91
Simo çara bêçaran, hêvî û alîkarê nexweşan ... 93
Simo mêrê hewar û gazîyan ... 95
Têlêgirama ser navê sêkrêtêrê giştî yê
Organîzasîyona Miletên Yekbûyî Û Tan ... 97
Simo û xwendina helbestan ... 102
"... Ne da- ne stend" ... 106
Bax û bostanê Simo ... 112
Xwendîyê şayê ... 122
Şewitandina zurnê ... 131
Wezîrê Eşo ... 146

ՎԱԶԻՐԵ ԱՇՈ

ՍՄՈՅԵ ՇԱՄՈ
Կյանքը և գործունեությունը

ВАЗИРЕ АШО

СМОЕ ШАМО
Жизнь и деятельность

ԵՐԵՎԱՆ
ՀԳՄ ՀՐԱՏԱՐԱԿՉՈՒԹՅՈՒՆ
2013

Rêdaktor Mirazê Cemal
Korêktor Tîtalê Kerem

Համակարգչային ձևավորումը՝
Եվգինե ԲԱՐՍԵՂՅԱՆԻ

Չափը՝ 60X84, 1/16: Ծավալը՝ 10 տպ. մամուլ:
Թուղթը և տպագրությունը՝ օֆսեթ: Տպաքանակը՝500 օրինակ

Տպագրությունն իրականացրել է «ՎԱՆ ԱՐՅԱՆ» ՍՊԸ-ն՝
ՀԳՄ «Լ. Զ. ՍՅՈՒՐՄԵԼՅԱՆ» տպագրատանը: Բաղրամյան 3: